Ji arşîvê: Jean-Pierre Viennot, *Pirsgirêka Kurdî, bextreşiya milletekî bê dewlet* (nîsan 1970) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Îlon 2010 - Hejmar 10 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

**Serge Halimi**
Heger em ji Afganistanê derkevin, guh û bêvilên jinan dê bên jêkirin? Çapemenî wêneyên trajediyan li gorî stratejiyên siyasî bi kar tîne
▶ R. 2

**Benoît Francès**
Gava ku dem di ser re biçe û dunya biguhere, gelo mirov dikare ji bo berjewendiyên siyasî, êşên qirkirinê ji bîr bike?
▶ R. 10

**Louis Imbert**
Li Afganistanê şerr dewam dike, lê her şerr dewlemendên nû jî ava dike. Alîkariyên mirovane yên Rojavayiyan dikevin bêrîka kê?
▶ R. 17

**Cédric Gouverneur**
Pilingên Tamûlê têk çûn, gelo xelkê Tamûlê bê xwedî ma? Neteweyên Yekbûyî û trajediyeke sivîlan…
▶ R. 18

**Henry Jenkins**
Tevgerên siyasî referansên çanda populer li gorî berjewendiyên xwe dixwînin. *Avatar* çawa bû mîlîtanek?
▶ R. 23

### Vulpes Vulpes Kurdistanica

# Ziman û kontrola ramanê

Prof. Dr. Îlhan Kizilhan

Kî zimên kontrol bike, dikare bi wî jî li ser pêvajoyên raman û fikirînê tesîrê bike. Birêvebiriya îdeolojiyê bi birêvebiriya zimên ve dibe. Francis Bacon balê dikişîne ser bi hev re girêdana ziman û ramanê û wî bawer dikir ku ziman berî ramanê tê û ew bi têgehên ku pêk tîne, şiklê ramanê jî diyar dike.

Peyvên aparata desthilatdariyên totalîter û polîtîkaya wan ya li dijî mirovahiyê dibe sedema bandoreke totalîter û guherîna raman, helwêst û tevgerê.

Ev bûyer li ser civak û nifşên ku tên (ji aliyê psîkolojîk ve jî) tesîrê dike (Busse, 1968). Hin gotin ji ferhengê tên avêtin, qedexekirin yan jî bikaranîna wan tê cezakirin. Ji ber wê, îroj li Turkiyeyê, di raya giştî de têgeha Kurdistanê û bikaranîna wê pirsgirêkeke mezin e. Havîna sala 2005'an, di çapemenî û televîzyonên Turkiyeyê de (*Milliyet*, 06.03.05, *Gündem*, 05.03.05) hin nûçe hatin weşandin û di wan nûçeyan de li ser navê rûviyekî ku li herêma Kurdistanê dijî, gengeşî hatin kirin.

Heta wezîr jî ketîn nav wê gengeşiyê, xwastin navê wî rûviyê ku di ferhenga lawiran ya ingilizî de nave wî weke «Vulpes Vulpes Kurdistanica» hatiye nivîsandin, ji nava wê ferhengê bidin derxistin. Navên rêyan, cîhan û herêman yên ku sala 1931'ê hin zanyarên ewropî di dema seyahatên xwe yên heremê de nivîsandibûn, li gor ramana wezaretê û derûdora wê tên guhertin, ji ber ku di nava wan navan de termên wek Armenî, Ponthus-Grek (Pontus jî dibêjin) û Kurdistan hene.

Weke nimûne:

▶ R. 3



Vulpes Vulpes Kurdistanica

### Mînaka Kosovayê hêviyê dide gelên bindest

# Biryara Kosovayê û daxwazên Kurdan

A. Celîl Kaya *




Mafê self-determînasyonê tê wateya *Mafê Diyarkirina Çarenûsa Xwe*. Ev maf herweha di çendîn peyman û danezanên navneyeweyî û herêmî de jî wekî yek ji mafên mirovan ên bingehîn hatiye pejirandin (1). Li gorî van peymanan: "*Her gel xwedî mafê self-determînasyonê ye. Li jêr vî mafî ew dikarin bi serbestî statuya xwe ya siyasî diyar bikin û bi azadî pêşketina xwe ya aborî, civakî û çandî pêk bînin* (2)."

Ev maf di serî de piştî Şerrê Cîhanê yê duyem ji bo gelên kolonî derketibe pêş jî, di sedsala 21'ê de ji bo gelên ne-kolonî jî derbas dibe. Mînaka herî dawî jî li naverasta Ewropayê Herêma Kosovayê ya Federasyona Yugoslavyaya berê ye.

17'ê sibata 2008'an, Hukumeta Xweser a Herêma Kosovayê ji Sirbistanê veqetiya û serxwebûna xwe ragihand. Biryar di parlamentoya Kosovayê ya 120-nûnerî de bi awayekî yekdengî ji aliyê 109 endaman ve hat qebûlkirin. Di dengdanê de her çend 11 nûnerên hindikahiyên Kosovayê beşdar nebûn jî 9 nûnerên hindikahiyan ku tê de beşdar bûbûn dengê erê bi kar anî. Di daxuyaniya serxwebûna Kosovayê de weha dihat gotin: '*Em serokên gelê me ku bi awayekî demokratîk hatine hilbijartin radigihînin ku Kosova dewleteke serbixwe û deshilatdar e. Ev daxuyanî vîna gelê me nîşan dide û bi giştî, bi pêşniyarên nûnerê taybet ê NY Martti Ahtisaari ve li hev dike. Kosova komareke demokratîk, laîk û pirr-etnîkî ye ku li jêr prensîbên nebûna cudagerî û berevaniya yeksan tê birêvebirin* (3)."

Ev ne cara pêşîn bû ku Kosovayê serxwebûna xwe radigihand. Di 7'ê îlona 1990'î de jî Kosovayê serxwebûna xwe diyar kiribû.

Sirbistana ku Kosova jê veqetiya ev biryar nas nekir. Lê belê ji sala 1990'ê cudatir, ku wê demê bi tenê Arnawitistanê serxwebûna Kosovayê nas kiribû, îcar 70'ê ji 192 dewletên endamên Neteweyên Yekgirtî (NY) ango ji sedî 36'ê dewletên endam serxwebûna Kosovayê nas kir ku di nav wan de sê dewletên endamên mayînde yên Civata Ewlekariyê, ango Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê, Brîtanya û Fransa jî hene. Ev rêje li cem YE'ê zêdetir e ku 22'ê 27 welatên endam serxwebûna Kosovayê nas kir. Ji nav 28 endamên NATO'yê jî 24 dewletan bi awayekî fermî serxwebûna Kosovayê pejirand.

Turkiye jî yek ji wan dewletên pêşîn bû ku serxwebûna Kosovayê di cih de nas kir. Serxwebûna Kosovayê di serî de ji aliyê Rûsyayê ve nehat naskirin ku vî welatî ji berê de alîgiriya Sirban dikir. Welatên wekî Çîn û Hindistanê ku ew jî bi daxwazên serxwebûn û veqetînê re rû bi rû ne Kosova nas nekir. Îspanyayê jî ji ber pirsgirêkên xwe yên Katalonya û Baskê û Yûnanistanê jî ji ber pirgirêkên Qibris û Makedonyayê Kosova nas nekir.

Sirbistanê, ne bi tenê Kosova nas nekir lê herweha ev mijar bir ber Neteweyên Yekgirtî. Li ser daxwaza Sirbistanê, Civata Giştî ya Neteweyên Yekgirtî di 8'ê çiriya pêşîna 2008'an de ji Dîwana Navneteweyî ya Adaletê(ICJ) xwast ku sebaret bi ragihandina yekalî ya serxwebûnê ya Kosovayê nihêrînekê pêşniyazê bide 'Ka gelo ragihandina serxwebûnê ya

▶ R. 4

**Almanya: 4,50 €**
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Hollanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
**Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Turkiye:** 7 TL

4 191764 204509 08


Vê mehê li Turkiyeyê referandûma li ser guherînên Destûra bingehîn pêk hat. Di vê azmûna ku kêm zêde herkesî encama wê dizanî de, % 58'ê dengan ji bo piştgiriya guherînên ku hatibûn pêşniyarkirin hatin dayin. Encameke din jî ew bû ku li bajarên Kurdan dengên «erê» % 90'î bihurîn, weke nimûne Agirî % 95, Diyarbekir % 94, Wan % 94, Riha % 94, Êlih % 94, Mêrdîn % 93, Culemêrg % 92, Mûş % 92, Sirnex % 89 û hwd. Ev jî diyar dike ku Kurdên ku çûn ser sindoqan bi pirraniyeke berbiçav ji guherînan re dibêjin «erê».

Lê belê, encameke jê balkêştir jî hebû ku li Turkiyeyê him hukumetê û him jî Kurdan miraq dikir: gelo rêjeya Kurdên ku dê ev referandûm boykot bikiraya çend bû? Bersiva vê pirsê ji bo siberoja siyaseta PKK-BDP'yê jî girîng bû. Encam êdî aşkere ne û rêjeya boykota li gorî hin bajaran ev e: Diyarbekir % 65, Culemêrg % 93, Şirnex % 78, Êlih % 61, Wan % 57, Mêrdîn % 57, Mûş % 47, Agirî % 47, Riha % 31 û hwd.

Êdî herkes dê li gorî xwe van hejmaran bixwîne. Recep Tayyip Erdoganê serokwezîrê Turkiyeyê, piştî ku encamên referandûmê aşkere bûn, soz da ku bi hemû aliyên civakî re amadekariyên destûreke nû bide destpêkirin.

Li Turkiyeyê dewra desthilatdariya saziyên Dewletê û artêşê bi dawî dibe û herkes êdî behsa hatina demokrasiyekê dike. Gelo dê ji nuha û bi şûn ve çi bibe? Gelo vê referandûmê çi bandor li Kurdan kir, di siyaseta Kurdên bakurî de dê çi were guhertin? Meha pêşiya me, li ser vê mijarê hin nivîsên me yên taybetî dê hebin.

LMdkurdî



# Wêneyên nezaniyê

SERGE HALIMI

Meha bihurî, wêneyekî Bîbî Ayşa li ser berga *Time Magazine* hat weşandin. Ne guhê wê hebû û ne jî bêvila wê û bi qasî ku dibêjin, Talîbanan li wê weha kiriye (1). Li Îranê jî, Sakîne Mohammedî-Aştiyaniya ku berê jî hatibû qermeçîkirin, bi ricimandinê hat cezakirin. Rûyê wê yê ku hê derb nexwariye, bûye sembola hevgirtina li dijî rejîma Tehranê. Ev herdu dîmenên jinan mirov didin fikirandin, lê gelo li çi didin fikirandin? Ne li bêrehmiya îslamîstên afgan: Sovyetê ev rewş berê dîtibû, gava ku bi piştgiriya rewşenbîrên medyatîk, Rojavayiyan çek didan fondamantalîstan. Wêne herweha di derheqê rejîma serokkomar Mahmûd Ahmedînejad de jî tu agahiyan nade dest: sextekariyên ku partizanên wî di dema hilbijartinan de kirine û pêkutiya li ser muxalifên wî, îdamkirin jî di nav de, bûye rengê wê rejîmê.

Ji dêleva ku bibe sedema ku mirov li ser bifikire, gelo ev dîmen nebin sedem ku bêtir rê li ber wê fikirînê were girtin, ji ber ku – bi zanebûnî an jî bi nezanî – semboleke xurt ku mirov nikare xwe li ber ragire (guhjêkirina ku mirov dixwaze heyfa wê hilîne, cezakirineke ku mirov napejirîne) tê kêleka bernameyeke stratejîk ya amade (berdewamiya şerrê li Afganistanê, girankirina cezayên li dijî Îranê)? Sembol çiqas xurt û bi bandor be, ji bo bernameyê jî ewqas hindik delîl û sedem lazim in, lewre di nava wê heyecanê re tiştên ku bi mirov maqûl xuya nabin jî tên pejirandin. Bi armanca ku wateyeke edîtoryal jî bide gotara li ser mazlûmiya Ayşayê, *Time Magazine* weha manşet avêtiye: «*Heger em ji Afganistanê derkevin, ev ê pêk were*». Çend roj berî wê, nêzî heftê û heft hezar belgeyên ku malpera *WikiLeaksê* weşandibûn têkçûyina şerrê rojavayî ya axlaqî, siyasî û leşkerî piştrast dikir. Lê, bandora wêneyekî ji xwendina rexneyî ya bi hezaran rûpelan kêmtir demê li mirov pêwîst dike. Wêneyekî li dijî zanînê.

Demeke dirêj, piştgirên cezayê îdamê, ji bo xurtkirina helwêsta xwe, kuştinên hovane bi pêş ve derdixistin, bi taybetî jî kuştina zarokan. Kamerayên çavdêriyê, sîstematîkkirina kontrola maddeyên bêhişker, cezayên zindanê yên ku nikarin bên kêmkirin, xesandina sûcdarên seksuel: gellek tevdîrên ku rêyê li ber azadiya xelkê digirin – weke serbestiya çûyin û hatina beyî ku kes mirov taqîb bike an jî qeyd bike bi bandora dîmeneke weha xurt ve hatin pejirandin, digel ku belkî bûyer bi xwe ji bo hişyarkirina civakê bes bû. «Sembolek» dikare behsa dozeke mafdar jî bike – Guernica an jî Abu Garîb hin ji wan in. Lê belê, hevgirtineke bi heyecan ku bi tenê li ser alavekê hatiye sazkirin, heta ku rewş weha be û stoka qurbanên mûhtemel tu carî neqede, dikare bi heyecanine din ve zû ji rêya xwe bi dûr bikeve.

Gelo guhjêkirin û bêviljêkirin dê hebin «heger em ji Afganistanê derkevin»? Rewş çi be jî, em dizanin ku hebûna «me» ya li wira rê li ber van bûyeran negirtiye… Ji xwe, di destê Talîbanan de jî wêneyên xelkê sivîl ku bi misîlên rojavayî hatine kuştin an jî seqet mane hene. Belkî *Time Magazine* rojekê wêneyekî weha jî biweşîne. Gelo wêneyekî weha dê bikeve berga wê?

Hingê, gelo manşeta li ser dê çi be?

1- Li gorî rojnamegereke ku Ayşayê nas dike, yê ku lê weha kiriye xezûrê wê ye û bi destûra muxtarê gundê xwe ji bo ku «namûsa» xwe paqij bike ew xistiye vê rewşê

**Çavkanî**:
Ann Jones, «Afghan women have already been abandonned», *The Nation*, New York, 12 tebax 2010

Wergera ji fransî: Îbrahîm Seydo

# JI ÇAPEMENIYÊ

## TEQAWÎT

Çapa tîrmehê ya *Left Business Observer* (LBO), li gorî xwe, niqaşên di derbarê girîngiya bipêşxistina « teqawîtiya ji aliyê darayî ve » ku li Fransayê tim tê rojevê, zelal dike. Li Amerîkayê, Borsa nebû xwediyê cihekî maqûl ku mirov pişta xwe pê girê bide, digel ku demeke dirêj herkesî pesnê wê dida:

Di nava sed û çil salên dawîn de, hilberîneke Borsayê ya berbiçav pêk nehatiye, ew pirr li dawiya hilberîna welêt ya brut (HWB) maye. Pêşketina HWB'yê a salane gihîştiye % 3,5'an. Ya Borsayê jî %1,9 e. Û dîsa: ev hejmar li gorî tespîta Borsayê ye, ne li gorî hejmara qezenca rast ya xebata çalak e. Ev tê wateya sînoreke bilind. Di rastiyê de, em nuha dizanin ku, kesên ku di Borsayê de dileyzin, ji ber bac, komîsyon û xercên cur be cur, û biryarên razandinê yên xirab, tim jî diyardeyên teorîk kêmtir bi ser dikevin.

## KUBA

Bi awayekî ku jê nedihate hêvîkirin, kovara amerîkî *Foreign Affairs* di derbarê hêviyên ji bo vekirineke aborî ya sîstema tendurustiya Kubayê de, tirsa xwe nîşan daye (tîrmeh-tebax 2010):

Hemû tevdîrên li dijî tûndkirina bazirganiyê û hatin û çûyina di navbera Kuba û Amerîkayê de, bê guman dibin sedema xirabkirina endustriya tendurustiya Kubayê. Heger rayedarên her du aliyên kendava Florîdayê hay jê nebin, neteweya piçûk ya Karayîbê dikare zirareke mezin bibîne. Beriya her tiştî, ji ber koçberkirina bi hezaran bijîşk û hemşîreyên ji Kubayê, ku pirr baş hatine perwerdekirin, sîstema wê ya tendurustiyê dikare pûç bibe. Li aliyê din, fîrmayên amerîkî yên ku armanca wan qezenckirina darayî nîne, dikarin sîstema mayî veguherînin ya tûrîzma tendurustiyê.

## FILISTÎN

Di *The New York Review of Books* (19 tebax 2010) de, nivîskar û dîroknas Malise Ruthven konsepta «islamofaşîzmê», ku ji aliyê nivîskarên weke Paul Berman ve tê parastin (û herweha li Fransayê jî ji aliyê Bernard-Henri Lévy ve hatiye dubarekirin), rexne dike. Ew dibêje ku armanca van nêrînan ew e ku bi komên weke Hamasê re tu guftugoh neyên dest pê kirin. Û ew hin bûyerên dema bihurî bi bîr tîne:

Di meha çileya pêşîna 1948'an de, komkujiya du sed û çil Filistîniyan ya li gundê Deir Yassinê pêk hat, ku ji aliyê tevgera *Irgoun* ve hate kirin û ev tevger wê demê ji aliyê Menahem Begin ve dihate birêvebirin. Menahem Begin jî dê bi dû re bibûya serokwezîrê Îsraîlê. Piştî vê komkujiyê, bi hejmareke mezin yahudiyên naskirî, ên weke Albert Einstein û Hannah Arendt, di *New York Timesê* de nivîsandin. Wan serdaneke Begin a ji bo Amerîkayê şermezar dikir û partiya wî ya bi navê *Heroun* bi faşîzmê ve tawanbar kir û got « partiyeke faşist ku terorîzm (a lidijî Cihûyan, Ereban û Îngilîzan) û xirabkarî ji xwe re weke derfet diyar kirine û hemû kiryarên xwe bi armanca ji bo Dewleta-Rêzan ve meşrû dikin.» (...) Di nava leystoka siyasî ya Îsraîlê de, ev komên ji rêxistinên nijadperest ên weke *Irgoun* û koma *Stern*, ji demekê û bi şûn de ketine xizmeta siyaseta demokratîk. Berman dîsa jî naxwaze bipejirîneku *Birayên Musulman* û yên ku dê di pey wê re bên, rojekê bikarin bibin xwediyê şiyaneke weha ku xwe li gorî rewşa guherî bi pêş ve bixin.

## AMERÎKA

Di ber amadekariyên hilbijartinên giştî yên di 2'yê çiriya paşîn a 2010'an re, kovara hefteyî *The Economist* (24 tîrmeh 2010), guherînên ku ji sîh mehî vir ve di jiyana rojane ya Amerîkiyan de pêk hatine, bi bîr dixe:

Ji xebatkaran, ji nîvê zêdetir dema bêkariyê nas kiriye, an heqê wan hatiye kêmkirin an jî ew neçar mane ku rojê tenê çend saetan kar bikin. Bêkarê tîpîk ew e ku ji sîh mehî û bi vir ve nikare kar peyda bike. Ketina buhayê senedên borsayê û ya xaniyan bû sedem ku her ji pênc malbatan yek hebûna xwe wenda bike. Nêzîkî %60'ê Amerîkiyan gerrên xwe yên tûristîk, an betal kirine an jî kurt kirine. Ji pêncan yek parçeyê gel nikare deynê xwe yê îpotekkirî bide. Çarîkek ji ciwanên 18-29 salî neçar mane ku biçin ligel bav û dayikên xwe bijîn. Di nava mezinan de, ji nêvî hindiktir hêvî dikin ku wê zarokên wan ji wan zêdetir qezenc bikin, ji çarîkekê zêdetirê wan jî bawer dikin ku zarokên wan dê kêmtir qezenc bikin.

## MEKSÎKA

Kovara şiliyî *América Economía*, di hejmara xwe de ya ku ji bo rewşa pênc sed fîrmayên Amerîkaya Latîn veqetandiye, ji xwe dipirse: «Fîrmayên meksîkî li kû ne gelo?» (tîrmeh 2010):

Di 2002'an de, 241 fîrmayên meksîkî di nava 500 fîrmayên Amerîkaya Latîn de hebûn (...) ; hejmara fîrmayên brezîlî bi tenê 136 bû. Îro, hejmar, bi awayekî pratîk berevajî bûne : 226 fîrmayên brezîlî û 119 fîrmayên meksîkî di nava wan de xuya dibin (...) Ev tê wateya ku, 226 fîrmayên brezîlî asta xebatên xwe % 42 bilindtir kirine [di 2009'an de], 274 fîrmayên din ên Amerîkaya Latîn, bi tenê % 4,5 hilberîn pêk anîne.

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

**Le Monde Diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Desteya birêvebiriyê**
Mûrat Satik
Riza Dînç

**Le Monde Diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Îbrahîm Seydo Aydogan

**Alîkarên vê hejmarê**
Semra Polat
A. Celîl Kaya
Erhan Yekta

**Berpirsê hunerî**
Hasan Huseyîn Devecî

**Designer**
Fabio Biasio

info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Postbank
Konto: 371219609
BLZ: 500 100 60
iBan: de84 5001 0060 0 3712196 09
BiC: PBNKDEFF

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde Diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêvebirê giştî**
Serge Halimi

**Serniviskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Serniviskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêvebirê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

**Cinsê masiyan:**

Alosa **pontica**,
Mullus barbatus **ponticus**,
Thorax **armeniacus**,
Glyptothorax **kurdistanica**.

**Lawirên xişok:**

Lacerta armeniaca,
Timon princeps kurdistanica.

**Lawirên bi çiçik:**

Crocidura **lasia**,
Tristrami **intrapontus**,
Galereolus **ponticus**.

**Kulîlk:**

Poecilimon **armeniaca**,
Gomphocerus **armenicus** dimorphus,
Phytodrymadusa **armeniaca**,
Bolivira **kurda**,
Alleomims **kurdus**,
**Armenicus** drap

**Cinsê rehekan:**

Aristolochia **pontica**,
Myosotis **lazia**,
Nonea **armeniaca**,
Onosma **armenum**,
Onnesma **armeniacum**,
Symphytum **kurdicum**,
Cirsium **karduchorum**,
Tenacetum **armenum**.

Zimanê sîstemên totalîter û nîvtotalîter weke klîşeyeke weha ku ramanê asteng dike tê karekterîzekirin. Pirsgirêkên mirov yên berfireh û kompleks di nava sloganên kin, gellekî teng û bi olana dawîn de, bi awayekî hêsan di bîra mirov de dimînin û tên bikaranîn, tên xebitandin. Ev gotinên weha, destpêk û dawiya hemû analîzên îdeolojîk in (Bauer, 1988).

Di ber re, têgehên nîjadperest di nava sîstema perwerdekirinê de bi awayekî gellek zixm tên danîn û tim tên dubarekirin: têgehên ku li polîtîkayê nayên, tên tabûkirin. Ev alavên sîstemê, bi demê re rengekî neyînî digirin û di dawiyê de weke çêr û heqeretan tên bikaranîn (weke jor). Ev helwêst li Turkiyeyê ji demeke dirêj e ku ji bo têgeha kurd yan jî navên olî wek Êzdî yan jî Elewî berbiçav dibe. Têgehên îdeolojîk ji aliyê dezgeh û rêxistinên çep yên ku di nava îllegalîteyê de dixebitin, neyînî hatin û tên nirxandin. Bi wî şiklê fikirîne yê teng, yan «têgehên pîroz», ku dibin sembola «başiya ideal», yan jî «şeytaniyên» ku ji bo «xerabiya ji bini ve» tên bikaranîn, hene. Zimanekî totalîter xwe li ser jargoneke pirrhêl, razber, berfireh, bê merhamet hukumdayî ava dike. Ev jî ji bo herkesî, ne bi tenê ji bo parêzgerên wî yên îtaatkar, aciziyeke cankuj e: bi hacêtên zimanê îdarekirî gerek mirov dest ji fikirîne berde (Kizilhan, 2008).

Ev tê wê wateyê ku sîstemên totalîter zimanê xwe teng dikin û ji aliyê çandî ve jî xirab dikin. Li aliyê din jî, ew zimanên çandên din qedexe dikin û li dijî wan şerr dikin (Bauer, 1988). Bi vî awayî, zimanê kurdî li Turkiyeyê ji 70 salan zêdetir hat qedexekirin û bikaranîna wî jî hat cezakirin.
Ji ber ku hejmarek mezin Kurd li Turkiyeyê hene –li gor beyana Turkiyeyê ya fermî nêzîkî 20 milyonan in. Mirov - ev qedexe rastî nerazîbûneke navneteweyî ya mezin jî dibe û bi perspektîveke demokratîk nikare were fahmkirin (Laizer, 1966). Gellek kal û pîr bi turkî napeyivîn û bi bêdengiyê hatine lanetkirin. Bêguman, ev jî li ser bîranîn û xewê dibe xwediyê bandoreke mezin. Bi qedexekirinê, perwerdehî jî guncav nebû. Pirtûk bi zimanê kurdî nebûn û xwedîbûna wan jî dihat cezakirin. Asteng ewqas mezin bûn ku pirraniya gel dikarîbû zimanê xwe tenê gellek bi sînor di jiyana rojanê ya gundiyan de bi kar bîne, ji ber ku li wê qadê kontrolek ji aliyê dewletê gellekî dijwar bû. Nifşên dawîn zimanê turkî berê di dibistanan de hîn dibin û ew jî gellekî kêm e (Kizilhan, 1995).

Turkî ji bo peywendiya bi dewletê û cîhên fermî re tê bikaranîn. Ev tê wê wateyê ku her du ziman, hem zimanê dayikê hem jî zimanê fermi, bi sînor hîn dibin. Fêrisên îfadeyê, fêris ji bo bêşdariya pirsgirêkan, weke ku nexweşiyek belav bûbe, gellekî kêm bûn û îro jî kêm in. Gava ku kal û pîr tiştekî tînin bîra xwe, wi jî bi zimanê kurdî dikin. Li hember wê, zimanê bîranînê li cem nifşê nû yê penaberan bi taybetî turkî ye. Hest jî bi ziman û bikaranîna hinek peyvan ve girêdayî ye. Têgehên wek leşker, îşkence û ziman dibin sebeba bêaramî, trawma û bêbaweriyê. Bi vî awayî dibin şîfreya heyecanekê, ku hinek tiştan tînin bîra mirov. Di vê rewşê de, gellek kes bi dereceyeke bilind di bin barê bîranînên gîhansûz de dimînin, lê ew di demeke cuda û cîhaneke cuda de dimînin û jî rastiyê dûr di şiklekî sîberî de dijin (Kizilhan, 2008). Ev jî ji bo wan xetereke mezin e, lewre ew ji tecrubeyên jiyana rastî qetiyayî dijîn û ji aliyê ziman û ramanê ve teng û kor dibin. Ji ber ku ew tev li geşiya ziman û civakê nabin û li dûrî wê dijîn.

Ji ber ku ziman ji bo tecrubeyên mirovî xwediyê wateyeke taybetî ye, derfetên fikirîn û hîskirinê bi tengbûn û korbûna wî ve gellek tên bisînorkirin. Dê û bav nikarin hestên xwe ji zarokên xwe re bînin zimên. Zarok jî di wateya pêkanînê de hesteke valahiyê yan jî qetîna peywendiyan dijin û rewşa wan jî derfetê nade ku bi vê yekê mijûl bibin. Nifş di hestên xwe de kor dibin û hewl didin bi hacêtên zimên yên sînorkirî jiyana xwe bidomînin (Hasanpour, 2003). Bi zimanekî sînorkirî û zimanê propagandaya xwediyê desthilatdariyê ve hestên mirovan tên zincîrkirin (Bauer, 1988). Ji bo vê jî, îcadkirina televîzyonên satelîtî ji bo Kurdan xwedan wateyeke teybetî ye. Bi carekê ve wan guhdariya zimanê xwe kir û bi alîkariya gellek rewşenbîran ve bi lezeke mezin ew bi pêş ve bir. Her çiqas ku gellek zarava û devok hebin jî, nav Kurdan de ev bûyer bû sedema danîna peywendiyên baştir. Ji vira û pê ve bi wê medyayê peyvên kurdî jî gellekî berfireh bû (Hasanpor, 2003).

Îdare û sînorkirina zimanî dikare, wek taybetmendiyên totalîtarîzmê yên din, berê hesteke fahmkirinê û ewlekariyê bidin, lê paşê dibe ku hesteke bêaramî û tengasiyê di pey re were (Keller, 1996 bide ber hev). Ev bêaramî dikare tesîreke ters çê bike û ortodoksiyeke hişk bîne. Di vira de takekes jargona îdeolojîk ewqasî bilind diqîre û dixwaze hewl bide ku jî deryaya peyvên jibîrkirî peyv û gotinên nû bi kar bîne. – ji ber ku kesên din ji bo ku bisemtiya xwe îqna bike, dîlemaya xwe û gumana xwe vedişêre û xwe ji tirs û sûcên ku dikarin bi ser wî de bên, bipareze. Dibe ku ev bibe sedema parçebûyinekê, heke mirov fermî bi nimûneya zimanê dayikê bipeyive û bi dizî bi pirtûkên qedexekirî, helbest û stranan mijûl bibe (Bergmann & Erb, 1991), weke ku li Turkiyeyê pirraniya rewşenbîrên kurd dikin. Fenomenên wisa dikarin li Iraq û Îranê jî bên dîtin. Îrana îroyîn li gorî qanûnên Mellayan tê birêvebirin, lê mirov di nav çar dîwarên xwe de jiyaneke gellekî cuda û vekirî diajo (Kemani, 2003). Weke faktorekê, herçend ne wek sedema taybetî ya gellek serîhildanên Kurdan be jî, pêwîst e ku zordestiya li ser çanda wan jî bêguman were nirxandin (Laizer, 1966).

### Îfadeya yekalî û sembol

Sîstemên totalîter û dagirkerên biyanî hewl didin ku derfetên derbirînê bi şîddeta dewletê ewqasî bi sînor bikin ku ziman êdî nikaribe bibe xwedan wateyeke tevgerê. Şiklekî din tê qadên fermî, weke meydan û kolanên heyî ku navên wan tên guhertin, abîdeyên nû tên çêkirin (Bauer, 1988). Wek mînak ji bo vê nirxandinê, Iraq di dema Seddam Huseyîn de hat binavkirin, li her bajar û gundî wêneyên wî, abîdeyên wî hebûn.
Li Turkiyeyê, bi pirranî li herema Kurdistanê îroj jî mirov li ser çiyayan hevokên weke «Xwezî bi dilê kesê ku dibêje ez Turk im» dibîne. Kanalên televîzyonê ji bo bîranîna rojên neteweyî aleke Turkiyeyê bi wêneyê avakirê wê Ataturk weke logo tînin ser ekranê. Rojnameya Hurriyetê li ser rûpela xwe ya yekemîn aleke Turkiyeyê bi hevoka: «Turkiye ya Turkan e» nîşan dide. Bi vî şiklî jî, ji bo dîskûreke din çarçoveyeke din tê danîn. Ev çarçove jî ji aliyê medyaya dewletê û konserên medyaya mezin yên ku di bin tesîra dewletê de ne, tên danîn. Munaqeşeyên ji derveyî hişmendiya navendî wek terorîzm, beşdariya wan wek dijminahiya dewletê, komunîst û hwd. tê binavkirin û bisînorkirin (Laizer, 1996). Li vira, rêxistinên nîjadperest jî bi meşên xwe û çalakiyên din xizmetê dikin (Kizilhan, 2008).

Ji ber ku derfetên derbirîna neziman jî weke ziman werin bikaranîn, li ber mirov rêyek bi tenê dimîne ku ew jî nexweşî ye, weke derbirînên bê zanîn yan jî qebûlnekirineke nezaniya xwe ya rûxên (Kizilhan, 2008).

Ev taybetî ji bo nifşên kevn yên ku dixwazin tecrubeyên xwe bi nifşên îroyîn bidin fahmkirin û mecbûr maye di nav sîstemeke gellek totalîter de bijî, zehmet e. Cerribandina vegotina vê yekê ji bo nifşên îroyîn, dikare ji ber sedema bêzimaniyê, gellekî dijwar be, yan jî qet mimkun nebe. Ji nû ve avakirina tecrubeyan ya di dîskûrsê de û axavtina bi têgehên wê demê, jê dijwartir dibe, ji ber ku bi vê rejîmê zimanê wî jî navekî xirab girtiye. Wisa jî tercubeyên ku di wê demê de hatin kirin tenê sînorkirî di çarçoveya derfetên îroj qebûlkirî û dîskursîv de dikarin bên gengeşîkirin û pejirandin. Tercube hene ku ew xwe di wê çarçoweyê de nadin der, ew nikarin berbiçav bibin, yan jî «parçekirî» dimînin, ji ber ku ji bo derbirîna wan konteksteke civakî ya din pêwîst e (Laizer, 1996).

### Pêdiviya bi zimên

Ziman ji bo ku mirov agahdar bibe, ji bo ku mirov bikare çîroka xwe ya şexsî bibêje, alaveke pêwîst e. Heger ew were kontrolkirin û ahenga wî were bisînorkirin, hingê ji şiklan pê ve derfet di destê mirov de namîne.

Kesên ji nifş û komên cuda, heke ew xwediye heman zimanê dayikê bin jî, bi rastî jî bi heman zimanî napeyivin. Bingehekî têgihiştinê, zimanekî hevpar bi axavtina bi hev re tê hebandin.

Li Turkiyeyê bi pêşveçûna polîtîk û pêwîstiya danûstendina bi komên etnîk yên din re, him nifş û him jî komên cuda di derfetên xwe yên zimanî de gellek sînorkirî mane, yan jî ketine bin bandorên ku raman û tevgerên wan bi rê ve dibe.

**Li Turkiyeyê qedexekirina zimanê kurdî bû sedema bêdengmayîna gellek nifşan û paşvekişîna nava tepeşa xwe ya taybetî. Zordestiya zimanê turkî yê ku baş nayê zanîn û bikaranîna wî, bû sedema neçarî û aciziyê, û ji 20 milyonî zêdetir mirov ji jiyana siyasî îzole kirin, ji xwe bi awayekî aşkere weha hatibû xwastin.**

Nasnameya şexsî bi bîranînan ve bi hêz dibe, ew weke sazûmankaran jî tên dîtin û di nava muweqetiya civakê de cîh digire. Ziman ji bo sazkirina kesayetiyê alavek e, ji ber ku pêwîstiya mirov pê heye ku li ser xwe agahiyan bide. Lê dîroka Turkiyeyê bi sansur, înkar, tûndî û sînorkirinê ve reng girtiye. Vê yekê jî li ser herkesî bandoreke neyînî hişt.

Di xebatên li ser dîrokê de pêwîst e ku hesabê rewşên qedexekirina ziman û xedariyên din jî were kirin. Ji bo wê jî, pêvajoyeke direj pêwîst e û ew jî lihevhatinê tenê bi zimên mimkun dike.



*LUCERTA ARMENICA*

> **Xwendevanên hêja**
> Di hejmara me ya bihurî de, di rûpela 21'ê de tabloyeke birêz Hasan Huseyîn Devecî bi navekî din hatibû weşandin. Em ji we û ji wênesazê me yê kurd lêbihurînê dixwazin.
> *LMD kurdî*

## Çavkanî:


Aksam, T. (2006). A shamful Act. The Armenien Genocide and the Question of Turkish Responsibility. New York: Metropolitan Books.
Angehm, E. (1985). Geschichte und Identität. Berlin: De Gruyter.

Ayaz, B. (2003). Aspekte der Kurdenpolitik in der Türkei. Unterdrückung und Assimilation. In: Kurden heute – Hintergründe, Aspekte, Entwicklungen. Bonn: Navend.

Barclay, C. R. (1986). Schematization of autobiographical memory. In: Rubin, D.C. (Hrsg.) Autobiographical memory (S.292-310). Cambridge: Cambridge University Press.

Barclay, C. R. (1988). Truth and accuracy in autobiographical memory. In: M. M. Gruneberg, P. E. Morris & R. N. Sykes (eds) Practical aspects o f memory: Current research and issues. Vol. I: Memory in everyday life. Chichester: John Wiley & Sons.

Bar-On, D. (1988). Der Holocaust. Familiäre und gesellschaftliche Folgen - Aufarbeitung in Wissenschaft und Erziehung? Ergebnisse eines Internationalen Forschungs-Kolloquiums an der Bergischen Universität - Gesamthochschule Wuppertal. Frankfurt am Main: Campus.

Bauer, G. (1988). Sprache und Sprachlosigkeit im „Dritten Reich". Köln: Bund.

Bergmann, W., Erb, R. (1991). „Mir ist das Thema Juden irgendwie unangenehm" Kommunikationslatenz und die Wahrnehmung des Meinungsklima im Fall des Antisemitismus. Kölner Zeitschrift für Soziologie und Sozialpsychologie, 43, 502-519. Köln: VS Verlag.

Busse, D. (1986). Historische Semantik. Analyse eines Programms. Stuttgart: Klett-Cotta.

Dabag, M. (1998). Jungtürkische Visionen und der Völkermord an den Armeniern. In: Genozid und Moderne, Bd. 1, Strukturen kollektiver Gewalt im 20. Jahrhundert. Opladen: Leske und Budich.

Dieckmann, W. (1981). Sprache und Ideologie. Über die Ideologiegebundenheit der Sprache und die Macht des Wortes. In W. Dieckmann: Politische Sprache, politische Kommunikation. Vorträge, Aufsätze, Entwürfe. Heidelberg: Sprachwissenschaftliche Studienbücher.

Hasanpour, A. (2003). Diaspora, Homeland and Communication Technologies. In: Karim Karim (Hrsg.) The Media of Diaspora, (S. 76–88) London: Routledge.

Keller, B. (1996). Rekonstruktion von Vergangenheit: vom Umgang der „Kriegsgeneration" mit Lebenserinnerungen, Opladen: Westdeutscher Verlag.

Kermani, N. (2003). Mit Mullahs geht es nicht. In: „Die Zeit", 26.06.2003, Nr.27.

Kizilhan, I. (1995). Der Sturz nach oben. Eine psychologische Studie über Kurden in Deutschland. Frankfurt: medico international.

Kizilhan, I. (1997). Die Yeziden. Eine anthropologische und sozial-psychologische Studie über die kurdische Gemeinschaft. Frankfurt: medico international.

Kizilhan, I. (2000). Soziale und psychologische Einwirkung des Krieges auf Kinder. In: Österreichisches Studienzentrum für Frieden und Konfliktlösung (Hrsg.), Konflikt und Gewalt, Studien für europäische Friedenspolitik. Münster: agenda.

Kizilhan, I. (2004). Sozialisation im Krieg. In: Sommer, G., Fuchs, A. (Hrsg.), Handbuch der Kriegs- und Friedenspsychologie. Weinheim und Basel: Beltz.

Kizilhan, I. (2008). Die Bedeutung des Erzählens im kulturellen Kontext der Traumatherapie - Kultursensitiv-narrative Traumatherapie. In: Zeitschrift Trauma und Gewalt. Stuttgart: Klett-Cotta .

Laizer, S. (1996). Martyrs, Traitors and Patriots. Kurdistan after the Gulf War. London: Zed Books.

Steinbach, U. (2000). Geschichte der Türkei, München: Beck.

Wedel, H., Dinc, R. (2003). Rechtsreformen im Rahmen der türkischen EU-Beitrittsbemühungen und die Kurdenfrage. In: Kurden heute – Hintergründe, Aspekte, Entwicklungen. Bonn: Navend.


Wergera ji almanî: Lutfu Ballikaya

◀ R. 4

ji aliyê saziyên birêvebiriya xweser a Kosovayê bi huqûqa navneteweyî li hev dike yan na?. Bi vî awayî, cara pêşîn lihevnekirineke li ser ragihandineke yekalî ya serxwebûnê çû pêşiya dadgeheke navneteweyî.

Dîwanê di 22'ê tîrmeha 2010'an de biryara xwe aşkere kir ku tê de digot "*ragihandina serxwebûnê ya Kosovayê huqûqa navneteweyî bin pê nekiriye*". Vê biryarê gellek nîqaş jî digel xwe anîn. Ji aliyekî ve, pirraniya dewletên ku Kosova nas kiribû digot ku biryar 'nedîtî' ye lê belê ew nabe ku wekî zagonekê were dîtin. Ji aliyê din ve jî, dewletên ku Kosova nas nekiribû got ku biryar dibe ku wekî mînak were têgihiştin lewma dikare li deverên din ên cîhanê pêşî li veqetînên din veke. Beriya xwendina biryarê, serokê Sirbistanê Boris Tadîç gotibû ku heger Dîwana Adaletê zagoneke nû deyne, ev yek dê li gellek cihên cîhanê pêşî li avabûna dewletên nû bike ku ev jî dê bibe sedema xerabkirina seqemgîriyê.

## Lê belê ev biryar di warê huqûqî de tê çi wateyê?

### Biryar negirêdêr e lê serçaveke huqûqa navneteweyî ye

Her çend di prensîbê de biryarên Dîwana Adaletê biryarên şewrê bin jî xwedî bandor in û rêz li wan tê girtin. Lê belê ji hêla huqûqî ve biryar ne girêdêr e, bi tenê pêşniyarek e. Ango Dîwana Adaletê her çend li jêr Şertê Neteweyên Yekgirtî hatibe avakirin jî ne xwedî tu hêzan e ku biryarekê li ser dewletekê ferz bike ango bi dewletekê bide kirin ku li gorî biryara wê tev bigere. Mînaka herî berbiçav a vê yekê biryara Dîwanê ya li ser dîwarê Şerîaya Rojava ye. Dîwanê di sala 2004'an de biryar dabû ku dîwarê Şerîaya Rojava ku ji aliyê Îsraîlê ve hatibû avakirin neheq e û divê were rakirin. Dadgehê herweha xwastibû ku zirarên Ereban ku ji ber vî dîwarî pêk hatibûn werin tazmînkirin. Îsraîlê bi tu awayî pêwîstiyên vê biryarê bi cih ne anîn. Dîwana Adaletê jî ji ber nebûna tu hêzan nikarîbû bi Îsraîlê tu tiştî bidaya kirin.

Lê belê biryara dadgehê yek ji serçavên huqûqa navneteweyî ye û dikare di demên pêş de wekî biryara mînak were bikaranîn. Ji xwe Rûsyayê her çend serxwebûna Kosoyayê nas nekir jî, di 26'ê tebaxa 2008'an de dema ku Abxazya û Osetyaya Başûr nas kirin rewşa Kosovayê wekî mînak nîşan dabû.

Biryar di heman demê de dikare rê û rêbazekê nîşanî wan dewletan bide ku hîna di derbarê ragihandina serxwebûnê ya Kosovayê de helwêstek nîşan nedaye. Lê belê rastiyek heye ku gellek dewletên girîng ên wekî ku li jorê hatin rêzkirin beriya vê biryarê Kosova nas kiribû. Ji xwe weha nebûya Dîwan'ê jî dê biryareke weha nedabûya.

Hevdem, piştî biryareke weha ku ji aliyê dadgehê ve hat dayîn êdî dewletek nikare ragihandina yekalî ya serxwebûnê wekî sedema şerrî nîşan bide û bi vê hincetê êrîş bibe ser dewleteke din. Ango, gotarên siyasetmedar û serbazên Turk, ku tê de dihat gotin ku heger li Iraqê Kurdistanek were damezirandin ew dê vê yekê wekî sedema şerrî qebûl bikin û êrîş bibin ser wan, nabe ku wekî sedemeke meşrû were qebûlkirin.

### Dadgehê li ser çi biryar da?

Wekî ku di xala 51'emîn a biryarê de hatiye aşkerekirin Civata Giştî ji Dîwanê xwastiye ku biryarekê bide sebaret bi wê pirsê ku gelo ragihandina serxwebûnê di huqûqa navneteweyî de qedexe ye yan na. Civatê nexwast ku dadgeh li ser encamên huqûqî yên ragihandina serxwebûnê biryarê bide. Pirsa gelo Kosovayê statuya dewletbûnê bi dest xistiye yan na nehatibû kirin. Herweha encamên huqûqî yên naskirina Kosovayê ya ji aliyê dewletên din ve jî tê çi wateyê, ji Dîwanê nehatibû pirskirin. Pirs bi kurtasî û kinasî ev bû: Gelo di huqûqa navneteweyî de qedexe ye ku bi awayekî yekalî serxwebûn were ragihandin.



Yahia Silo

Dadgehê di dema biryardayînê de li ber çavan ragirt ku Lijneya Ewlekariyê di 10'ê hazîrana 1999'an de bi biryara xwe ya hejmar 1244 li Kosovayê birêvebiriyek ava kiribû: Mîsyona Birêveberiya Demkî ya Kosovayê (UNMIK). Armanca vê mîsyonê ew bû ku di pêvajoya avakirin û pêşdebirinê de alîkariya birêvebiriyên xweser bike.

Sekreterê Giştî di çiriya paşîna 2005'an de, serokê berê yê Fînlandiyayê Martti Ahtisaari, ji bo diyarkirina statuya Kosovayê tayin kir. Peywira Ahtisaari ew bû ku di navbera Kosova û Sirbistanê de qasidiyê bike da ku çareseriyeke dualî were dîtin. Lê belê di 2'ê sibata 2007'an de, piştî ku tu encam ji gotûbêjên Viyenayê derneketin Ahtisaari raporek nivîsand ku tê de digot: 'Dema çareserkirina statuya Kosovayê hatiye. Piştî hûrbûna li ser dîroka nêzîk, rastiyên îroyîn ên Kosovayê û gotûbêjên ku hatin encamdan, ez gihîştim wê encamê ku yekta çareseriya pêkan ji bo Kosovayê serxwebûn e, ku divê ji bo dema destpêkê ji aliyê civaka navneteweyî ve were çavdêrîkirin.' (*xala 5*) Ji xwe Kosovayê ragihandina xwe ya serxwebûnê dispart vê raporê jî.

### Yekparebûna xakî

Gellek dewletên, ku li ser Kosovayê nihêrînên xwe ragihandibûn Dîwanê, digotin rêzlêgirtina yekparebûna xakî ya dewletekê herweha qedexeya ragihandina yekalî ya serxwebûnê jî bi xwe re tîne. Dîwanê jî Şertê Neteweyên Yekgirtî (Xala 2, benda 4) bi bîr xist ku di bibêje: 'Divê hemû endam di têkiliyên xwe yên navneteweyî de ji gefxwarin û bikaranîna hêzê ya li dij yekparebûna xakî û serxwebûna siyasî ya dewletekê ... îmtîna bikin.' Lê belê dadgehê herweha diyar kir ku ev şert û mercên ku di Şertê NY'yê de hatine rêzkirin li Kosovayê pêk nehatine ji ber ku di rewşa Kosovayê de êrîşeke ji derveyî welêt nîne, dijberî vê yekê, biryara serxwebûnê ji nav welêt hatiye. Ango her çend di huqûqa navneteweyî de qedexeyeke li ser êrîşbirina ser welatekî din hebe jî ragihandina serxwebûnê nehatiye qedexekirin.

Dadgehê herweha hewce nedît ku mafê self-determînasyonê bi awayekî giştî hilde dest. Dadgehê di pêvajoya bersivandina daxwaza Civata Giştî de, Biryara hejmar 1244 (1999) a Lijneya Ewlekariyê û herweha çarçoveya destûrî wekî parçeyeke huqûqa navneteweyî hesibandin.

Di warê huqûqîbûna ragihandina serxwebûnê de dadgehê herweha li ser wê dezgehê ku serxwebûn ragihandibû hûr bû. Dadgeh gihîşt wê encamê ku dezgehên ku serxwebûn ragihandiye di nav çarçoveya destûrî de wekî parçeyeke birêvebiriya xweser tev negeriyane lê belê wekî nûnerên gelê Kosovayê tev geriyane. Lê belê dadgehê herweha biryar da ku ragihandina serxwebûnê biryara hejmar 1244 (1999) a Lijneya Ewlekariyê bin pê nekiriye.

## Kosova û Kurdistan çiqas wekî hev in?

Kosova ji sala 1974'an de, di Destûra Yugoslavyaya berê de wekî herêmeke xweser hat naskirin û ji êrîşa asmanî ya NATO'yê ya sala 1999'an û vir ve bi awayekî fiîlî welatekî serbixwe bû.

Ji van hêlan ve rewşa Kosova bêhtir nêzî rewşa Kurdên Başûrê Kurdistanê ye. Kurdên Iraqê, ku Mela Mistefa Barzanî pêşengiya wan dikir, di adara 1970'an de xweseriyek bi dest xist. Her çend herêmên xwedî petrol ên wekî Kerkuk û Xaneqîn li derveyî herêma xweser a Kurdistanê hatibûn hiştin jî Kurd di hukumetê de jî bûn xwedî cih û payeyê. Di vê serkeftina Kurdan de têkiliyên aloz ên Iraqê yên bi Îranê re û herweha bandora Sovyetan jî risteke girîng lîst.

Lê belê di nîsana 1972'an de Iraqê digel Sovyetan peymaneke hevalbendiyê mohr kir. Pirr neçû di sala 1974'an de artêşa Iraqê dest bi êrîşkirina Kurdan kir. Piştî ku di adara 1975'an de Iraqê digel Îranê Peymana Cezayîrê girê da û pê xwast ku pêşî li alîkariya Îranê ya ji bo hêzên Mela Mistefa Barzanî bigire, Iraqê daxwazên Îranê qebûl kirin. Ji xwe piştî van bûyeran Iraqê sedan gundên Kurdan wêran kirin, hezaran Kurd ku di nav wan de jin, pîr û zarok jî hebûn yan kuştin yan jî mişext kirin.

Têkoşîna li Başûrê Kurdistanê di salên 1980'î de careke din geş bû. Rejîma Iraqê di sala 1988'an de Nahiyeya Helebçeyê kîmyabaran kir. Di Enfalkirina Kurdan de, ku di heman salê de dest pê kir, dora 200 hezar Kurdên sivîl di nav çend mehan de yan hatin kuştin yan jî hatin bêserûşûnkirin. Di sala 1991'ê de di dema Şerê Kendavê de artêşa Iraqê dîsa erîş bir ser Kurdistana Başûr ku lê raperîneke berfireh dest pê kiribû. Bi sedan hezaran sivîl ber bi sînorên Turkiye û Îranê ve reviyan. Li ser vê yekê Lijneya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekgirtî di nîsana sala 1991'ê de bi biryara xwe ya hejmar 688 bajarên Duhok, Hewlêr û Silêmanî ji firrîna balafirran re qedexe kir. Vê yekê jî derfet da hêzên Başûrê Kurdistanê ku bi awayekî *de facto* hukumetekê damezirînin.

Di sala 2003'an de pîştî ku rejîma Sedam ji aliyê wan hêzan ve hat rûxandin ku, Amerîkayê pêşengiya wan dikir, destûra Iraqa Federal hate pejirandin ku tê de herêma Kurdistanê wekî herêmeke federal tê binavkirin. Herweha, hat biryardan ku statuya bajarên wekî Kerkuk ku li jêr desthilatdariya Hukumeta Herêmî de bûn dê di encama referandûmekê de were diyarkirin. Lê belê him ji ber hukumeta navendî ya Iraqê him jî ji ber astegiyên ji hêzên li herêmê ev referandûm hîna jî pêk nehat.

Di roja îroyîn de jî pirsgirêkên ku di navbera Başûrê Kurdistanê û Hukumeta Navendî ya Iraqê de hene nehatine çareserkirin û ber bi dijwarbûnê ve diçin. Lihevnekirinên ciddî yên sebaret bi sînorên Herêma Kurdistanê û bi maf û selahiyetên hukumeta navendî û hukumeta herêmî hîna jî berdewam dikin. Hukumeta navendî çawa ku referandûma Kerkukê paş de diavêje û wan peymanên petrolê ku hukumeta herêmî bi tena serê xwe girê dane qebûl nake herweha her ku hêza xwe zêde dike dixwaze sînorkirinên zêdetir bîne ser herêma Kurdistanê.

Heger mudaxaleyên li ser Hukumeta Herêmî zêde bibin, rê li mafên

Kurdan, ku di destûra federal de hatine naskirin, neyên vekirin û ev maf werin binpêkirin û herweha heger Kurd nikaribin digel Erebên Sunnî û Şiiyan sîstemeke federal bi rê ve bibin wê demê Başûrê Kurdistanê dikare xwe wekî dewleteke serbixwe ragihîne. Ji xwe, Destûra Herêma Kurdistanê ku ji aliyê parlamentoyê ve hatiye pejirandin û yek ji prensîbên huqûqa navneteweyî 'mafê çarenûsê' dîpejirîne û çav li rê ye ku referadûmek ji bo wê were lidarxistin.

Heger Başûrê Kurdistanê wekî ku Kosovayê kir, bi awayekî yekalî serxwebûna xwe rabigihîne ev yek dê ne li dij huqûqa navneteweyî be. Beriya her tiştî berê jî herêma Kurdistanê xwedî statuya xweseriyê bû û piştî 2003'an ev statu di fermiyetê de hat hêzdartirkirin. Herweha ev herêm di pêşerojê de tûşî pêkutiyên tund ên dewleta Iraqê bûbû û bi biryara hejmar 688 (1991) a Lijneya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekgirtî bi awayekî qismî karibû ku azadiya xwe biparêze. Ji vê hêlê ve, heger ew sîstema ku ji aliyê destûra Iraqê ve hatiye anîn bi rê ve neçe Kurd dê wekî neteweyek bi xetereke gellek mezin re rû bi rû bimînin.

Di biryara Dîwana Adaletê ya Navneteweyî de biryar hat dayîn ku serxwebûna Kosovayê huqûqa navneteweyî bin pê nekiriye. Di vê biryarê de du xalên girîng hene ku divê werin ravekirin.

Ê pêşîn têkiliya di navbera prensîbên 'self-determînasyonê' û 'desthilatdarî û parastina sînorên dewletan' e. Dadgehê di biryara xwe de wê meseleyê bi zelalî aşkere nake ka prensîba desthilatdarî û yekparebûna xakî ya dewletekê bi tenê dikare li dij erîşên ji derveyî welêt dikarin werin dozkirin yan ew herweha dikarin li dij pirsgirêkeke navxweyî ya dewletekê jî werin dozkirin. Hevdem, biryarê girîngiyeke taybet dide biryarên Lijneya Ewlekariyê ku sebarte bi her rewşeke din cuda cuda hatiye ragihandin. Lê belê dadgeh di mijara self-determinasyonê de şîroveyeke firehtir tîne ku Lijneya Ewlekariyê li ser wan pirr biryar nedabû. Dadgeh herweha di wan mijaran de ku çareseriyekê pêşniyar bike bêhtir helwêsta Lijneya Ewlekariyê wekî esas digire.

Mijara duyem jî meseleya naskirina dewleteke nû ragihandî ye. Peydabûna dewleteke nû piranî encama bikaranîna mafê self-determînasyonê ye lê belê huqûqa navneteweyî 'naskirin'ê wekî şertê pêkhatina dewletekê qebûl nake. Naskirin bi tenê têkiliyên dewletan ên bi dewletan û rêxistinên navneteweyî re diyar dike. Lê belê di pratîkê de berdewamkirina welatekî nû damezirandî pirtir bi naskirina ji aliyê herî kêm yek ji endamên Lijneya Ewlekariyê ve girêdayî ye ku xwedî mafê vetoyê ne. Ji ber ku ragihandina dewleteke serbixwe dikare bi tenê bi biryara Lijneya Ewlekariyê ya NY re wekî neqanûnî were ragihandin.

Di warê rewşa Kurdên Başûrê Kurdistanê de, ji ber van wekheviyan, ragihandina serxwebûnê nayê wateya binpêkirina huqûqa navneteweyî. Lê divê neyê jibîrkirin ku di hêla siyasî de Kurd dibe ku rastî helwêsteke din werin ku dikare wekî Kosovayiyan erênî nebe. Her çend ev yek, an ku nebûna naskirina siyasî bandorê li ser encamên biryara dadgehekê nake jî, ji bo pêşdebirina vê serxwebûnê, nasbûna li dunyayê xwedî risteke girîng e. Ji ber wê yê ev jî di destê Kurdan de ye ku têkiliyên baş ên siyasî digel welatên din, cîranên xwe deyne da ku statuya xwe ya siyasî hêzdar bike.

### Wateya Biryara Kosovayê ji bo Kurdistana Bakur

Aliyekî din ê girîng ê biryara Dîwana Adaletê jî avabûn û çawaniya wê vînê ye ku li ser navê neteweyê serxwebûn ragihaniye. Ji xwe di biryarê de tê derblêdan ku serxwebûn ji aliyê meclîsa hilbijartî ya Kosovayê ve hatiye ragihandin.

Kurdên li Turkiyeyê ji damezirandina komarê û vir ve, ne bûn xwedî xweseriyeke herêmî ne jî nasnameya wan bi awayekî fermî hat qebûlkirin. Di nava pergala huqûqa Turk de Kurd hîna jî tune tên hesibandin. Herweha her çend Kurd nayên qebûlkirin jî gellek qedexe jî nemaze li dij wan tên bikaranîn.

Partiyên ku doza mafên bingehîn ên gelê Kurd dikin tên qedexekirin, partiyên legal jî her tim tûşî pêkutî û astengiyan dibin. Lê dîsa jî rêjeyeke bilind a gelê Kurd di hilbijartinên herêmî û giştî de dengên xwe didin nûnerên xwe yên kurd. Ji xwe, di hilbijartinên di van çend salên dawî de gellek şaredarî û meclîsên parezgehî û herweha muxtarî jî ketin destê Kurdan. Lê di hilbijartinên gîştî de ji ber benda bilind a ji sedî dehî Kurd wekî 'serbixwe' ketin parlamentoyê.

Bi rastî jî ev hemû, xwedî potalsiyeleke mezin in ku daxwazên Kurdên li Bakurê Kurdistanê bên ziman, nemaze jî di warê mafê self determînasyonê de. Ji xwe daxwazên gel çi dibin bila bibin ê girîng ew e ku ev daxwaz yan rasterast ji aliyê gel ve yan jî bi destê nûnerên hilbijartî û avabûneke meşrû ve werin diyarkirin.

Di vî warî de, meclîseke herêmî ku tê de hilbijartî an ku şaredar, endamên meclîsa parezgehan, endamên parlamentoyê û muxtar beşdar bibin, dîkare bi awayekî *de facto* bibe organeke meşrû ya nûnertiyê. Ev yek jî dê di warê ragihandina daxwazên neteweyî-demokratîk ên mafdar ên gelê Kurd di qadên neteweyî û navneteweyî de bi awayekî hêzdartir rola xwe bilîze.

Biryara Kosovayê ya Dîwana Adaletê ji bo Kurdên Bakur jî girîngiya organên demokratîk ên nûnertiyê nîşan dide. Biryar wekî din xalên girîng nîşan dide ku di warê têkiliyên navxweyî û navneteweyî de û herweha di warê dîplomasiyê de divê girîngî li ser çi were dayîn.

*Huqûsnas. (Nivîskar ji bo tevkariya wî spasdarê hevpîşeyê xwe Birêz Riza Dînç e).

1 Ji bo bêhtir agahiya li ser prensîba self-determînasyonê tika ye binihêrin: Hejmara *Le Monde Diplomatique* ya gulana 2010'an

2 ICCPR, Art. 1; ICESCR, Art. 1

3 http://news.bbc.co.uk/2/hi/europe/7249677.stm

# AWIREK LI KOSOVAYÊ

Kosova herêmeke li naverasta Ewropayê ye ku bi welatên din ve hatiye dorpêçkirin, ango cîranê ne tu deryayan e. Pirraniya niştecihên vî welatê herî xizan ê Ewropayê, Arnawitên musulman in ku ji nîvî zêdetirê wan di nav hejariyê de dijîn. Her çend Kosova xwedî dewlemendiyên sirûştî an ku serçavên madenî yên binê erdê ye jî çandinî hîna jî çalakiya sereke ya aborî ye ku xelk pê debara xwe dikin.

Hejmara Arnawitan ku ji sedî nodê welêt pêk tînin dora du milyon e. Dora sed hezar Sirb jî li Kosovayê dijîn ku digel gelên din ên ne-Arnawit, ku ji ber şerrî reviyane, ji sedî dehê gelheya Kosovayê pêk tînin. Sirbên li Kosovayê, li jêr çavdêriya hêzên aştiyê yê NATO'yê li wan herêman dijîn ku ji ya Arnawitan cihê ye.

Ev welat, ê ku bi sedan sal şahidiya tengezariya di navbera Sirban û Arnawitan kiriye, ji sala 1999'an heta 2008'an ji ber şerr û pevçûnên etnîkî ji aliyê NY'ê ve hat birêvebirin. Û di dawiyê de di sibata 2008'an de Kosova bi awayekî yekalî veqetîna xwe ya ji Sirbistanê ragihand.

Di serî de Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA) gellek welatên mezin ên Yekitiya Ewropayê (YE) ragihand ku ew serxwebûna Kosovayê nas dikin. Le belê Sirbistan, ku Kosova jê veqetiyabû, bi piştgiriya hevbenda xwe ya Rûsya li dij vê serxwebûnê derket û diyar kir ku ew tu caran napejirîne ku Kosova li cem NY'ê bibe xwedî kursiyekê.

### Dîroka Kosovayê

Slav û Arnawit ji qurneya 8'an û vir ve li Kosovayê bi hev re dijîn. Ev herêm heta naverasta qurneya 14'an navenda Împeratoriya Sirban bû ku Sirb vê derê wekî cihê peydabûna dewletên xwe bi nav dikin.

Piştî Şerrê Kosovayê yê 1389´an, ku Sirb tê de têk çûn, Kosova ket jêr desthilatdariya Osmaniyan. Osmanî heta sala 1913´an li Kosovayê desthilatdar bûn lê paşê, piştî Şerrê Balkanê yê Yekem, herêm bû parçeyeke Kraliyeta Sirban. Bi dû re jî di sala 1946'an de piştî Şerrê Cîhanê yê Duyem Kosova tev li Federasyona Yugoslavyayê bû.

### Ber bi xweseriyê ve

Di domahiya sedsala 20'an de Sirb û Arnawit ji bo bidestxistina serdestiya herêmê her tim di nav pêşbirkê de bûn. Di sala 1960'î de ji ber pêkutiya li ser nasnameya Arnawit a li Kosovayê, pêşî lê vekir ku Arnawitan ji Belgradê xweşbîniyekê werbigirin ku bi vî awayî wan hêz ji birêvebiriyê wergirt.

Di sala 1974'an de Destûra Yugoslayayê Kosova wekî herêmeke xweser nas kir. Daxwazên serxwebûnê jî piştî mirina Tîto'yê Serokê Yugoslavyayê bilindtir bûn. Lê belê ew neyartiya li dij Kosovayiyan di dema desthilatdariya serokê nû, Slobodan Mîlosevîç de her berdewam bû. Piştî ku di sala 1989'an hat ser kar Mîlosevîç dest bi pêvajoya paşdegirtina mafê xweseriyê kir.

Li dij vê yekê berxwedaneke pasîf dest pê kir. Lê ev tevger di salên 1990'î de têk çû. Her çend hin serokên Arnawit di sala 1990'î de bi awayekî yekalî serxwebûna xwe ragihand jî, serxwebûn li aliyekî, Arnawitan nikarîbû xweseriya berê jî bi dest bixin.

Di naverasta 1990'î de tevgera gêrîlayên Arnawit a bi navê Artêşa Rizgariya Kosovayê dest bi êrîşên xwe yên li dij hêzên Sirban kir. Ev berxwedana çekdarî ya Arnawitan rê li êrîşên dijwar û herweha bêrehm ên Sirban vekir. Hezaran Arnawit ji aliyê Sirban ve hatin qetlkirin û di goran de bi awayekî ser hev hatin veşartin.

### Şerr

Slobodan Mîlosevîç tu lihevhatineke bi navberkariya qasidên navneteweyî ne pejirand û dev ji zulma xwe ya li ser Arnawitên Kosovayê berneda ku vê helwesta wî di adara 1999'an de pêşî li êrîşa asmanî ya NATO'yê ya li ser armancên çekdar ên Sirban ên li Kosova û Sirbistanê vekir.

Hevdem, hêzên Sirban li dij Arnawitên Kosovayê dest bi 'paqijiya etnîk' kiribû. Bi sed hezaran penaber ber bi Arnawitistan, Makedonya û Qeredaxa Çiyayî ve reviyan. Di vî şerrî de bi hezaran kes jî hatin kuştin.

Di havîna 1999'an de hêzên Sirban ji Kosovayê hatin derxistin û di şûna wan de leşkerên NATO'yê bi cih bûn. NY'yê jî birêvebiriya Kosovayê girt ser xwe.



SIRBISTAN Û SERXWEBÛNA KOSOVAYÊ

# Hêz û sergêjiya dîplomasiya sirbî

JEAN-ARNAULT DÉRENS *

Serxwebûna ku Kosovayê gulana 2008'an yekalî îlan kir, lê belê ji aliyê pirraniya Dewletan ve nehatiye naskirin, dê di Meclîsa giştî ya Yekîtiya Neteweyan de ku vê îlonê li New Yorkê dicive, bibe mijara rojevê. Ev sê sal in ku dîplomasiya sirbî hewl dide ku welatên din qane bike ku serxwebûna herêma wê ya berê bi awayekî fermî nas nekin; ji xwe re gellek piştgir jî peyda kirine ku ev hêvî ji wan nedihat kirin.

Piştî ragihandina serxwebûna Kosovayê ya 17'ê sibata 2008'an, serokwezîr Haşim Taçî pirr bi bawerî digot ku ew li bendê ye di nava çend hefteyan de *«qederê sed»* dewletan Kosovayê nas bikin. Piştgirên rojavayî yên vê dewleta nû jî, bi rexê xwe ve, qane bûbûn ku pêvajo dê li gorî mijarên din bi lez bi rêyê ve biçe û bigihîje encamê. Diyar e ku Sirbistanê bi xwe jî hêviyên pirr mezin nedikirin, lewre stratejiyeke bersivdanê ya pirr nerm dabû ber xwe û qîma xwe pê anîbû ku bo çend mehan sefîrên xwe yên li wan welatên ku zû û berî welatên din Kosova nas kiribûn, vekişîne.

Lê belê, serê tebaxa 2010'an, ji 192 endamên Neteweyên Yekbûyî (NY) bi tenê 69 endaman dewleta nû nas kiribû. Bêguman, bi vî halê xwe ve, ev hejmar Pristinayê li ber dergehê pirraniyeke mezin a rêxistin û saziyên navneteweyî asê dike ku, ji bo Belgradê (1), ev bûyer zengila serkeftineke mezin û nepayî bû. Sirbistanê dizanî ku dikare xwe bisipêre du hevpeymanên xwe yên bi hêz, ku herweha endamên daîmî yên Lijneya Ewlekariyê ya NY'yê ne : Rûsya û Çîn. Lê belê, li hember naskirina dewleta nû dijberiyên sereke ji Afrîqa û Asyayê hatin. Ji ber ku hejmareke mezin a dewletan ji xwe li dijî doz û daxwazên cudaxwazên aşkere an jî potansiyel in, û lewma bi çavekî xirab li emsala ku Kosova temsîl dike diniherin. Di vê çarçoveyê de, qet zehmet nîne mirov têbigihîje ka çima Fas, Endonezya an jî, di nava Yekîtiya Ewropayê de, Spanyayê piştgiriyeke wisa xurt da Belgradê.

Nexşeya dewletên ku bersiv nedane banga Pristinayê dibe tabloya coxrafyayeke siyasî ya balkêş. Tê de dewletên pirraniyeke mezin a Amerîkaya latîn, ji çaran sêyê Yekîtiya Afrîqayê, hetta pirraniya endamên Rêxistina konferansa îslamî cîh digirin. Diyar e ku di rewşa dewletên Konferansa îslamî de, li gorî hevgirtina digel welatekî ku bi pirraniya xwe ve musulman e, hesta dij-amerîkan girantir û girîngtir derhatiye; lewre bidestxistina serxwebûnê ya Kosovayê wek encama tercîheke rasterast a Washingtonê dihate dîtin. Bi tenê ew dewletên ku digel Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê xwedan peywendiyên pirr nêzîk in beşdarî di naskirinê de kirin: Afganistan, Erebistana Suûdî, Quweyt û Bahreyn, û herweha Turkiyeya ku bi rexê xwe ve digel Kosovayê peywendiyên dîrokî û cuda radigire.

Beramberî vê, welatên Mexribê, her wekî muxalifên aşkere yên siyaseta Amerîkayê, wekî Sûriye, Lîbya û Îranê, xwe pirr bi aşkereyî û tûndî di nava bereya Sirbistanê de bi cîh kirin. Êdî ji bo Sirbistanê bes bû ku hema xwe bihêle ber pêla qewimîn û pêşhatan, û çend caran hindek jestên dîplomatîk bike, weke ku, hezîrana 2009'an, di serdana Mehmûd Ebbasî ya Belgradê de kir. Serokê dewletê Boris Tadic, li rex serokê Desthilata Filistînê, careke din pabendiya xwe bi biryarên Lijneya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî derbirrî: ew biryarên derheqê Filistînê de û herweha bi biryara 1244 ya bi berwara 10'ê hezîrana 1999'an, ku serweriya Sirbistanê li ser Kosovayê destnîşan dike.

Serkeftinên Belgradê li Afrîkayê jî gellek serincrakêş bûn, ku ji xwe wisa tê zanîn ku li wan herêman gellek dewlet pirr hesas in beramber «pêşniyar» an jî fişarên kevne-hêzên kolonyal ên wek Fransa û Brîtanyayê. Bo nîvê yekem ji 2010'an, tabloya nêçîrvaniya dîplomasiyê ya fransî lawaz xuya dike: bi tenê Djibouti razî bû ku li dû danûstandinên digel Fransayê qane bibe û dewleta nû nas bike. Sirbistana ku hêj jî li ser parzemîna reş xwedan toreke fireh a peywendiyan e, siyaseteke çalak bi rê ve bir û di hemû civînên bilind yên Yekîtiya Afrîkayê de amade bû, ku di wan civînan de statuya wê ya çavdêriyê heye. 22'yê hezîrana bihurî, gava ku Dadgeha adaletê ya navneteweyî (ICJ) boçûna xwe derdibirrî û «yasayîbûna» ragihandina serxwebûna Kosovayê nas dikir, alîkarê serokwezîrê sirbî Bozidar Djelic jî di civîna bala ya rêxistina pan-afrîkayî de li Kampalayê (Ûganda) axaftinek dikir.

Di vî şerrê tesîr û alîgiriyan de, Belgradê gellek ji Pristinayê zêdetir amraz û koz hebûn, ku Pristinaya paytexta taze bêgav bû ku xwe berde nav destên hevalbend û parêzerên xwe yên bi hêz ên ewropî û amerîkî. Li rexê din, gellek kesan li Kosovayê rexneyên pirr tûj li wezîrê karûbarên derve Skënder Hyseni girtin û gazind kirin ku bi awayekî aşkere pasîf dimîne. Qederê du salan, lewre, ji bo îsbatkirin û berçavkirina pabendiya xwe ya digel cîhana rojavayî, Kosovayê îstifade ji karta «hevgirtina îslamî» nekir. Ev siyaset nuha li jêr pirsiyaran e, û muftiyê Pristinayê yê mezin, Naim Tërnava, êdî dest avêtiye çalakiyên lobiyê li sertaserê cîhanê û di wan hewlên xwe de heta dereceyekê serkeftî ye jî.

Herweha, Sirbistanê karî îstifadeyê ji rayedar û torên rêxistinekê bike ku wisa dihate zanîn ku êdî li ber sekeratê ye : Tevgera Bêaliyan (TB), ku Yûgoslavyaya mareşal Tîtoyî yek ji avakerên wê bû. Şerrên salên 1990'î ew tevger bi rengekî ciddî dabeş kiribû; hindek ji welatên ku pirraniya xelkê wan musulman bû, pişta Bosna-Hersekê digirt, di demekê de ku yên din peywendiyeke nêzîktir digel Belgradê radigirt. Rewş û pozîsyona Sirbistanê ya xurt



diyar rê dayê ku digel TB'yê li hev bike: welatê ku sala 1999'an kete ber bombebaranê, ji aliyê leşkerî ve bê alî ye û berendamê ketina nav Rêxistina Peymana Atlantîk a Bakurî (NATO) nîne.

Dibe ku biryara ICJ'yê, ku hejmareke mezin a dewletan ji bo aşkerekirin û ragihandina meyl û biryara xwe li bendê bûn, rû û rewşa meseleyê biguhere. Li gorî texmînên wezîrê karûbarên derve Vuk Jeremic, îro nêzîkî pêncî dewletan «dudil» in –bi taybetî li Afrîka û Karayîban, ku ji ber fişara dewletên rojavayî hessas in. Digel vê hindê jî, Sirbistanê dil nîne ku stratejiya xwe biguhere. 26'ê tîrmehê, civîneke derasayî ya Parlamentoyê, çiraya kesk li hukumetê pêxist ku di kampanyaya xwe de berdewam be û diyar e ku dê di çarçoveya wan amadekariyan de ku bo meclisa giştî ya NY'yê ya vê meha îlonê têne encamdan, ev kampanya dê tîr û çalaktir be. Sirbistanê pêncî û pênc nûnerên taybet hinartine herêmên cuda yên dunyayê da ku «dudilan» ji meyla naskirina Kosovayê vegerînin.

Lê belê, halê heyî hindek pirsgirêkên mezin hene li ber Sirbistanê. Hêj jî toreke temsîlên dîplomatîk ên ji kevne-Yûgoslavyayê mîratgirtî di destên wê de ne, ku bêguman ew mîrateke jî bejna Sirbistanê zêde ye. Di nav bîst salan de bi tenê kariye çengekê ji wan bigire, di demekê de ku pirsgirêkên xwedantiya mal û milkan hêj jî nehatine çareserkirin : bo nimûne, xwedantiya hindek avahiyan hêj jî nakokbar e, û Belgrad divê gellek caran kirêyên pirr giran bide ji bo ragirtina mal û milkên ku xwedantiya wan êdî li ser navê komarên din têne destnîşankirin. Di nav wan şertan de, temsîliyeta sirbî gellek caran dadikeve şiklê ekîbên berteng, îmkanên karkirinê yên ecêb û bêkêr, hindek caran li avahiyên di halê kavilan de.

Piştî ku rayedarên sirbî di bihara 2009'an de digel Fona Pereyan ya Navneteweyî (IMF) peymanek girê da, rewşa Sirbistanê gellek hessastir bûye: wek berdêla krediyeke îstiqrarê ya bi 3 milyar euroyan, Sirbistanê bernameyeke hişk a jidandina kemeran qebûl kir ku hemû wezaret, hetta wezareta karûbarên derve jî tê de, ketine bin tesîra wê bernameyê. Dîplomatekî sirbî ku heyamên dawî bo Afrîkayê hatiye tayînkirin, li jêr sîwana nihênîbûna navê xwe, weha derdibirre nerihetiya xwe: *«Hemû projeyên din hatine cemidandin. Me êdî bi tenê wezîfeyek heye : qanekirina wan dewletên ku em lê bê qedr in, da ku serxwebûna Kosovayê nas nekin».*

Lê belê bi perspektîfên çawa? Tîrmeha 2009'an, serokdewlet Tadîç ji civîna bilind ya bêaliyan ya li Charm el-Cheikha Misrê vegeriya û diyar bû ku qane bûbû ku êdî dê bikare pişta xwe bisipêre hindek hevalbendên bi nirx û bazarên girîng bi dest bixe. Dengên dijber ji meydanê kêm nebûbûn, wekî dijberiya Tanja Miscevic, kevne-birêvebira Buroya sirbî ya ji bo entegrasyona ewropî, ku bi bîr dixe ku roja ku Sirbistan tevli Bîst-û-Heftan dibe, dibe ku girêbestên ku hatine îmzekirin jî betal bibin. Ew aso hêj pirr dûr xuya ye; lê belê Belgradê ji xwe ji bo 55'êmîn salvegera Danezana Brioniyê (2), rêkeftina resmî ya pêkhatina Hereketa Bêlayenan, fikra sazkirina civîneke mezin aşkere kiribû. Ji ber nebûna derfet û vîna siyasî, ihtimal e ku proje negihije serî.

Armancên dîplomasiya sirbî di du xalên birêveçûnê de kom dibin: dijberiya li her çi naskirineke serxwebûna Kosovayê û endametiya li Yekîtiya Ewropayê, ku heta nuha Brukselê ji bo vê yekê normalîzekirina peywendiyên digel Pristinayê wek şert nedaye ber Sirbistanê. Digel vê hindê jî, pirr zehmet e ku endametiya Sirbistanê berceste bibe heke lihevhatinek li ser sînorên dewleta endam ya nû pêk neyê (3). Yekîtiya Ewropayê, tevî dîtin û boçûnên wan ên cuda (4), hewl didin êdî qet nebe pozîsyoneke hevbeş bigirin: wisa ferz dikin her du dewlet dê bigihine «peywendiyên baş ên cîrantiyê», digel ku kes ne li bendê ye ku Belgrad di demeke kurt de cudabûna eyaleta xwe ya kevn qebûl bike. Heke Sirbî di êrîşên xwe yên dîplomatîk de berdewam bin, tê heye ku peywendiyên xwe yên digel Brukselê xerab bikin û bixine ser rêyeke bêîstiqrar.

Di meclisa giştî ya Neteweyên Yekbûyî de, dibe ku du pêşniyarnameyên dijber, yek ji aliyê Belgradê ve, ya din ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve, ji bo dengdayinê bêne pêşkêşkirin. Sirbistan, bi saya hejmareke mezin a piştgirên xwe, ihtimal e ku ya xwe bide qebûlkirin. Lê belê, serkeftina wê dê bi du-qeraxî be, yanî encamên baş jî yên xerab jî tê de hebin, ji ber ku stratejiya wê bi tenê ew e ku naskirina navneteweyî ya Kosovayê heta ku ji wê tê bi paş ve bixe. Herweha dilxwazî û îradeya xwe nîşan dide ji bo destpêkirina muzakereyên nû li ser statûya herêmê, ku ev yek dê hingî jê re bi kêr bihata heke biryara ICJ'yê di lehê Sirbistanê de bûya.
Di heman demê de, Belgrad naxwaze rîska berhelistîkirina li dewletên rojavayî hilgire. Gellek şexs û alî, hetta ji nav Partiya demokratîk a Tadic jî, ji bo endambûna NATO'yê piştgiriya xwe derdibirrin. Di van şert û mercan de, ihtîmal e ku ew «hêza» piçûk ku ev çend salên dawî ne li ser dika dîplomasiya sirbî diyar dibe nemîne bo sibe.

* Sernivîskarê *Courrier des Balkans* (http://balkans.courriers.info)
Berhema wî ya dawî (digel Laurent Geslin): *Voyage au pays des Gorani (Balkans, début du XXI^e siècle)*, Cartouche, Paris, 2010.

1 Kosova bi tenê dikarî di hezîrana 2009'an de bibe endamê IMF û Banqeya Cihanê. Mafê dengdayînê yê van welatên endam bi aboriya wan a hêzdar re girêdayî ye. Di vî warî de endametiya Kosovayê jî girêdayî welatên pêşketî yên Ewropayê ye.

2 Mala ku Tîto herî zêde jê hez dikir li ser giraveke piçûk a bi navê Brioni ye ku li Xirvatistanê ye. Li wê derê di tîrmeha 1956'an de serokdewletên Misirê (Gamel Abdel Nasser), yê Yugoslavyayê (Josip Broz Tito), yê Kamboçyayê (Norodom Sihanouk) û yê Hindistanê (Jawaharlad Nehru) hatibûn cem hev.

3 Bixwînin: ''Interminable fiançaille entre Bruxelles et les balcons'', *Le Monde diplomatique*, çiriya paşîn 2009.

4 Hîna jî pênc endamên YE'ê serxwebûna Kosovayê nas nakin: Îspanya, Slovakya, Romaniya, Yûnanistan û Qibris. Bi tenê Yûnanistan dikare di demeke nêzîk de vê biryara xwe di ber çavan re derbas bike.

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

BREZÎLYA

# Bîlançoya civakî ya serdema “Lula”

GEISA MARIA ROCHA *

**Ji cerga vegera demokrasiyê (1984), cara yekem e ku Brezîlî dê 3’ê çiriya pêşîna 2010’an biçin hilbijartinên beyî Luiz Inácio Lula da Silva. Gelo, weke ku çepê jê hêvî dikir, di du dewrên serokatiya vî sendîkavanê kevn de Brezîlya veguherî?**

Dema 29’ê adara 2010’an, *Wall Street Journalê* dipirsî ka gelo Brezîlî ji serokê(a) xwe yê(a) ku dê meha çiriya pêşîn were hilbijartin çi hêviyê dikin, bi lez û bez digihîşt vê encamê: “*Bila rewş neguhere!*” Mirov li hember vê daxwazê bi tevahî ecêb namîne. Qet nebe, ji ber derfeta gihiştina zad û qutê têra mirovan dike; ji çend salan û vir ve, mirovên ku berê têr nedixwarin, êdî dikarin zikê xwe têr bikin.

Di îlona 2003’an de, di nava sala desthilatdariya xwe ya pêşî de, serok Luiz Inácio Lula da Silva ev soz da: “*Ji nuha heta dawiya dewra desthilatdariya min, êdî wê tu Brezîlî birçî nemîne.*” Ev rewş bi sozên dayî yên bi coş re li hev dike; pêşketina pêk hatî dîsa jî hêja ye. Li gorî îstatîstîkên fermî, di nava 7 salan de, nêzî 20 milyon Brezîlî (nifûsa Brezîlyayê 190 milyon e) ji xizaniyê xilas bûne. Bi alîkariyeke mehane ya (di destpêka 2007’an de) ji 18 euroyan digihêje heta bi 90 euroyan, bernameya *Fome Zêro* (“birçîtî tuneye”) misoger kir ku malbatên hewceyî zad û qut hewcedariyên xwe peyda bikin. Encam: di nava dewra pêşî ya destjhilatdariya “Lula” de, kêmxwarina zarokan ji sedî 46 kêm bû. Li herêma Nordeste – herêma ku serokdewlet jê tê û ew bi xwe jî lê birçî maye – ev rêje ji sedî 74 kêm bû. Di gulana 2010’an de Bernameya Zad û Qut a Cîhanê (WFP) ya Neteweyên Yekbûyî navê “di şerrê li dijî birçîbûnê de şampiyonê cîhanê” li Lula da Silva kir û ew derxist pêş.

Brezîlya dîsa jî yek ji wan welatan e ku li dunyayê newekhevî lê herî bilind e, lê belê ew li gorî berê hinekî hindiktir newekhev e. Di navbera 2003 û 2010’an de hatina maddî ya mirovên herî xizan (ji sedî dehê nifûsê) salê ji sedî 8 zêde bû: Ev rêje ji mezinbûna aboriya welêt û ji mezinbûna ji sedî dehê nifûsa welêt a herî dewlemend (hatina wan salê ji sedî 1.5 zêde bû) dibihure. Para çînên navî yên li jêr – malbatên ku abora wan a mehane di navbera 1065 û 5591 realan de (di navbera 467 û 2000 euroyan de) – a ku ji sedî 37 bû, ji nîvê nifûsê bihurî. Di sektora perwerdehiyê de, bernameya *ProUni* alîkariyê dide xwendekarên ji malbatên feqîr û, gava ku mirov li nêvî bixe, dema xwendina li dibistanê ji bo tevahiya nifûsê, ku berê 6.1 sal bû (di 1995’an de), di 2010’an de gihişte 8.3 salan.

### Tora Parastinê

Di nava du dewrên desthilatdariya sendîkavanê berê de, 14 milyon derfetên kar hatin afirandin û di warê reel de – yanî em enflasyonê jî li ber çavan bigirin – mûçeya asgarî ji sedî 53.6 zêde bû. Yên ku ji vê tevdîra dawîn sûdê werdigirin ne bi tenê ew kes in ku mûçeyên kêm distînin – mûçeyên hejmara wan herî zêde ev in – lê belê herweha ew kes in ku teqawîtbûyî ne, ji bernameyên alîkariya civakî ya ji bo kêmendaman sûdê werdigirin, lewra ew jî li gorî mûçeya asgarî ya fermî alîkariyê distînin. Wê tesîra baş lê kir ku hatina maddî ya kar (karkir û karmend) para xwe ya di Hilberîna Welêt a Brut (HWB) de zêde bike; ev par ji sedî 40’î (2000) gihişte ji sedî 43.6’an (2009).

*Bolsa Família* (“alîkariya malbatan”) bi awayekî etîketî di xizmeta siyaseta civakî de dimîne. Ev bernameya alîkariyê, malbatên ku di bin sînorê diyarkirî yê xizaniyê de ne, alaqedar dike. Li gorî daneyên hukumetê, 12.4 milyon malbat, yanî 40 milyon mirov mehê nêzî 95 realan (hinekî ji 41 euroyan bêhtir) alîkariyê distînin. Dîsa jî, ji ber ku mijar analîzkirina bîlançoya “Lula” ye, hin kes bêhtir dudilî ne. Ji bo ku em awira wan a li mijarê rave bikin, divê em bi reh û rîşên bernameya *Bolsa Família* dakevin.

Hertişt dawiya salên 1990’î dest pê dike. Krîza nirxê pereyên Brezîlyayê û seferberiya civakî di heman demê de dikevin nav hev. Tevdîrên sererastkirina strukturel û bîstîqrarkirina aborî ku Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) li ser wan ferz kirine, kir ku xelkê welêt di xizaniyê de bifetise. Li Amerîkaya Latîn hejmara xizanan di navbera 1980 û 2001’ê de hema hema du caran li berê zêde bû, ji 120 milyonan gihişte 220 milyonan. Gelo ev bextreşiyek bû? Ya rastîn, na: li gorî mikurhatina yek ji aborîzanên Banqeya Cîhanê, konsensusa Washingtonê ya salên 1980 û 1990’î “*rûyê xwe ji hemû hewldanên girêdayî wekheviyê re tirş dikir*” û hewl dida xwe ku “*ji tevahiya tevdîrên armanca wan ji nû ve belavkirina dewlemendiyê be, bi dûr bikeve*. (1)”

Dîsa jî, zirar û ziyanên civakî û bi guman nêzîkbûna saziyên fînansmanê yên navneteweyî di demeke kurt de Banqeya Cîhanî neçar hişt ku “rengekî nû bide” bernameya xwe ya aborî. Bi armanca ku çalakiyên dezgehên fermî ji nû ve meşrû bike, rêzetevdîrin di “Rapora Banqeya Cîhanê ya li ser pêşketina li dunyayê, 2000-2001” de hatin weşandin. Di pêşgotina wê de serokê banqeyê James Wolfensohn, armanceke ku heta hingê kesî behsa wê nekiribû, eşkere kir: “*Hêzdarkirina qebûlkirina reforman û pêvajoya bîstîqrarkirinê*” da ku “*rêyê li ber pirsgirêkên girêdayî dabeşkirina çavkanî û derfetan bigire, lewra ev pirsgirêk carinan dibin sedema xitimîn û xirabtirbûna qeyranên aborî û dikarin hukumetan jî bidin erdê*.” Çawa? Bi afirandina “torên parastina” civakî.

Li Brezîlyayê ji nîsana 2001’ê û pê ve di bin serokdewletiya mîmarê reformên neo-lîberal ên li welêt, Fernando Henrique Cardoso (1995-2002) de, bi pêkanîna bernameyên *Bolsa Escola* (2), di pey re jî *Bolsa Alimentação* (3) û *Auxílio Gás* (4) pêşniyarên Banqeya Cîhanî hatin şîrovekirin. Li gorî wan, van bernameyan rê li ber *Bolsa Família* vekiriye. *Bolsa Família* bi tenê ev însiyatîf ji nû ve kom kirin – û fireh kirin.

Di dema serketina wî ya mezin a dema hilbijartinên serokatiyê yên 2006’an de *Bolsa Família*yê piştgiriya xizanan ji bo Lula da Silva misoger kiribû. Ew ji bo ku kesên gellekî dewlemend razî bike da ku dewreke duyem a desthilatdariyê dengê xwe bi awayekî pirranî bidin Lula da Silva, bi kêr nehatibû. Çawa xwendekarê zanîngehê Armando Boito Jr. jî behsa wê dike, “*hevgirtineke (...) ku bi awayekî têra xwe dijber du aliyên li du seriyên radîkal ên civaka brezîlî tîne cem* hev” mohra xwe li serdema serokatiya wî xist (5). Lê belê, ev hevgirtineke weha ye ku xizmeta herdu aliyên radîkal bi heman awayî nake.

Roja ku erka serokatiya wî dest pê kir, ango 1’ê çileya paşîna 2003’an “Lula” weha peyivî: “*Guhertin, va ye, ev e slogana me*”. Wî siyaseta biîstîqrarkirina makro-ekonomîk a ku serokê beriya wî Cardoso dest pê kiribû, dewam kir. Wî beriya hilbijartinan Cardoso weke “*celladê aboriya brezîlî*” bi nav kiribû. Lula da Silva’yê ku heta kampanyaya hilbijartinên 1989’an soza moratoryûma deynan (bi awayekî fermî bipaşvexistina dayina deynan) dabû, di dayina deynan de jî daxwazên IMF’yê gellekî bihurî. Fonên ji bo dayina deynan li ser wê ferz dikir ku butçe sala 2003’an ji sedî 3.75 li xwe zêde bike (6). Lula da Silva ji sedî 4.25 dan IMF’ê, ev “hewldaneke zêde” ye ku dike 8 milyar real (2.2 milyar euro).

Herçend plana butçeyeke teserrûfê destûrê bide Brezîlyayê ku xwe ji tora IMF’yê rizgar bike jî, wê ew ber bi tora fînansorên neteweyî ve ajot: malbatên dewlemend. Ev malbat qebûl dikin ku deynên dewletê bidin û deynên wê yên hundir jê dikirrin. Vê jî bi yek şertî dikin: deyn wê faîzeke weha were dayin ku dibe yek ji faîzên dunyayê yên herî bilind (di tîrmeha 2010’an de ji sedî 10.25). Bi vî rengî, weke mînak, di 2009’an de ji sedî 5.4’ê HWB’yê ket berîka xwediyên deynên hundir, yanî 13 caran ji wî pereyê ku ji bo bernameyên alîkariya civakî yên hukumeta “Lula” hatibûn veqetandin, bêhtir bû.

Aborîzan Pierre Salama balê dikişîne ser ku “*hejmara kesên ku bêhtirî milyonek dolar pereyên wan ên malî û çalak hene, di navbera 2006 û 2007’an de ji sedî 19.1 zêde bûye*” û bi kurtî weha behsa salên “Lula” dike: “*Hejmara xizanan kêm bû û hatina bêhtirî ji sê paran pareke Brezîliyan jî zêde bû, lê belê beşekî pirr piçûk a xelkê welêt jî dewlemendbûna hê zêdetir kir.*” Li gorî hesaban, ne bi xêra xerckirina pereyan ya li alîkariya civakî, lê bêhtir ji ber “*ji nû ve destpêkirina mezinbûna aborî, ji ber xwezaya vê mezinbûna aboriyê û tesîra wê ya li ser bazara karî (7)*” newekhevî kêm bûn. Ev mezinbûna aboriyê ji alavên civakî yên li ber destê Lula da Silva bêhtir, eleqedarî îhtîrasa ekonomiya brezîlî ye ku maddeyên xam yên welêt pirr zêde dixwe.

Polîtîkayên bacê jî bi heman awayî sûd li berjewendiyên yên herî dewlemend û yên herî xizan nekirin. Di sibata 2009’an de raportorê taybet yê mafê xwarina zad û qût yê Konseya Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî, Olivier de Shutter, weha rave dikir: “*Rêjeya bacê li ser mal û xizmetan gellekî bilind e û ji bo hatina aborî û mîrasê kêm e. Malbatên ku hatina wan a aborî ji du mûçeyên asgarî hindiktir be, ji sedî 46’ê hatina xwe, bi awayekî nerasterast didin bacê.*”

Di gulana 2010’an de berpirsiyarê berê yê kovara (pirr lîberal) *Foreign Policy*, Moisés Naím di *El País* de “Lula” weha nirxand: “*yek ji serokên ku herî zêde bi kêrî bazarê, sektora taybet û pererazandinên biyanî yê Brezîlyayê hatiye*”. Tevî ku bi Naím re bi tevahî ne hemfikir in jî, hin endam an jî sempatîzanên Partiya Karkiran (PT) weha difikirin ku Lula da Silva beşdarî tev li karekî bûye ku teorîsyenê îtalî yê marksîst Antonio Gramsci jê re digot “şoreşa pasîv”,: Stratejiyeke siyasî ye ku tê de bûrjuwazî, dema dibîne ku hegemonyaya wê di xetereyê de ye, ji bo ku ji heq muxalifên xwe derkeve, hewl dide ku gav bi gav û daimî birêvebirên “çînên jêr” întegreyî nava desthilatdariyê bike.

Çiqasî çareseriyên din jî li ber destê wî hebûn, gellek hêmanên di cewherê jiyana siyasî ya brezîlî de bi awayekî ku mirov nikaribe înkar bike, ew ber bi vê rêyê ve ajotin. Dema ew sala 2002’an hat hilbijartin, ji 513 parlemanterên di meclîsê de bi tenê 91 yên PT’yê bûn. Ji bo avakirina hukumetê diviyabû koalîsyoneke ji neh partiyan pêk bihataya û bang li hevgirên kêm bawerî bi wan tê jî bihataya kirin. Rojnamevan Marc Saint-Upéry ji bo van hevgiran dibêje “*ji bo ku awantajan, derfetên kar û çavkaniyên dewletê bi dest bixin, pev diçinin*”. Li gorî hesabekî nîvîkîrî, li Brezîlyayê “*di dewreke desthilatdariyê de herî kêm ji sê paran pareke parlemanteran partiya xwe diguhere. Ji çar paran parek jî ji carekê bêhtir partiya xwe diguhere. (8*)” Halê hazir li 147 parlemanteran û ji 81 senatoran li 21’an doz hatine vekirin û ev doz dewam dikin. Bertîlxwurî salê 40 milyar dolar (31 milyar euro) zirarê li Brezîlyayê dike. Ev pere pênc caran ji butçeya bernameya *Bolsa Família* zêdetir in. Di van şert û mercan de zehmet e ku mirov nehêle bertîlxwurî siyasetê kurmî bike û zirarê dide biryardariya mirovên xwedî karekterên herî xurt jî (9).

### Pêşketina civakî yan jî berxwedana pasîf

Ji bilî vê, ji kampanyaya hilbijartinên serrokdewletiyê ya sala 2002’an û vir ve, Lula da Silva berê wî ketibû ber bi (siyaseta) navendê ve. Refên PT’yê ku di eslê xwe de ne cîhê xwediyê şîrketan, xwediyê erdên mezin û banqevanan bû, xwe hingê li patronekî milyoner (û mîsyoner) José Alencar girt û Alencar bû namzetê wê yê cîgirê serokî. Şewirmendê ragihandinê yê “Lula” yê wê demê, Duda Mendonça îddîa dike ku Lula da Silva di vê qonaxa kariyerê xwe de “*ji bo serkevtina di hilbijartinên serokatiyê de amade ye ku bi herkesî re hevkariyê bike* (10).”

Ji bo Brezîliyan, “serdema Lula” dîsa jî wê weke yek ji serdemên herî erênî yên dîroka nêz bimîne. Delîla vê yekê: pirraniya Brezîliyan dixwazin ku piştî “Lula” jî “serdema wî” dewam bike. Gelo ev mimkun e?

* Profesora Navenda Lêkolînên Amerîka Latîn (Center for Latin American Studies, CLAS) a zanîngeha Rutgersê li New Brunswick, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê.

1 Nancy Birdsall, Augusto de la Torre, Felipe Valencia Caicedo, “The Washington Consensus: Assessing a Demaged Brand“ (Konsensusa Washingtonê: Nirxandina Working Group 5316, The World Bank Office of the Chief Economist, Latin America and the Caribbean Region and Center for Global Development (Koma Xebatê ya Lêkolînên Siyasetê, hejmara 5316’an, Buroya Bankeya Cîhanî ya aborîzanê sereke, Amerîkaya Latîn û herêma Karîbîk û Navenda Bipêşketina Global), gulana 2010’an, rûpel 29-30.

2 “Alîkariya ji bo dibistanê”: Misoger dike ku malbatên xizan alîkariyeke maddî bistînin, bi şertê ku zarokên wan ên di temenê dibistanê de (7 salî heta 14 salî) biçin dersên xwe.

3 “Alîkariya zad û qût”: Vê alîkariyê didin malbatên ku zarokên wan hê negihiştine biçin dibistanê û jinên ducanî.

4 “Alîkariya ji bo gazê”: Ev bernameya wezareta enerjî û kanan, serê malbata xizan 15 realan (6.5 euro) dide da ku ev malbat heqê mesrefên xwe yên enerjiyê bidin. 2002’an, 5.7 milyon malbatan sûd ji vê bernameyê werdigirt.

5 “As relações de classe na nova fase do neoliberalismo no Brasil”, Sujetos sociales y nuevas formas de protesta en la historia reciente de América Latina (di bin birêvebiriya Gerardo Caetano), Consejo latinoamericano de ciensas sociales (CLACSO), Buenos Aires, 2006.

6 Peyva fransî li vir “excédent primaire” e. Tevahiya hatin û mesrefên dewleteke yên fermî, bi vê peyvê tên binavkirin. Eger ev hesab pozîtîf be, dewlet dikare deynên xwe bide, eger negatîf be, neçar e ku deyn bike.

7 Pierre Salama, “Lula a-t-il vraiment fait reculer la pauvreté? (Gelo Lula bi rastî xizanî kêm kir ?)”, *Alternatives Internationales*, hejmara taybetî, hejmar 7, Parîs, çileya pêşîna 2009’an.

8 Marc Saint Upéry, *Le rêve de Bolivar* (Xewna Bolîvarê), La Découverte, Parîs, 2007.

9 Dema ku skandala mensalão derket holê, “Lula” di 2005’an de cezayê wê da. Mensalão mehane ne ku dane parlemanterên ku ji bernameyên xwe yên siyasî bêhtir, bi derdê parastina kîs û berîkên xwe ve daketibûn.

10 Richard Bourne, *Lula of Brazil: The Story so Far* (Lulayê Brezîlyayê: çîroka heta vira), Zed Books, London, 2008.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

### DI NAVBERA HEVGIRIYA STRATEJÎK Û DÎPLOMASIYA HESSAS DE

# Londra têkiliyên xwe yên bi Washingtonê re diguherîne

JEAN-CLAUDE SERGEANT *



ISMET POLATLI

**Her çend selefê wî ji ber dîplomasiyê li ber Amerîkayê çok danîbû erdê jî, serokwezîrê nû yê Brîtanyayê Cameron David soza têkiliyên hêzdar da Amerîkayê lê belê, herweha lê zêde kir ku ev yek wan nake xulamê Amerîkayê. Ev di demeke weha de îddîayeke hesas e lê belê rastiyek heye ku havelbendiya dîrokî ya van her du welatan ku ji betonê hatiye çêkirin, hildiweşe.**

Dibêjin, Winston Churchill cara pêşî peyva “*têkiliya taybet*” di axaftina xwe ya 5'ê adara 1946'an de li Fultonê (Missouri) bi kar aniye. Di heman axaftina xwe de wî cara pêşîn peyva “perdeya hesinî” ku dê Ewropa bikiraya du parçe jî bi kar anî. Beriya wî hinên din jî pesnê vê têkiliya dualî a taybet dabû ku di du şerrên cîhanê de zexm bû. Piştî ku ji sefereke li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê vegeriya, wezîrê karê derve yê wê demê Arthur Balfour di 1917'an de weha peyivî: “*Em herdu gel ji heman kokê ne* […] *Ma em heta hetayê bi hev ve girêdayî nînin?*” Hema hema sedsalek di ser re bihurî Anthony Blair êdî civaka genetîk dernedixist pêş û 7'ê çileyê paşîna 2003'an li pêşberî sefîrên brîtanî yên li Londonê civiyayî ev îddîa dikir: “*Em hevgirên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ne, ne ji ber ku ew bi hêz in, belê ji ber ku em xwediyê heman nirxan in*”.

Bi awayekî ayînane êdî bûbû adet û her serokwezîrê nû, ji bilî Edward Heath'ê muhafizekar (di navbera 1970 û 1974'an de serokwezîr bû), ji nû ve îddîa dikir ku “têkiliya taybet” bingeha siyaseta derve û parastina neteweyî ye; lê digel vê jî, “têkiliya taybet” statuya xwe ya efsaneya xweş a di nostaljiyê de dakirî wenda kiriye. Girîntirîn karên stratejîk ên nû ku Barack Obama'yê serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê danîne ber xwe û daxwaza serokwezîrê brîtanî David Cameron ya xwe xilaskirina ji peywendiya bandorker û dualî ku reng dida têkiliya di navbera Blair û George W. Bush de, ferz dike ku şert û mercên “têkiliya taybet” ji nû ve werin nirxandin.

“Têkiliya taybet” ku bi awayekî taybetîtir peywendiyên li ser mijarên parastin û ewlekariyê yên di navbera du dewletan de bi nav dike, nemaze di qada îstîxbaratê de; di çarçoveyeke firehtir de dikare carinan ji bo qadên aborî û çandî jî were bikaranîn. Pererazandinên yekser ên li derveyî welêt (Foreign Direct Investement -FDI) ên amerîkî bi awayekî adetî Brîtanyayê tercîh dikin. Mîqdara van pererazandinan di 2007'an de gihişte 400 milyar dolaran. Di 2008'an de ji 1 744 projeyên FDI yên li Brîtanyayê, 621 ji Amerîkayê bûn1. Mîqdara pererazandinên brîtanî yên yekser li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî hema hema biqasî vê ye (1). Bazara amerîkî ji bo îxracatên brîtanî bazara herî mezin e ku nirxê wê 35 milyar sterlîn e û divê mirov hê veguhestina xizmetên bi heman nirxî ber bi Amerîkayê ve li vê mîqdarê zêde bike. Gordon Brown'ê ku hingê wezîrê fînans û maliyeyê yê bû, pişta xwe da wekheviya di navbera taybetmendiyên aborî yên amerîkî û brîtanî, û ji binî ve nehişt ku Brîtanya derbasî sîstema euroyan bibe.

**“Têkiliya taybet” ku bi awayekî taybetîtir peywendiyên li ser mijarên parastin û ewlekariyê yên di navbera du dewletan de bi nav dike, nemaze di qada îstîxbaratê de; di çarçoveyeke firehtir de dikare carinan ji bo qadên aborî û çandî jî were bikaranîn.**

## Girtina rûpela xulamtiyê

Brîtanya hevgira Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ya herî nêzîk e û pê dizane ku di têkiliya herdu aliyan de statuya endaman ne wekhev e – çawa ku peyva “*junior partner*” (hevparê piçûk/ciwan)” îşaret bi vê yekê dike. Brîtanya li welatê hevgirê xwe yê piştatlantîkê xwedan heyeteke dîplomatîk ya 417 kesî ye ku 248 ji van kesan li Washingtonê (2) ne û bi tenê Hindistan xwediyê delegasyoneke dîplomatîk a mezintir e (505 kes). Bi awayekî xwezayî, sedema vê temsîla xurt a dîplomatîk ew e ku girîngiyeke Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di nava fikra Brîtanyayê ya stratejîk de heye, lê herweha bi himbiziya navendên biryardanê yên duyem, labaratuwarên fikr û hizirînê (think tank) û komên ku zextê li siyasetê dikin (lobî), yên ku brîtanî hewl didin berjewendiyên xwe bi wan bidin qebûlkirin jî hene di navê de. Brîtanî xwe weha nîşan didin ku mirov dibêje qey dikarin li kes û saziyên amerîkî yên biryardayinê bandorê bikin. Rayedarên brîtanî tam jî bi vê yekê girêdana xwe bi peywendiya asîmetrîk a ku wan bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve girêdide, rewa dikin. Ji bo wan, di rêya rewakirina statuya xwe ya hêza mezin de, beyî vê têkiliyê nabe.

Ya rastî, memûrên wezareta parastinê û artêşa brîtanî, bi awayekî li gorî rêûresmê ji xwe di navendên biryardanê yên Artêşa amerîkî de cih digirin. Cara pêşî di 2005'an de nûnerên wezareta parastinê di amadekirina *Quadrennial Defense Review* (Lêkolîneke serê çar salan e ku Wezareta Parastinê dide amadekirin, tê de armancên stratejîk û xetereyên mûhtemel tên analîzkirin) a amerîkî de cih girtin. Di heman demê de hinên din li navenda fermandariya hêzên deryayî yên amerîkî ya li Norfolkê (Virginia) hatin bicihkirin. Mezinahiya hêza eskerî ya brîtanî li Afganistanê – nêzî 10 000 eskeran – weke alîkarê fermandarê

Hêza Navneteweyî ya Piştgiriya Ewlekariyê (ISAF), destnîşankirina generalekî brîtanî hêsan kir. Hevkariya operasyonel eşkere li holê be jî, em dîsa jî dikarin li kapasîteya Brîtaniyan bipirsin ka çiqasî dikarin bandorê li tercîhên Washingtonê yên di mijara siyaseta navneteweyî de bikin. Blair zext li Bush kir da ku beriya dest bi mudaxeleya eskerî ya Iraqê bike, hewl bide desteka Neteweyên Yekbûyî bistîne: bi ser neket. Hewldanên wî yên ji bo ku bike ku hempîşeyê wî yê amerîkî çareserkirina pirsgirêka Filistînê hêsan bike yan jî peymana Kyotoyê qebûl bike jî, weha bê encam man.

Piştî ku Obama bû serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, vê yekê destûr dida şîroveya ji nû ve dengekirina peywendiya anglo-

**Herçend Brîtanya xwe nede ber ku ji bilî hevgirtina bi Amerîkiyan re di operasyoneke eskerî ya li derveyî welêt de cih bigire jî, ji aliyê xwe ve pêdiviya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pê heye ku Brîtanî bikevin nav kar da ku rewşa nebûna rewabûna navneteweyî telafî bikin. Weke mînak di dema mudaxeleya leşkerî ya li dijî Iraqê de rewş ev bû.**

amerîkî; bi heman rengî me ê rûpelê vasalbûna (girêdayîbûn) di salên Blair de ya ku bi dilê xwe hatiye pejirandin biqulibandaya û li pey xwe bihiştaya. Di rastiyê de Brîtanî pê hisiyan ku serokê nû yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê girîngiyeke taybet nade vê têkiliya qaşo giring. Obama îddîa kir ku ew "serokekî pasîfîst" e. Ya ku divê were fahmkirin: "Serokê ku Asyaya-Pasîfîk weke karûbarê xwe yê sereke diyar kiriye". Piştî ku ji xetereya sovyetan xilas bû, Ewropa êdî ne mijaneya giring ya fikr û hizra stratejîk a amerîkiyan e. Amerîkî bi daxwaza Yekîtiya Ewropayê ya ku dixwaze giraniya xwe di mijara siyaseta derve û parastinê de deyne, razî ne. Bêguman rast e, 29'ê tîrmeha 2009'an bi munasebeta hevdîtina xwe ya bi wezîrê karên derve yê brîtanî David Miliband re, wezîra karên derve ya Amerîkayê Hillary Clintonê pesnê wateya gerdûnî ya "têkiliya taybet" da, ku li gorî wê hêmanekî hêzdarkirina aştiyê, pêşketin û dewlemendiyê ye û bi gotinên wê "*ne bi tenê ji bo her du gelên me, lê belê ji bo tevahiya cîhanê*". Bêguman divê em di vê axaftinê de îfadekirina nazikiya navneteweyî a dîplomasiya hişk ku di navbera herdu welatan de ye bibînin. Wezîra karên derve 15 rojan beriya vê daxuyaniyê, li pêşiya *Counsil for Foreign Relations*, dema ku behsa hevgirên dîrokî yên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kir, carekê bi tenê be jî navê Brîtanyayê neanî. Li Londonê ev yek derkete pêş. Hin aliyên anekdotîk, lê belê dîsa jî sembolîk, ev normalbûna tekiliya bi Brîtaniyan re piştrast kir: paşvedane bustê Churchill ku di dema Bush de buroya oval (a li Qesra Spî) dixemiland û bi ser de jî Obama lezand ji bo ku vî bustî bişîne sefareta brîtanî; hevdîtina lezgîn – panzdeh deqîqe – a ku di dema Civîna Giştî a Neteweyên Yekbûyî de îlona 2009'an serokê Amerîkayê qebûl kir bi Brown re bike. Êdî piştrast bûye ku koma nû ya li Washingtonê desthilatdar, têkiliya dualî ya bi Brîtaniyan re weke yek ji têkiliyên din ên dualî dibînin. Ev têkiliya dualî, weke ku birêvebirên bîranîna Şerrê Cîhanê yê Duyem bandor li wan kiriye, hestiyar dikir, koma nû ya li Washingtonê desthilatdar hestiyar nake.

Wekî din, ji ber aloziyên ne mumkin e mirov xwe ji wan vede, bi awayekî bi rêk û pêk ev têkilî hessas bû. Weke mînak, ji ber sedema tenduristiya xirab, di tebaxa 2009'an de berdana Lîbyayiyê ku ji ber êrîşa Lockerbie (1988) hukum xwaribû: vê yekê tesîra xwe hem li birêvebirî û hem jî li raya giştî ya amerîkî kir û şopên xwe jî hiştin. Herçiqasî Brown hewl da bide qebûlkirin ku biryar bi tenê erka wezareta Skoçyayê ya adaletê bû, dîsa jî hin şîrovekaran behsa wê kir ku îhtîmala peymanên kirrîna petrola Lîbyayê di azadkirina El-Megrahî de bandora xwe kiribe. El-Megrahî li Trablûsê weke kesekî muzafer hat pêşwazîkirin. Ev yek li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bû sedema êş û azareke derûnî. Edîtorekî rojnameya *Daily Telegraph*ê bûyer weha bi kurtî anî zimên: "*Di mijara îstîxbarata di navbera du dewletên serbixwe de têkiliya me ya taybet a bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re di asteke weha de ye ku mînaka wê nîne. Bi azadkirina El-Megrahî û ji ber ku hukumetê xwe neda ber astengkirina azadkirina wî, ev têkilî îro hat lawaz û hesaskirin* (3)."

Çileya pêşîna 2009'an li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Nîjeryayiyekî ciwan hat girtin ku niyeta wî hebû ku balafireke sefera Detroitê li hewayê biteqîne,. Li gorî îddîayên Amerîkiyan ev ciwan dema ku li Londonê dima, di navbera 2005 û 2008'an de fikrên wî hatine guhertin. Vê yekê kir ku gumanên Amerîkiyan ên der barê qelsiya kontrola Brîtaniyan li ser şaneyên cîhadîst ên li Brîtanyayê çalak de, zêdetir bibin. Rayedarekî payebilind yê wezareta karên derve ya amerîkî sirr û raza xwe eşkere dikir: "*Asta çalakbûna El-Qaîdeyê li Brîtanyayê vediguhere pirsgirêkeke ciddî* (4)".

Ji îmzekirina peymana ku destûrê dide kontrolkirina ragihandina elektromanyetîk a bi navê SIGINT (*Signals Intelligence*) û vir ve (1947) parvekirina îstîxbaratê di navenda vê "têkiliya taybet" de ye. Awûstûralya, Kanada û Zellandaya Nû jî peymana kontrolkirina ragihandina elektromanyetîk a li jor behskirî, îmze kirine. Brîtanya di çarçoveya vê peymanê de ji navenda xwe ya guhdarîkirinê ya li Qibrisê û bi Fermandariya Ragihandina Giştî (*General Communications Headquarters*, GCHQ) li Chetenhamê, herêma ewropî û Rojhilata Navîn kontrol dike (5). Li Afganistanê û herêmên, Brîtanî ji ber ku berê li wan hêza kolonyal bûn ji Amerîkiyan çêtir bi cih bûne, Brîtanya bi awayekî kêrhatî tevlî komkirin û nirxandina îstîxbarata insanî dibe. Mirov herweha qebûl dikin ku rêxistina îstîxbaratê ya brîtanî, kiriye ku Lîbya dev ji çêkirina sîlehên tinekirina girseyan berde. Bi tenê ev aliyê meselê dimîne, ajansên îstîxbarata brîtanî bi awayekî ku têkiliyên wan baş bin, bi hempîşeyên xwe yên amerîkî re kar bikin jî "*li ser mijara rêbazên ku hempîşeyên wan bi kar tînin, ew xeman dixwin* (6)."

Stûna din a têkiliya taybet bi perdeya parastinê pêk tê, ku ew bi xwe jî bi du hêmanên ku wê pêk tînin, tê danasîn; yek jê ya pîşesaziyê ye û ya din jî operasyonel e. Bazara pîşesaziya parastinê ya brîtanî bêguman girêdayî prensîpên hêzên di kontrola rayedarên eskerî û siyasî de ye. Belgeya siyasî ya 2003'an (7) bi awayekî zelal qebûl dike ku Brîtanya bi tenê li aliyê Dewletên Yebûyî yên Amerîkayê dê karibe bikeve operasyoneke mezin a eskerî. Ev prensîp hem di qada operasyonel û hem jî di qabîliyeteke bêkêmasî ya danûstanin û ragihandinê ya di navbeta ekîpmanan de, koordînasyoneke bêqisûr dihewîne. Bi gotineke din, li gorî mentiqê, divê hêzên brîtanî bi alavên amerîkî hatibin xurtkirin. Belê, dema ku mirov giraniya pîşesaziya parastinê li Brîtanya li ber çavan bigire, bêguman rewş ne ev e. Di 2005'an de Wezareta Parastinê bi tenê ji sedî 32'ê mesrefên xwe yên eskerî li ekîpman û alavên ji derve dan: Ji sedî 5 ji bo kirrîna alavên di dikanan de (ku her kes dikare bikirre), ji sedî 27 jî ji bo alavên li Brîtanyayê ji aliyê şîrketên biyanî ve tên hilberîn (8). Pîşesazên sereke yên amerîkî şaxên şîrketên xwe li ser erda Brîtanyayê jî ava kirin: Boeing, Raytheon, General Dynamics, Northrop Grumman û Lockheed Martin. Ev şîrketa dawî bi hevparî, ji bo wezareta parastinê *Atomic Weapons Establishment* – AWE (Saziya Sîlehên Atomî) bi rê ve dibe. Serikên nukleer ên fuzeyên D5 li vir tên hilberîn. Ev serikên nukleer ji aliyê Lockheed Martin ve li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî tên hilberîn. Serikên bi hevkariya vê şîrketê li Brîtanyayê tên hilberîn di çar keştiyên binê deryayê yên fuzeyên nukleer (SLBM) de ku beşek ji çavtirsandîkirina stratejîk a brîtanî ye, hatine bicihkirin.

Di mijara çavtirsandîkirinê de girêdana Brîtanyayê ya bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve tê zanîn. Peymana parastina dualî (9) ya ku 1958'an hatiye îmzekirin, dawî li ambargoya agahdariyên li ser enerjiya nukleer a ji bo bikaranîna eskerî anî, ku qanûna McMahon ferz dikir (1946); rê li ber dîzaynkirin, bipêşxistin û hilberîna serikên nukleer ên brîtanî vekir ku bi fuzeyên keştiyên binê deryayê yên bi navê *Polaris* û *Trident* ve hatine kirin. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê sala 1982'an destûra firotina fuzeyên Trident D5 dabû. Di encamê de ji hîbeyeke hevpar a ji bo her du welatan bi rengê mafê kişandina krêdiyeke taybet (special drawing rights - SDR) ku dişibe "leasing"ê, 58 fuzeyên Trident D5 ê ku Londonê ji bo dana wan hevdîtin kirin, hatin kirîn. Kontrol û lênerîna fuzeyan li baregeha Kings Bay a li Gurcistanê pêk tê û keştiyên brîtanî yên jêrderyayî jî li herêma ceribandinê ya hêzên amerîkî yên deryayî ku li peravên Florîdayê ye, di deryayê de ji bo ceribandinê fuzeyan diavêje.

**Liam Fox jî gumanbiriya xwe ya der barê îhtîmala Afganistanê veguherînin welatekî demokratîk de nîşan da. Ev armanc ji xwe ji armanca destpêkê ya operasyona leşkerî cuda ye. Armanca operasyonê ya destpêkê ew bû ku dawiyê li desthilatdariya Talîbanan bîne û stargehên afgan ên El-Qaîdeyê tune bike.**

Hêza okyanûsê ya nukleer, bi awayekî fermî weke potansiyela parastinê ya Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê (NATO) hatiye destnîşankirin. Rayedarên brîtanî vê hêzê weke hîmê parastineke xweser dibînin. Di pratîkê de sîstema avêtina fuzeyan û tesbîtkirina hedefan weke ya SLBM'yên amerîkî ye. Her çend bawerî pê neyê jî ev hîpotez heye: "*Eger serokwezîrekî brîtanî fermana avêtina fuzeyeke Trident bide, ji bo astengkirina wê tiştek ji destê amerîkiyan nayê*". Qet nebe ev fikra du pisporan e ku alîgirê bêçekkirina nukleer in (10).

Herçend herdu welat di mijara alavên eskerî de bi awayekî çalak hevkariyê dikin jî – bîst û du projeyên hevpar ên dualî hene û şîrketa brîtanî BAE Systems jî heştemîn şîrket e ku weke firoşkara sîlehan li Pentagonê hatiye qebûlkirin – ev rewş dikare bibe sedema şikestina hêviyan û hêrsa pê ve girêdayî. Brîtanya hê jî li benda bernameya çavkanî (di warê nivîsbariya kompîturan de) ye ku dê destûrê bide ku balafirên F-35 (*Joint Srike Fighter*) li gorî pêdiviyên Royal Air Force (Hêza Brîtanyayê ya Hewayî) û Royal Navy (Hêza Brîtanyayê ya Deryayî) werin eyarkirin. Wezareta Brîtanyayê ya Parastinê bûbû bikirê balafirên F-35. Transfereke bi vî rengî hê jî divê ji aliyê Senatoya Amerîkayê ve were erêkirin – fikara ji ketina dest welatekî dijmin a teknolojiyên hesas. Ev yek xwe disipêre peymana hevkariya di mijara bazirganiya di qada parastinê de (*US-UK Defense Trade Co-operation Treaty*) ku bi şertê standina lîsansekê destûrê dide îxracatan.

Herçend Brîtanya xwe nede ber ku ji bilî hevgirtina bi Amerîkiyan re di operasyoneke eskerî ya li derveyî welêt de cih bigire jî, ji aliyê xwe ve pêdiviya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pê heye ku Brîtanî bikevin nav kar da ku rewşa nebûna rewabûna navneteweyî telafî bikin. Weke mînak di dema mudaxeleya leşkerî ya li dijî Iraqê de rewş ev bû. Li Afganistana ku Washington koalîsyona ji nêzî çil dewletan pêk tê bi rê ve dibe, hêza leşkerî ya brîtanî ya ku para bêhtir li herêma Helmandê bi cih bûye, bi zehmetiyan re rûbirû ma. Ev zehmetî gihiştin wê radeyê ku brîtanî neçar man ji bo ku bajarê Musa Qala di kontrola xwe de bigirin, alîkarî ji leşkerên amerîkî xwastin û paşê jî cihê xwe bi tevahî ji wan re hiştin. Destpêka hezîrana 2010'an, herêm kete bin fermandariya Amerîkiyan. Jêhatîbûna Brîtaniyan ya di birêvebirina pirsgirêkên di qada sivîl de gellekî navdar e, lê belê weha xuya ye ku êdî guman ji vê yekê jî tên kirin.

Li gorî kovara heftane *The Economist*ê "*zehmet e ku mirov negihîje wê encamê ku ev şerr* [ê ku li Afganistanê tê meşandin] *di cewherê xwe de karekî amerîkî ye ku Brîtanî tê de bi tenê bi roleke piçûk radibin* (11)." Cameron û Obama di dema civîna bilind a li Torontoyê de biryara vekişîna eskerên brîtanî ji devera Sangin a li bakurê herêma Helmandê da, paşê li şûna eskerên brîtanî 20.000 eskerên amerîkî hatin bicihkirin. Ev herdu bûyer hukmê kovara *The Economist*ê piştrast dikin.

Li herdu aliyên Atlantîkê, weha xuya ye ku alî bêhtir ji xwe dipirsin ka dê çawa derfetan peyda bikin da ku xwe ji rewşa Afganistanê ya pirsgirêkî rizgar bikin û bi lêgerîna serkevtineke leşkerî ku em pê dizanin ku xapînok e, serê xwe naêşînin. Obama, dawiya 2009'an, da zanîn ku vekişîna leşkerên amerîkî dikare ji tîrmeha 2011'an û pê ve dest pê bike. Obama bi vî rengî hevgirê xwe yê brîtanî dixe rewşeke xirab, lewra Brîtanya dixwaze teqwîmekê ji bo vekişînê diyar bike. Xeta fermî ya Brîtanyayê weha bû: di misogerkirina ewlekariya xelkê welêt de jêhatîbûna hêzên afgan yên neteweyî, şertê vekişîna hêzên brîtanî ye.

**Douglas Hurd gotiye "xwe li ser pêyan girtin û bipêşketina hevkariya [bi amerîkiyan re] girêdayî wê ye ka weke hevgirê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Brîtanya çiqasî bi kêr tê. Li ser mijarê em xwe dixapînin. Sedema wê jî kubariya Amerîkiyan e. Amerîkî weha nîşan didin ku mirov bibêje qey girîngiyeke mezin didin vê hevkariyê, digel ku tiştekî bi vî rengî jî nîne."**

Piştî eşkerekirina mirina eskerê 300'î yê brîtanî li Afganistanê, serokwezîrê nû Cameron 21'ê hezîrana 2010'an li pêşberî Meclîsa Jêr a Parlamentoya Brîtanyayê ev helwest dubare anî zimen. Şîrovekaran xwe jê veneda; û bîlançoya mudaxeleya Iraqê ku bû sedema mirina 179 leşkerên brîtanî û bîlançoya li Afganistanê ji bo armancên ku her diçe kêmtir bawerî bi wan tê, her roj girantir dibe, li ber hev girtin. Dema civîna bilind a G-8'an ku li Torontoyê pêk hat, li ser pirsa rojnamevanekî Sky Newsê, Cameron - beriya ku bi Obama re rûne - bi awayekî zelal got ku ew li ser pirsên der barê teqwîma vekişînê de zêde bi israr nîne, lê belê ew hêvî dike ku beşa mezin a eskerên brîtanî ji niha heta 2015'an vekişiyabin, ango beriya hilbijartinên Brîtanyayê yên pêş.

Koma nû ya ku li Brîtanyayê desthilatdar e û planeke gellekî hişk a tevdîrên malî nuh li ser welêt ferz kiriye, pê dizane ku raya giştî dê demeke dirêj qebûl neke ku asta kuştî û birîndaran li Afganistanê ji ya hêzên amerîkî bibihure. Liam Fox jî gumanbiriya xwe ya der barê îhtîmala Afganistanê veguherînin welatekî demokratîk de nîşan da. Ev armanc ji xwe ji armanca destpêkê ya operasyona leşkerî cuda ye. Armanca operasyonê ya destpêkê ew bû ku dawiyê li desthilatdariya Talîbanan bîne û stargehên afgan ên El-Qaîdeyê tine bike. Di hevdîtinekê de wezîrê parastinê ji *Timesê* re got: "*Em ne li Afganistanê ne da ku destekê bidin siyaseteke perwerdekar a dewleteke ji serdema navîn mayî û bikin ku ji hev de bikeve. Em li wir in ji bo ku em xelkê Brîtanyayê û berjewendiyên xwe li seranserê dunyayê biparêzin* (12)."

Helwêsta hukumeta nû ya li dijî Yekîtiya Ewropayê baş tê zanîn; William Hague weke wezîrê karê derve û Fox weke wezîrê parastinê destekên herî zexm ên ji bo vê helwêstê ne. Ev kom herweha ne di wê rewşê de ye ku pozîsyona xwe ya hevgirê lipêşgirtî di çavên amerîkiyan de xurt bike. Li gorî rayedarekî berê yê wezareta parastinê li Washingtonê, Eric Edelman, nemana nifşê alîgirê konsepta "têkiliya taybet" a ku ji aliyê Churchil ve hatî destnîşankirin, kir ku elîta brîtanî ya nû berê awirên xwe ji Ewropayê bide alî (13). Di mijara parastin û ewlekariyê de bi vî rengî dîtina tiştan xweşbîn xuya dike, weke sedem jî mirov dikare qet nebe van mînakan bide: Brîtanya di betalkirina peymana Brukselê (1948) de bi roleke çalak rabû, vê peymanê Yekîtiya Rojavayê Ewropayê damezirand; hukumeta Cameron difikire ku Brîtanyayê ji Ajansa Ewropî ya Parastinê (EDA) vekişîne.

Li gorî birêvebirê navenda hizîrîna stratejîk RUSI (*Royal United Services Institute*), Michael Clarke, awayê herî baş yê xizmeta berjewendiyên Brîtanyayê li cem birêvebirên amerîkî

û nexasim li cem yên li Kongreyê û di ajansên hukumetê de, ji bo rayedarên brîtanî ew e ku di serî de mijarên parastin û ewlekariyê, weke katalîzatorên guherîna li Ewropayê werin dîtin (14). Daxwaza serokê Amerîkayê ew e ku Ewropa amade be ku bi yekdengî bersivê bide banga wî ya piştgiriyê ku wî bi rêya navbênkarên NATO'yê ragihandiye, dîsa jî biryardar be ku berpirsiyariya qadên erkên xwe (parastin û ewlekarî) bigire ser milên xwe.

Cameron di Îlona 2006'an de da zanîn ku têkiliyên di navbera hukumeteke muhafezekar a siberojê û hevgirê wê yê amerîkî de "zexm" be û ne "*kolewarî*" (*slavish*) be. Bi vî rengî, berî desthilatdar, Cameron karîbû xwe ji etîketa modela bihevveheliyanê (fuzyonel) rizgar bike ku xisleta têkiliya di navbera Blair û Bush de bû. Brown jî navber xiste nav xwe birêvebirên amerîkî, bêyî bi serokwezîrê kete şûna wî re karibe şêwazekî têkiliyan bibîne ku ji rêûresmên dîplomatîk û bi wê de biçe. Çavdêran bal kişand ser ku Cameron beriya hilbijartinên gulana 2010'an ji bo ku piştgiriya serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bixwaze, neçû Washingtonê. Beriya hilbijartinên 1997'an Blair xwe jê nehiştibû û piştgiriya serokê amerîkî li Washingtonê standibû. Dibe ku bihataya bîra mirovên li derdora Obama ku di hilbijartinên serokatiyê yên 2008'an de muhafizekarên brîtanî bi awayekî eşkere destek dan namzetê komarxwaz. Ev yek bi awayekî qismî be jî nîşan dide bê tengezariya di navbera herdu welatan de ya dema felaketa li kendava Meksîkayê, ji ku dihat.

Felaketa qîr-reş ya piştî teqîna platformeke derxistina petrolê ya ji aliyê şîrketa brîtanî BP'yê ve dihat xebitandin, ji aliyê Obama ve weke *11'ê îlona ekolojîk* hat bi nav kirin. Raya giştî ya amerîkî zext li serokê xwe kir da ku gavan bavêje, wî jî bi hêrs berê xwe da şîrketa ku birêvebirê wê yê giştî ji aliyê komîsyoneke Kongreya Amerîkî ve hatibû vexwendin da ku rewşê rave bike. Obama û hevkarên wî bi awayekî bi rêk û pêk navê "British Petroleum" bi kar anî, tevî ku şîrketê bi awayekî fermî ji sala 2000'î ve dev ji vî navî berdaye û navê "BP" bi kar tîne. Vê yekê dilê hin Brîtaniyan hişt: gelo ew îddîa dikin ku peywendiya neteweya şîrketê û bêberpirsiyariya bikaranîna devera rezerva petrolê bi hev re heye? Gelo ew ketin ber pêla reflekseke anglofob (tirsa ji inglîzan) û bi ser de jî weke mînak ev refleks rastiya ku ji sedî 40'ê sermayeya BP'yê di destê fonên teqawîtbûnê yê amerîkî de bûn, li ber çavan nagire?

Şaredarê Londonê Boris Johnson'ê li New Yorkê ji dayik bûye, 10'ê hezîranê ji BBC'yê re weha axivî: "*Li gorî min retorîka dij-brîtanî a ku xuya ye ku Amerîka daye ber xwe, mirov dixe nava fikaran. Eger şîrketeke mezin a brîtanî bi rexneyên giran û niyetxirab ên çapemeniya navneteweyî re timî rûbirû dibe, ez bawer dikim ev yek ji bo welatê me vediguhere pirsgirêkeke rastîn.*" Bi awayekî berbiçavtir, derdorên bazirganiyê û çapemenî ditirsiyan ku nirxên hîsseyên BP'yê di borsayê de kêm bibin– di nava 12 hefteyan de nîvî bi nîvî kêm bû – û herweha, paşê ev kêmbûna nirxî tesîrê li asta mûçeyê teqawîtbûna temamker bike ku ji aliyê fonên teqawîtbûnê yên brîtanî ve tên dayîn (ev kesên teqawîtbûyî hemû li Borsaya Londonê xwediyê hîsseyên nirxên pêşî ne). Sernûçeyeke *The Daily Telegraph*ê rewş bi kurtî îfade dikir: "*Obama bi qirika mirovên teqawît ên brîtanî girt*" (10'ê hezîrana 2010'an). Dawiya hefteya beriya civîna G-20'an, ji bo nermkirina peywendiyan, pêwîst bû ku di navbera serokê amerîkî û Cameron de hevdîtineke bi riya telefonê pêk were.

Bi hevdîtina civîna bilind a li Torontoyê, der barê siyaseta ekonomîk de cudatiyên din jî derketin holê. Amerîkiyan daxwaza lihevkirinekê kir ku bandorên siyaseta kêmkirina mesrefên budceyê, ku Elmanya û Brîtanya bi rê ve dibin, bi sînor bike. Wezîrê nû yê maliyê yê Brîtanyayê, George Osborne, 22'ê hezîranê "butçeya xwe ya lezgîn" kîte bi kîte bi Meclîsa jêr ve da zanîn. Ji bo Amerîkiyan, ya herî girîng ew bû ku çend mehan beriya hilbijartinên di nîvê dewra desthilatdariyê de, destpêka başbûna ekonomiyê nexin xetereyê. Ya li pêş ji bo Ewropiyan û nexasim ji bo Brîtaniyan ew bû ku hevnegirtina butceyên xwe û asta deynên xwe yên neteweyî kêm bikin. Her du alî jî ji ya xwe nehatin xwarê. Dema vegeriya meclîsê, vê yekê pêşî li Cameron negirt ku piştgiriya G-20'an bistîne da ku bernameya xwe ya daneheva maliyeya dewletê dewam bike.

Bernameyeke bi vî rengî wê bibe sedem ku butceya ji wezaretên cihê re veqetandî, nêzî ji sedî 20'an kêm bibe. Bê guman wezareta parastinê wê hindiktir bikeve ber vê bernameyê, lê belê dîsa jî ev qutkirina butceyê çiqasî hindik be jî, ji ber devjêberdana prensîba "*mudaxalekariya lîberal*" ku dilê Blair gellekî pê ve bû, dê duqat bibe. Ev jî dema ku Washingtonê taybetiya têkiliya bi Brîtanyayê re nirxand, bêguman dê tesîrê bike. Çawa ku wezîrê karên derve yê hukumeta John Major, Douglas Hurd gotiye "*xwe li ser pêyan girtin û bipêşketina hevkariya* [bi amerîkiyan re] *girêdayî wê ye ka weke hevgirê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Brîtanya çiqasî bi kêr tê. Li ser mijarên em xwe dixapînin. Sedema wê jî kubariya Amerîkiyan e. Amerîkî weha nîşan didin ku mirov bibêje qey girîngiyeke mezin didin vê hevkariyê, digel ku tiştekî bi vî rengî jî nîne.* (15)"

* Profesorê teqawîtbûyî yê zanîngeha Sorbonne Nouvelle (Paris 3)

1 Rapora ku pêşkêşî Komîsyona Karên Derve ya Meclîsa Jêr (House of Commons) a Brîtanyayê hatiye kirin: UK Trade and Investment. Global Security: UK-US Relations (Bazirganî û Pererazandina Meliktiya Yekbûyî. Ewlekariya Global:Têkiliyên DYA-Brîtanya), 6. rapora rûniştina 2009-2010'an, HC-114, adara 2010'an, Ev. 110.

2 Bi tenê 70 kes ji van xwediyê payeya dîplomatan in. Ji bilî wan, 142 kesên din jî hene ku li Washingtonê ji bo wezareta parastinê kar dikin û 550 esker û pisporên brîtanî yên çekan jî hene ku li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatine bicihkirin. Ev dane der barê 2008'an de ne û ji rapora wezareta karên derve û Commonwelth (FCO) dayî Komîsyona Karên Derve ya Meclîsa Jêr hatine girtin û di belgeya li jor behskirî de cih digirin.

3 "Mr Brown's silence endangers US relations (Bêdengiya Brown têkiliyên bi DYA'yê re dixe xetereyê", *The Daily Telegraph*, London, 25'ê tebaxa 2009'an

4 *The Daily Telegraph* nûçeya wê çêkir, 16'ê çileya paşîna 2010'an

5 Li ser vê mijarê binêre li Philippe Rivière, "Tous les Européens sur écoute (Ewropî hemû tên guhdarîkirin)", *Le Monde Diplomatique*, adara 1999'an

6 William Wallace û Christopher Phillips, "Reassessing the Special Relationship (Ji nû ve nirxandina têkiliya taybet)", International Affairs, 85-2 (2009), rûpel 274

7 Defence White Paper – Delivering Security in a Changing World (Belgeyên spî yên parastinê: Ewlekirina Dunyayeke ku Diguhere), Cm 6041, çileya pêşîna 2003'an. (Lêzêdekirina wergêr: Di fransî de peyva "le Livre blanc" tê bikaranîn û gotin bi gotin bi kurdî "pirtûka spî" ye. Ev pirtûk îşaret bi belgeyên siyasî yên mîna peyman an jî stratejiyên dewletê dike

8 Ministry of Defence (Wezareta Parastinê), Defence Industrial Strategy (Stratejiya pîşesaziya parastinê), London, TSO, Kanûna 2005'an, rûpel 29.

9 Sernavê fermî yê peymanê: Agreement for Co-operation on the Use of Atomic Energy for Mutual Defense Purpose (Lihevkirina hevkariyê li ser mijara bikaranîna enerjiya atomî ji bo sedema parastina dualî).

10 Brian Wicker û Hugh Beach (birêvebir), Britain's Bomb : What Next ?(Bombeya Brîtanyayê: Paşê wê çi bibe?), London, SCM Press, 2006, rûpel 192.

11 "The wars over the war (Şerrên li ser şerr)", The Economist, London, 5'ê hezîrana 2010'an.

12 *The Times*, 21'ê gulana 2010'an.

13 Konferansa li Navenda Lêkolînên Stratejîk a Philip Merrill, John Hopkins University, 10'ê çiriya paşîn 2009. Versiyoneke sererastkirî bi navê „A special relationship in jeopardy (Têkiliyeke taybet di rewşeke hesas de)" hat weşandin, di hejmara Tîrmeh û Tebaxa 2010'an a kovara The American Interest de.

14 Îfadeya nivîskî li pêşberî Komîsyona Karên Derve ya Meclîsa jêr a Parlamentoya Brîtanyayê, Global Security: UK-US Relations (Ewlekariya Global: Têkîliyên DYA-Brîtanya), çavkaniya li jorê behskirî, Ev.141.

15 Îfadeya nivîskî li pêşberî Komîsyona Karên Derve ya Meclîsa jêr a Parlamentoya Brîtanyayê, heman çavkanî, Ev. 83

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

### MANEVRAYEKE JEOPOLÎTÎK

# Berdêla lihevkirina Fransa-Ruwanda

BENOÎT FRANCÈS *

Di dema serdana xwe ya Kîgalî de 25'ê sibata 2010'an, serokkomarê Fransayê Nicolas Sarkozy aşkere kir: "*Em dixwazin ku berpirsiyarên qirkirinê werin dîtin û cezakirin. Di vê mijarê de, bi vir de wê de nîne.*" Ji 1994'an û vir ve, cara yekem bû ku serokkomarekî Fransayê diçû Ruwandayê. Gelo ev daxuyanî dê li Fransayê dawiyê li destnedana sûcdaran bîne? Serokê Yekîtiya aliyê sivîl ji bo Ruwandayê (CPCR) Alain Gauthier bi xemgînî got: "*Di nava 15 salan de dozgeriyê dozek bi tenê jî venekir. Eger em nebûna, dosyayek bi tenê jî dê li ser maseya dozger nebûya.*" Ji bo wî qet guman tê de nîne: ev nebûna daxwaza siyasî ye ku destûrê dide sûcdarên ruwandayî ku li Fransayê bijîn, bi ser de jî tu doz li wan nayê vekirin. Ew balê dikişîne ser ku "*Siyasetê rê li ber vekirina dozan digirt, çi bereya çepgir û çi jî bereya rastgir ên ku di dema qirkirinê de bi hev re desthilatdar bûn, berjewendiyên herduyan jî tê de hebûn ku tu encam ji vî karî derneketaya.*" Bi ser de jî, lihevhatina spektakuler a Fransa û Ruwandayê tevahiya astengiyan ji holê ranake.

Herdu welatan sala 2006'an têkiliyên xwe qut kiribûn. Ji ber ku dozgerê fransî Jean-Louis Bruguière biryara girtinê ji bo kesên nêzî serokdewletê Ruwandayê Paul Kagamé dabû, hukumeta Kîgaliyê gellekî aciz bûbû û dilê xwe girtibû. Dadgerê bilind ê fransî guman ji van kesan dibir ku di nava êrîşa li dijî balafira serokdewletê Ruwandayê Juvénal Habyarimana ya 6'ê nîsana 1994'an de cih girtibin. Ji xwe, ev êrîş weke bûyera ku qirkirin daye destpêkirin tê nirxandin… Piştî sê salên pevçûn û lihevnekirinê, nêzîkbûna herdu aliyan weke ku bi lez çêbûbe xuya dike û herkes derbarê wê de ne hemfikir e (1). Ev nêzîkbûn para bêhtir encama hewldanên wezîrê karê derve yê Fransayê Bernard Kouchner e. Kouchner serokdewletê ruwandayî Kagamé di dema xebateke mirovparêz ya rojên qirkirinê de, weke serokê serhildêran nas kiribû. Li herêmeke ku di warê stratejîk de girîng e, ku tu tişt bêyî Ruwandaya "piçûk" lê nabe ku pêk were, ku bandora diyarker li Komara Demokratîk a Kongoya cîran dike û dewlemendiya kanan lê heye, Fransa divê ji nû ve baweriyê bide. Wekî din, weke Sarkozy, Kagamé jî bê şert û şurût hevgirê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ye.

### Danûstandina berjewendiya dualî

Di dema serdana serokkomarê Fransayê ya Kîgaliyê de hempîşeyê wî yê ruwandayî, ku ji dema ku bûye desthilatdar û bi vir ve peyvên têra xwe tûnd bi kar dianîn, da ku Fransa lêborînê bixwaze, vê carê bi awayekî nermtir peyivî: "*Ji fahmkirin û lêgerîna tiştê qewimî û bi wê de, êdî wext e ku em têkiliyeke nû deynin, hevpariyeke li ser hîmê hevfahmkirinê çêkin û bi awayekî rast, rastiyê bigirin dest. Em red dikin ku bibin dîlên rabihuriyê. Şaşî hatine qebûlkirin, me nîqaşa wan kir. Û bi demê re, her ku diçe bêhtir em vê rastiyê digirin dest. Ya girîng ew e ku em berê xwe bidin siberojê.*" Sarkozy jî li aliyê xwe ji bo cara yekem li "*şaşiyên siyasî*" yên ku Fransayê li Ruwandayê kirine mikur hat; lê belê bêyî ku bi tefsîlat behsa wan bike.

Danûstandina fikiran a li ser tiştên ku divê werin kirin, zelal xuya dike: Li aliyekî, mirov dê xwe ji îddîayên der barê berpirsiyariya Fransayê ya dema qirkirinê re kerr bikin; li aliyê din, dosyayên Ruwandayiyên li Fransayê dê werin pêşdebirin û lêpirsînên dozger Bruguière dê werin bêtesîrkirin. Hê di çiriya paşîna sala 2008'an de girtina "di encama hevdîtinan de" ya Rose Kabuye, mudîra protokolê ya serokdewlet Kagamé ku hedefa yek ji biryarên girtinê yên dozger Bruguière bû, destûr da Kîgaliyê ku bigihêje hin parçeyên dosyayê. Ji hingê ve gellek şahidên girîng xwe paş ve kişandin û derket holê ku wergerê dozger Bruguière jî kevnesîxurekî Ruwandayê bû. Ev werger bûrayê Félicien Kabuga ye, yek ji fîrariyên Dadgeha Navneteweyî ya ji bo Ruwandayê

SERHAD BAPIR



(ICTR) ye ku herî zêde lê tê gerîn. Dozgerê ku kete şûna Bruguière, Marc Trevidic, wisa xuya ye ku dosya bi awayekî weha nirxand ku ji bo rejîma qirkirinê kêm sûdewar be.

Dema ku Sarkozy bi baldarî bi bîr xist ku ew "*girêdayî serxwebûn û adaletê*" ye, nîşanên oportunîzmeke dadgeriyê jî zêde bûn. Çend rojan piştî serdana Sarkozy ya Ruwandayê, jinebiya serokdewletê berê Habyarimana, Agathe Kanziga, hat girtin. Ev, yek ji van nîşanan e. Zehmet e ku mirov têkiliya wan bi hev re daneyne: Ya rastî, di encama giliyê CPCR û redkirina serlêdana wê (ya derengmayî) ya mafê penaberiyê de, ji destpêka 2008'an û vir ve lêpirsîneke dadgeriyê vekirî bû. Lê belê Agathe Kanziga li herêma Parîsê bêyî ku xwe veşartaya dijiya awayekî beloq ji nuha ve dide hiskirin: "*Fakseke şexsî nîne, asîstanekî/e pispor nîne, dijîtalkirina belgeyan sînorkirî ye…*" Dîsa jî hindikî beriya aşkerekirina lihevhatina dîplomatîk, dozger Pous karibû tevî hevkara xwe Michèle Ganascia di dawiyê de biçe Ruwandayê. Ji qirkirinê û vir ve cara pêşî bû ku tiştekî bi vî rengî diqewimî, digel ku dozger Bruguière bi xwe qet ji cihê xwe tev neliviyabû. Çavkaniyên girîng dê pêwîst bin da ku mirov Ruwandayê fahm bike, weke guhdarkirina bi dehan şahidan… Di dema dirêj de mirov çawa lê bifikire ku dozên bawerî bi wan were, mimkun in? Pisporê herêma Golên Mezin (Grands Lacs) û herweha li ICTR'ê jî pispor, André Guichaoua (5), weha fikarên xwe tîne zimên: "*Piştî ku me zehmetiya dadgeriyê ku ji bo bigihîje radeyeke herî jêr* Navneteweyî ya Lîga Mafê Mirovan (FIDH) parlementerê fransî Patrick Baudouin, ev bûyer û rewşên dijber in û "*fikra ku Parîs ji pêkanîna adaletê bêhtir, dixwaze têkiliyên xwe bi Kîgalî re baş bike*" piştrast dikin. Ji bilî peymana navneteweyî ya li dijî îşkenceyê ya sala 1984'an (8), ji bo ku peymanên navneteweyî yên ku wê mohr kirine û destûrê didin prensîpa dadgeriya gerdûnî, karibin li ser erdên wê pêk werin, Fransayê tu carî qanûnên xwe neguhertin. Bi tênê du doz li gorî vê prosedurê pêk hatin (ya sûbayekî morîtanî di 2005'an de û ya memûrekî tûnisî di 2009'an de), wan jî xwe disipart vê peymana navneteweyî.

13'ê tîrmeha bihurî parlamentoyê projeyeke qanûnê qebûl kir ku qanûnên fransî bi statuya Dadgeha Cezayan ya ve mijara yek ji giliyan e. Lê diviyabû sala 2007'an ICTR'yê biryareke girtinê bidaya, da ku Fransayê ew bikira kontrola dadgeriyê. Bi hêviya ku bikare û herweha derfetên wê jî hene ku wan dadgeh bike, ICTR'yê dosyaya Munyeshyaka tevî ya waliyê berê yê Gikongoroyê, da Fransayê. Nêzî beriya deh salan, di 1998'an de dadgeha bilind a Fransayê jî gihiştibû heman encaman, lê tiştek jê derneket… Di encama serîlêdana yekî ji gilîkaran de, sala 2004'an Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê ji ber dirêj kişandina dozan ceza li Fransayê birî. Di 2010'an de beriya Pous û Ganascia, dosya di ber destên sê dozgeran re derbas bûbûn…

Doza der heqê Augustin Ngirabatware de, ku kevnewezîrê plansaziyê yê hukumeta cîgir a Ruwandayê a kesayetên biyanî re aşkere bibûna, "*Ne têkiliyên girêdayî kar, lê belê girêdanên bi awayekî eşkere siyasî û ji bo hinan jî yên bazirganiyê* (10)". Wî herweha da zanîn ku dosyayên mîna ya serkêşe Wenceslas – li gorî wî dosyayeke qels e – bi kêrî veşartin û piştperdekirina dosyayên herî têrûtijî tên.

Gelo doz dê di dawiyê de li Fransayê pêk werin? Serokê berê yê saziya îstîxbaratê, Pascal Simbikangwa ku di 2008'an de li Mayotte'ê (ji ber sextekariya belgeyan û firotina wan) hat girtin, dadgeheke normal dê doza wî bişopîne. Fransayê wekî din soz da ICTR'yê ku ew ê Munyeshyaka û waliyê Gokongoro, Laurent Bucyibaruta, derxe pêşberî dadgehê. Ev dosya hatine cemidandin, lewra dadger û dozgerê fransî zehmetiyê dikişînin ku agahdariyên ku ICTR'yê



LMd arşîv

(2). Sala 1994'an, artêşa Fransayê di çarçoveya operasyona Amarllis de ew ji Ruwandayê derxistibû (3).

Mirov herweha dikare van zewacên dîplomatîk weke berpirsiyarên danezana (destpêka çileya paşîn) Dadgeha Bilind a Parîsê (TGI), û beşekî "qirkirin û sûcên li dijî mirovahiyê" jî bihesibîne. Dema ku mirov hejmara giliyên ji êş û azara bi qirkirina 1994'an ve girêdayî li ber çavan bigire, sûda vê biryarê bêguman li nêzîkbûna Fransa û Ruwandayê dike. Li wezareta karê derve ya Fransayê behsa "rasyonalîzekirineke" banal a îdarî tê kirin: "*Mala xwedê ava ku her roj qirkirin naqewimin û weha xuya ye ku beriya herkesî ev beşê dadgehê wê Ruwandayiyan alaqedar bike.*" Di vê navberê de Alain Gauthier gumanê jê dike: "*Em li hêviya diyardeyan in.*" CPCR nêzî panzdeh dosyayan dane hundir û cara pêşî jî sala 1995'an gilî kiriye… Dema mirov rewşa li Fransayê bi ya li Belçîkayê re dide ber hev, cudahiya wan pirr darî av e. Hêza din a koloniyal a berê çar dozên cezayên giran ên girêdayî qirkirinê bi encam kirin. Vî karê tevahiya rojê ya beşê lêpirsînê yê taybet, desdûr da ku dosya bi awayekî serketî bigihîjin encamê. Ev yek nîşan dide ku hebûna struktureke bi heman rengî li Fransayê jî dê bi kêr were.

Lê belê dozgera fransî Fabienne Pous a ku bi van mijaran re mijûl dibe, bi baldarî û bi tevdîr nêzîk dibe: "[Beşê taybet] *dê xwediyê çi derfetan be? Ew ê çawa hatibe birêxistinkirin? Em bi tu tiştî nizanin, û em hêvî dikin ku ev ne spekulasyonek be ku hêviyan zêde dike* (4)." Nebûna derfetan xwe bi *a kêrhatîbûnê dît – ez li Belçîkayê difikirim –, gelo bi fransiyên ku derfetên xweseriyê* (dadgeriyê) *di destê wan de nîne, encam dê bibe çi? Ew ê xwe bidin xapandin!*" Dema ku wî ev xema xwe dianî zimên, bal dikişand ser şahidiyên derew ku mohra qirêj li dozên bi heman rengî yên li Kanada û Swîsreyê xistibûn. Ji xwe, em qet behsa wê nakin û nabêjin ku ji reformên bê naverok çêtir, reformên ku xwe bi xwe betal dikin hene: li aliyekî tê eşkerekirin ku dozgerên taybet dê werin destnîşankirin, di heman demê de, li aliyê din, amadekarî tê kirin ku wezîfeya dozgerê lêpirsînê were betalkirin…

**Danûstandina fikiran a li ser tiştên ku divê werin kirin, zelal xuya dike: li aliyekî, mirov dê xwe ji îddîayên der barê berpirsiyariya Fransayê ya dema qirkirinê re kerr bikin; li aliyê din, dosyayên Ruwandayiyên li Fransayê dê werin pêşdebirin û lêpirsînên dozger Bruguière dê werin bêtesîrkirin.**

Derbarê sûcên li Ruwandayê pêkhatî de, qanûnek destûrê dide Fransayê ku "prensîpeke dadgeriya gerdûnî" bi cîh bîne (6). Dîsa jî Kouchner û Michèle Alliot-Marie bi taybetî destnîşan dikin ku armanca beşê "qirkirin û sûcên li dijî mirovahiyê" ne ew e ku pêvajoyeke bi vî rengî saz bike (7). Ji bo serokê Federasyona Navneteweyî (ICC) re li hev bikin. Ev dadgeh li ser dewletan ferz dike ku sûcên şerrî, sûcên li dijî mirovahiyê û qirkirin li ku derê hatibin kirin bila hatibin kirin û kê kiribin bila kiribin, ceza bike. Ev qebûlkirina qanûnê, dudiliyên Fransayê yên beramberî dadgeriya navneteweyî piştrast dike. Di encamê de ev qanûn dê bibe sedem ku di pratîkê de şopandina dozan ne mimkun be: divê "mala kesê sûcdar a ku ew para bêhtir lê dimîne" li Fransayê be û dozger dê di şopandina dozê de desthilatdar be. Kollektîfên mexdûran ên mîna CPCR'yê dê bi vî rengî ji navê werin derxistin. Wekî din, ji xwe me dît bê ka dozger di mijara Ruwandayê de çiqasî şermokî ne… Parlamenter Baudouin vê rewşê bi kurtî weha rave dike: "*Yan em aliyê prensîpa dadgeriya gerdûnî digirin û ji bo herkesî pêk tînin, ji Ruwandayê heta bi Kosovayê. Yan jî em alîgirê* siyaseta real *û qanûna yê herî bi hêz in.*"

## Jihevsarbûna dewletan

Dadgerî di mijara qirkirina 1994'an de ji xwe têra xwe dereng maye. Parlamenterê sosyalîst Paul Quilès'ê (9) ku sala 1998'an wezîfeya lêpirsîna meclîsê ya li ser rola Fransayê ya li Ruwandayê bi rê ve bir, bi gotinên ku rewşê sivik nîşan didin vê yekê weha îfade dike: "*Me ev dosya piçekî awiqandin*". Li gorî Gauthier "*dozger gellek caran hatin guherandin û her carê diviyabû doz ji serî ve bihataya destpêkirin.*" Bûyerek bi kurtî bêkêrî û kîndariya rayedaran radixe ber çavan "bûyera Wenceslas Munyeshyaka" ye ku ji 2001'ê ve li Gisorsê keşeyê hevkar û yê Şopgirên Fransayê (Scouts de France) ye. Ev keşeyê berê yê cemaeta Sainte-Famille a Kîgaliyê, ji 1995'an û vir 1994'an e, herweha mînakeke baş e. Augustin Ngirabatware li Gabonê bi cih û war bû û ji Saziya mafên destnedanê û lipêşgirtinan a Quai d'Orsayê sala 1998'an belgeyeke taybet stand ku mafê bicihûwarbûna li Fransayê didiyê. ICTR'yê li dijî wî tebaxa 1999'an biryareke girtinê da. Lê roja ku diviya bihataya girtin Augustin Ngirabatware ji mala xwe derket û çû Librevillê… Piştî ku ICTR'yê serî li wan da, rayedarên gabonî kirin ku ew ji holê wenda bibe. Ew 2007'an li Frankfûrtê hat girtin û ji wira şandin ICTR'ya li Arushayê (Tanzanya). Li vê dadgehê doza wî dewam dike. Li gorî Guichaoua, li Ewropayê wî sûcdarî ev piştgirî stand, lewra tirs hebû ku têkiliyên wî bi dane wan bi kar bînin, lewma pîvan û prosedurên wan cuda ne. Lê belê, pirsgirêka rastî ew e ku rola Fransayê ya li Ruwandayê ya 1994'an hê jî cihê nîqaşan e. Gauthier weke mînak destnîşan dike ku Bucyibaruta "*waliyê Gikongoro bû, cihê ku leşkerên operasyona leşkerî û insanî Turquoise'ê lê bi cîh bûbûn. Nabe ku doza wî behsa rola van leşkeran neke.*" Bi vî awayî, dibe ku doz bigihîje vê encamê: bi awayekî nerasterast analîzkirina siyaseta Fransayê ya wê demê (11).

*Rojnamevan

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

1 Ewropayê bide alî[1]. Di mijara Weke mînak li Association France-Turquoise (www.france-turquoise.fr)

2 Buroya parastina penaber û bêwelatan a Fransayê (Ofpra) weke sedem got, "nîşanên ciddî" hene ku dikin ku mirov bifikire ku wê di nava sûcên li dijî mirovahiyê de cîh girtiye

3 Weke gellek payebilind û rayedarên rejîma radîkal a Hutuyan. Binhere: Rapora erkê ya agahdarkirinê ku parlemanter Paul Quilès serokatiya wê kiriye, hejmar 1271, 15'ê çileya pêşîna 1998'an

4 AFP, 18'ê çileya paşîna 2010'an

5 Rwanda, de la guerre au génocide (Ruwanda, ji şerr ber bi qirkirinê ve), *La Découverte*, Paris, 15'berfanbar1998'an

6 Qanûna 22'ê gulana 1996'an a ku qanûnên fransî li gorî biryara Neteweyên Yekbûyî ya hejmara 955 saz kirin. Bi vê biryarê, ICTR hatibû damezirandin



7 *Le Monde*, 6'ê çileya paşîna 2010'an

8 Di nava xala 682-2 ya qanûna cezayê de hat bicîhkirin. Xala 689'an a heman qanûnê jî di qadên cuda û diyarkirî de cîh dide prensîbeke dadgeriya gerdûnî: terorîzm, bazirganiya maddeyên nukleer, korsanî, firotina sîlehan, sabotaj. 26'ê çileya paşîna bihurî, Dadgeha Temyîzê ya Parîsê li ser vî hîmî lêpirsîna bûyerên îşkencê, xespa azadiyê û wendakirina mirovan ku li Kamboçyayê di navbera 1975 û 1979'an de pêk hatine, ji nû ve da destpêkirin. Gilî û gazindên ji mijara biryarê sala 1999'an hatibûn kirin


9 *Le Débat* (guftûgo), *France 24,* 25'ê sibata 2010'an

10 André Guichaoua, *Rwanda, de la guerre au génocide* (Ruwanda, ji şerr ber bi qirkirinê ve), La Découverte, Parîs, 2010

11 Bixwîne: André-Michel Essoungou, "Aux racines du contentieux franco-rwandais (Kokên lihevnekirina Fransa û Ruwandayê), *Le Monde diplomatique*, çileya paşîna 2009'an



Nîsan 1970

PIRSGIRÊKA KURDÎ

# Bextreşiya milletekî bê dewlet

JEAN-PIERRE VIENNOT *

Peymana dawîn ku di navbera Mela Mistefa Barzanî, serokê kurd yê navdar ku tev li hemû serhildanên Kurdistana Iraqê yên ji 1930'î û bi vir ve bûye, û berpirsên « Baasa rastgir » ku piştî darbeya 17'ê tîrmeha 1968'an ji nû ve hat ser desthilatdariya Bexdayê de hate îmzekirin, gelo derdikeve derveyî sînorên nexşeya dernavendîkirina (*la-markaziyya*) ku Bexdayê danîbû ber xwe ?

Ev peyman gelo dê bibe deriyê têgihîştina ku Kurdan ji « otonomiyê » kiriye ? Kurdan ev têgihîştina xwe di daxuyaniya 24'ê nîsana 1963'an de bi awayekî aşkere dabû zanîn ku mirov dikare wê daxuyaniyê weke çarçoveya daxwazên wan ya daîmî jî binirxîne. Li gorî agahiyên ku îroj di destê me de hene (dawiya adarê), hê gellekî zû ye ku mirov bikare bersiva pirsa jorê bide. Ew ê bibe paradokseke dîrokê ku partiya sosyalîst ya vejîna erebî (Ba'th) ku di nava Rojhilata ereb de weke mezintirîn dijmina daxwazên Kurdan û dijbera fikra neteweperweriyeke ne-ereb ya di nava welatekî ereb de tê naskirin û li ser têgihîştineke mîstîk, da ku mirov nebêje « surrealîst », ya neteweperestiya ereb hatiye avakirin û piştî 10'ê hezîrana 1963'an, li hember Kurdan dijwartirîn zulma leşkerî kiriye, îroj rabe û meşrûbûna daxwazên Kurdan yên neteweyî bipejirîne. Mîşel Aflaq'ê ku yek ji serokên Baasê yên dîrokî ye û di bazara iraqo-kurd ya Beyrûdê de roleke sereke lîstiye, çewtiyên xwe û tevgera xwe yên di vê mijarê de qebûl kirin. Mirov dixwaze hêvî bike ku xwerexneya wî ji dil be û ne nîşana lîstikeke taktîkî be ku bi armanca qezenckirina demê û xapandina raya giştî ya ereb û navneteweyî hatibe kirin.

Gelo çi heye di nava vê otonomiya ku ji aliyê berpirsên kurd ve hatiye aşkerekirin û bûye armanca sereke ya vî şerrê çekdar ku bi salan e didome û bûye cîhê ewçend hêsir û xwînê?
Xal bi xal ev hene :

1- Naskirina rastiya duneteweyîbûna Dewleta Iraqê û hebûna Kurdan ya neteweyî ya li ser axa xwe: Kurdistana Iraqê (an jî ya «başûr»), naskirineke weha ku divê bi awayekî fermî di Destûra Komara Iraqê de were nivîsandin.

2- Diyarkirina îdarî ya Kurdistana Iraqê, yanî axa ku Kurd lê pirrhejmar in û, li gorî Kurdan, ev *lîwa* û *qeza* (1) di nav de ne (2): lîwayên Silêmanî, Kerkuk û Erbîl (bi kurdî Hewlêr) – qezayên Xaneqîn ku di nava lîwaya Diayalayê de ye, qezayên Zaxo, Dihok, Amediye, Aqra, Sîncar, Şêxan û Til Afar ku di nava lîwaya Mûsilê de ne û dê di nava xwe de lîwayeke nû ava bikin ku navê wê dê bibe lîwaya Dihokê. Hersê qezayên dawîn yên Yezîdiyan in ku civata oleke kurd e û bi çewtî ji wan re dibêjin « bawerî şeytên dikin », civateke girtî ye û li gorî îslama sunnî jî qedexe ye ;

3- Hilbijartinên giştî li Kurdistanê ji bo diyarkirina parlamentoyekê, ku ji vê parlamentoyê dê lijneyeke birevebiriyê pêk were û ev jî dibe hukumeta Kurdistana otonom û desthilatdariya wê dê li ser hemû herêma kurd di warê birevebiriya karên civakî de hebe (huqûq, perwerdehî û xwendin, tendurustî, cotkarî, tûrîzm, katên civakî û hwd.), û ev jî dibe bernameyeke weha ku Dewleta Iraqê ber bi federalîzmê ve dibe ;

4- Perwedehiya zimanê kurdî ya li Kurdistanê, di hemû astên xwendinê de, û bikaranîna wî ya di hemû dezgehên birevebiriya herêmî de; bipêşxistina bê asteng ya çanda kurdî (weşan, zanîngehên herêmî, îstasyonên weşana radyoya kurdî);

5- Beşdariya Kurdan ya hemû dezgehên Dewleta navendî yên sivîl û leşkerî, ku ev beşdarî dê li gorî nifûsa Kurdan (nêzî du milyonan) ya di nava nifûsa Iraqê ya giştî de be (heft milyon) : tayinkirina Kurdekî ya ji bo dûserokatiya Komara iraqî;

6- Beşekî kara ji petrola Iraqê, li gorî nifûsa xelkê Kurdistanê, ku sê çarîkên wê petrolê ji herêma kurd (kanên Mûsil û Kerkukê) tê derxistin dê li fînansmana geşkirina Kurdistanê ya çandî, aborî û civakî were xerckirin; di nava artêşa iraqî de, beşekî kurd (feyleq) dê hebe û dê li Kurdistanê bê bicihkirin ;

7- Azadiya çalakiyan ya bê sînor ji bo Partiya Demokrat a Kurdistanê ku take partî ye li Kurdistanê, ligel beşê kurd yê Partiya Komunîst ya Iraqê.

Naskirina ji aliyê Bexdayê ve ya hebûna neteweyî ya xelkê kurd, ku di dema şerrî de xwe bi awayekî ciddî da naskirin û êdî ji herkesî ve aşkere ye, û herweha pejirandina daxwazên Kurdan yên di warê çandî û zimanî de ji xwe pêk hatibû, lê pirsgirêka anîna lîwaya Kerkukê (ku bîrên petrolê yên Bey Hasan û Cambûrê lê ne) ya nava herêma kurd ya otonom, ku ne bi dilê hukumetê bû, bi cudakirina qezayên ne-kurd ve hate çareserkirin. Ji aliyê din ve, di mijareke girîng de Kurdan serkevtinek bi dest xist ku ev mijar di bazarên berî vê de tim bûbû sedema têkçûyina bazarê û ev jî tê wê wateyê ku Bexdayê tawîzeke pirr mezin daye: hêza çekdar ya Berxwedana kurd (pêşmerge) dê neyê belavkirin. Ev hêz bi tenê heye ku bikare dezgehên berdewamiya dezgehên Kurdistana Iraqê bipareze, û tew gava ku mirov guherbariya siyasî ku li Iraqê bûye adet jî bihesibîne, ev mijar girîngtir dibe (hin serbazên rastgir yên tûndrew hewl dabû ku ji bo rawestandina bazaran darbeyekê bikin, lê belê demeke kurt berî peymana dîrokî ya 11'ê adara 1970'yê rê li ber wan hate girtin). Piştî demekê, artêşa serhildêrên kurd dê bibe teşkîlata polisên herêmî û sînorên iraqo-iranî bipareze. Herçî daxwazên li ser petrolê ne, diyar e ku Kurdan êdî dev ji wan berdaye.

### Civakeke nû ku şerr nas kiriye

Serhildana kurdî di destpêkê de bi taybetmendiyeke kêm zêde eşîrkî bû, lê belê ji bihara 1962'an û bi şûn ve, bi tevlêbûyina Partiya Demokrat a Kurdistanê ve rengekî bi temamî neteweyî û girseyî wergirt û di nava wê de gundî û axe, rewşenbîr, bajarî û serokeşîr, leşker û serbazên kurd ku ji artêşa iraqê reviyane, hemû hatin ba hev. Ev partiya mezin ya neteweperwer ku modernîst û ji aliyê civakî ve pêşverû ye û di nava wê de meylên maksîst tim xurt bûn, 16'ê tebaxa 1946'an bi yekîtiya sê tevgerên kurd ve ava bûye : Partiya Komunîst a Kurdistana Iraqê (rojnameya *Şoreş*), baskê çep yê partiya kevn *Hêwa* (hêvî) û *Komela* (Komîteya serhildana Kurdistanê) ku li Kurdistana Îranê bûbû pêşeng û avakarê Komara kurdî ya Mehabadê (1946).

Derfetên qirkirinê ku hukumeta Bexdayê bi kar anîn, da ku vê serhildana xurt ya xelkê kurd biperçiqîne – bomberana gundan ya bi napalmê, bikaranîna gazên kîmyewî û asîda sulfurîk ya li dijî xelkê sivîl, şewitandina zadî û talankirina pezî-xurttirîn sedem bûn ji bo belavbûyin û bihêzbûyina hişmendiyeke neteweyî.

Mela Mistefa Barzanî kesayetiyeke bi hêz û ecêb bandorkir bû, neteweperwerekî bawerkirî û xurt bû, lê belê di warê civakî de muhafizekar bû, surguniya wî ya li Rûsyayê bandoreke politîk ya zêde li ser wî nehiştibû, qumandarekî leşkerî yê bêhempa bû, tecrubeyeke wî ya bîst û pênc salan ya şerrê gerîllayî hebû, di warê politîkayê de pragmatîk bû lê belê hay ji asta xwe ya zanînê jî hebû û kêmaniyên xwe qebûl dikir, bi temamî bi civaka kurdî û adetên wê yên kevn ve girêdayî bû û van taybetmendiyên wî derfet dayê ku dijayetiyên cihêreng yên di navbera beşên civakê yên cur be cur de (gundî û axe) nebin pirsgirêk û cudahiyên politîk yên di nava endamên modernîst ku ji entelîjensiyaya bajaran dihat û endamên civaka kurdî ya kevn ku ber bi nemanê ve diçû (serokeşîr) kêm bibin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK), digel ku piştgiriya reformeke zeviyan dike û xwe weke tevgereke «şoreşger û demokratîk û pêşverû ku mafên karkir, gundî, karmend, sinhetkar û rewşenbîrên şoreşger yên Kurdistana Iraqê diparêze» (xala 2.) dide naskirin, dîsa jî di dema azadiya neteweyî de, ji bo xatirê «eniya neteweyî ya yekgirtî» statukoya civakî parast, da ku peywendiyên wî yên bi «serokeşîrên welatperwer» û axeyên piçûk re ji dest neçin: bi tenê, dest danîn ser zeviyên Kurdên ku bi dewletê re dixebitîn û ew li gundiyan belav kirin û gundiyan jî baca xwe rasterast dida lijneya birevebiriya şoreşê. Qeyrana navxweyî ya mezin ya havina 1964'an nehat çareserkirin, lewre yên ku wê demê xwe li gorî rexneyeke çepgir ya birevebiriya barzanîst dida nasandin (Celal Talabanî – Îbrahîm Ahmed) bi dû re ketin nava wê xeletiya mezin ku xwe nêzîkî hukumetê kirin û hetta li dijî serhildana kurdî ya bi pêşengiya Barzanî jî bi artêşê re ketin nava hevkariyeke temamî ku îroj zehmet e ku mirov bibêje ku ev şoreşgerên qahweyan yên ku li Bexdayê di nava rehetiyekê de û di bin parastina polîsên iraqî de dijîn, beşdarî tevgera neteweyî bûbin.

Otonomiyeke *de facto* li herêmên Kurdistana Iraqê yên azadkirî hate bicîhkirin: birevebira sivîl ji aliyê Partiya Demokrat a Kurdistanê ve li hemû gundan hate danîn. PDK weke yek ji organîzetirîn û xurttirîn partiyên Rojhilata Navîn tê naskirin (bîst û pênc hezar endam). Dibistan hatin damezirandin û pirtûkên perwerdehiyê yên bi kurdî ji bo wan hatin çapkirin. Dermanxaneyên sivik û çapxaneya ji bo rojnameya Partiyê (*Xebat*) hatin danîn û îstasyoneke radyoyê ya qaçax (*Dengê Kurdistana Iraqê*) hate vekirin ku heta li gundên herî piçûk yên Kurdistana Turkiyeyê û Îranê jî dihat guhdarîkirin û hukumeta Bexdayê çi dikir jî nikarîbû ew hilweşandaya, lê belê, hemû bangên wê yên ji bo civata derve bê bersiv diman.

Navenda birevebiriyê (hijdeh endam in ku duwanzdeh ji PDK'yê ne), ji aliyê lijneya şoreşa Kurdistana Iraqê (şêst û sê endam) ve tê hilbijartin ku ev lijne jî dibe weke parlamentoya Kurdan û di nava wê de Suryanî (Xristiyanên keldanî û nestoriyên ku ji zimanê aramî tên) jî bi awayekî çalak tev li tevgerê dibin. Navenda birevebiriyê dibe kakila şoreşê û bi Barzanî re di nava peywendiyeke xurt û daîmî de ye. Barzanî serokê PDK'yê yê rûmetê ye û herweha serokê Lijneya fermandariya Şoreşê ye jî, Mihemed Habîb Kerîm him sekreterê partiyê yê giştî ye û him jî sekreterê navenda birevebiriyê ye, lê vê dawiyê Mahmûd Alî Osman ketiye şûna wî. Mahmûd Alî Osman jî piştî Barzanî di şoreşê de navê duyem e.

Herçî artêşa serhildêrên kurd e, îroj hijdeh hezar partîzanên wê hene (pêşmerge) ku di nava deh beşan de (Hêz) hatine dabeşkirin. Di destê wan de deh misîlen ji bo parastina li dijî balafiran hene, nêzî bîst topên wan yên giran hene û cebilxaneyên wan yên xurt hene ku % 90'ê wan ji artêşa Iraqê bi şerr hatine bidestxistin. Ji nava vî şerrê dirêj û xwînrij ku fedakarî û êş û azarên bê hesab û trajediyên mirovahiyê nas kirine, mirovekî kurd yê nû peyda bû ku axlaqekî wî yê şoreşgeriyê heye ku bi fedakarî û zehmetî û mêrxasiyeke bawerkirî ya di nava rewşên dijwar de hatiye ceribandin, bi sebir, bi realîzmeke xweşbîn, bi welatperweriyeke paqij ku dûrî xirabiyên nasyonalîzma

## ARŞÎVA BÎR

Salên 1960'î, li Kurdistana başûr, bi pêşengiya Mistefa Barzaniyê ku vegeriyabû welêt ve Tevgera kurd dest bi şerrê çekdariyê kir. Hêzên Kurdan ewqasî xurt bûbûn ku herêma xwe xistibûn bin destê xwe û hukumeta Iraqê hingê mecbûr mabû ku bi wan re rûne û bazarê bike. Kurdan gellek serhildan dîtin, gellek şerr û xweşiyên ku pê re tên jî. Di siyaseta rasteqîn de îroj hatiye fahmkirin ku bi tena serê xwe mirov nikare bigihîje armancan û pêwîst e ku mirov doza xwe di qada navteweyî de bide naskirin û ji xwe re, ji bilî çiyayên Kurdistanê, dostine din jî peyda bike. Li Fransayê bi hewldanên Kamûran Bedirxan ve rojnameyên mina *Le Monde*'ê gellek caran behsa şerrê Kurdan dikir û digel dijayetiya Turkiyeyê jî hin pirtûk dihatin çapkirin. Van hewldanan kir ku, kêm be jî, bal bikeve ser Pirsgirêka Kurdan.

Erê, Kurd bi şerrê xwe ve hatin naskirin, lewre salên şêstî li seranserê cîhanê tevgereke azadixwaz belav bûbû ku di encamên wê de bûyerên 1968'ê pêk hatin. Vî nifşê azadixwaz yê li dijî zordariyê, bê guman di doza Kurdan de rengekî xwe jî didît. Milletekî li hember desthilatdariyên zordar dest bi şerrê çekdariyê kiribû û nifşê 68'ê di vê tevgerê de xeyalên xwe yên mezin vedihewandin. Gellek milîtanên ji vî nifşî wê demê çûn alîkariya Kurdan. Herçend, di qadên şexsî de be jî, van hewldanan bi dû re bandoreke xurt li raya giştî ya ewropî kir.

Xebatên wê demê yên ji bo nasandina doza Kurdan ne hêsan bûn. Lewre, li Ewropaya ku ji şerrekî mezin derketibû teqîneke endustriyel pêk hatibû, guherînên civakî û hişmendiyê pêk dihatin û ji ber mezinbûna bazara xwe ve xatirê Turkiyeyê li Ewropayê bilind dibû. Bandora artêşê ya li ser hukumetê jî baweriya Rojavayiyan ya ji Turkiyeyê xurttir dikir, lewre artêş, wê demê weke desthilatdariyeke xurt dihat dîtin. Peywendiyên Iraqa piştî dema melikiyê jî bi Ewropayê re baş bûn û Fransa û Brîtanyayê bi hev re sîleh difiroştin vê muşteriya ku di warê petrolê de hevkareke ne xirab bû. Îranê jî peywendiyên xwe yên bi Rûsyayê re xurt kiribûn û bi vî awayî piştgiriya Kurdan ya li herêmê jî hatibû qelskirin. Ji xwe, Sûriyeyê dabû ser rêya Turkiyeyê û siyaseta xwe ya kurdî bi navê «kembera erebî» li gorî wê saz dikir. Ji bilî van bûyerên ku ji bo diplomasiya









## RA KURDAN

Kurdan astengiyên mezin bûn, herweha çar welatên ku Kurd lê dijiyan jî, pişta xwe dabûn hevdu, da ku agirê tevgera kurd ya azadîxwaz bihataya tefandin. Lewre, heger li deverkê agir pêketaya, wî agirî karîbû hemû welatên herêmê bidana ber xwe û her çar welatan jî bi vê yekê zanîbû. Ji ber wê ye ku serkevtiyên Kurdan yên li Iraqê yên sala 1970'ê divê li gorî vê çarçoveyê were nirxandin.

Ev nivîsa Jean-Pierre Viennot ku em di vê hejmarê de pêşkêşî we dikin jî yek ji nîşana wan hewldanên danasîna Tevgera Kurdan e. Lewre, em ji nivîsê dibînin ku rewşa Kurdan hê baş nehatibû naskirin û nivîskar hewl dide ku berî hertiştî vê rewşê bi xwendevanên xwe ve bide naskirin.

Jean-Pierre Viennot di sala 1969'an de teza xwe ya doktorayê ku li ser Tevgera Neteweyî ya Kurdan çêkiribû, bi awayekî fermî parastibû û heman salê jî li Zanîngeha ku nuha bi navê INALCO'yê tê naskirin û berê bi ser Zanîngeha Sorbonê ve bû, dest bi mamostetiya dersên dîroka Kurdistanê kiriye. Ew bi kurdologên mîna Joyce Blau û Thomas Bois re xebitiye. Di kovarên zanistî yên wê demê de gellek nivîsen wî yên li ser Kurdan jî hatine çapkirin û bi rêya lêkolînên wî ve ji bo nasandina tevgera kurdî bingehekî xurt hatiye avakirin.

Berî çapkirina vê nivîsa ku hûn ê bixwînin bi mehekê, li Iraqê, 11'ê adara 1970'ê, peymanek di nava Tevgera Kurdan û Hukumeta Iraqê de hatibû îmzekirin û li gorî vê peymanê otonomiya Kurdan ya herêmî dihat naskirin. Ev nivîs jî di çarçoveya vê peymana ku bûye cîhê hêviyê de behsa pirsgirêka Kurdan dike û rewşa Kurdên li welatên din jî bi bîr dixe.

*Le Monde diplomatique kurdî*, dê her meh vê arşîva Kurdan ya «diplomatîk» bigihîne xwendevanên xwe û bi rêya van nivîsên ku di *Le Monde diplomatique*'ê de hatine çapkirin, alîkariya fahmkirina dîroka me ya nêzîk bike.

LM*d*kurdî

ereb e û li ser daxwazên girseyî û bi enternasyonalîzmeke xurt ve hatiye sazkirin.

Soreşa kurdî li Iraqê nîqaşeke mezin anî nava hêzên siyasî yên ereb, çepa iraqî û bi taybetî jî partiya komunîst bi awayekî aşkere piştgiriya otonomiya Kurdistana Iraqê dikir û herweha mafê Kurdan yê serxwebûnê û avakirina Dewleta xwe ya Kurdistana mezin, teva ya Turkiye û ya Îranê jî nas dikir. Wê bi dîroka xwe ve nîşan daye ku ew li dijî hukumetên dîktatoryal û leşkerî ye û ne li dijî milletan e, iraqî û ereb e û di nava wê de gellek milîtanên ereb hene ku bi pirranî maksîst in û ji ber zulmê reviyane hene û li çiyayên Kurdistanê (hêza Kemal) li dijî hukumeta xwe rahiştine çekan û şerr dikin. Ber bi dawiya sala 1967'an, çiya bi baskê çep û şoreşger yê partiya komunîst ve tije bûn û ev hêza ku li dijî rastgirên reformîst bû li gundên Ereban û herêmên dijwar yên başûrê Iraqê peyda bû. Başûrê Iraqê ji berê ve bûye dergûşa nerazîbûneke civakî ya tûnd (serhildana koleyên reş ya Xariciyan li Iraqê, sala 868'an).

Eniya şerrê girseyî, organîzasyona berxwedana çekdar ku ji birevebiriya navendî tê, bang li xelkê kiribû ku serî hilde û bi şoreşa Kurdistana Iraqê re eniyeke hevbeş ya şerrê çekdar ava bike, lê belê çiyayên wê ji aliyê artêşa Iraqê ve zû bi xwînê hatin paqijkirin, lewre tevger bi awayekî baş nehatibû amadekirin û gundiyan giliyê gerîllayan dikir. Vê tevgerê di warê çekdarî de piştgirî ji Kurdan stendibû û Azîz Al-Hacê berpirsê tevgerê jî bi îşkenceyan ev yek li xwe mikur hat û neçar ma ku li ser televizyona Bexdayê fikrên xwe yên berê red bike.

Van demên dawiyê, ji ber zulma li dijî Kurdan gellek serhildanan li Iraqê rû dabû. Ya herî giring 3'yê tîrmeha 1963'yan li qampa Raşîd, nêzîkî Bexdayê dest pê kiribû. Hukumetê weha bersiv dayê: «Em li vê bûyera trajîk ku li qampa Raşîd ya leşkerî pêk hat difikirin. Leşkerên ku hê nuh ji Basrayê hatibûn wira diviya bi şev bi qemyonan biçûna bakur. Saet duyê şevê qemyon amade bûn, lê belê leşkeran nedixwast siwar bibin. Wan pişta xwe da hevdu û li dijî qumandaran rahiştin sîlehan. Berpirsên ku hayê wan jê çêbû, ferman da tankan ku êrîşî wan bike : bi sedan kes mirin. Roja din daxuyaniyeke fermî dida zanîn ku li Raşîdê rê li ber '*komployeke komunîst'* hatiye girtin û endamên wê ji aliyê '*hêzên welatperwer'* ve di nava nîv saetê de hatine kuştin!» (ji qelema Nazem Safir, kovara cezwît *Etudes* ya adara 1964'an).

### Helwêsta Îranê ya nû

Heta 1964'an ku Qahîre û Bexda nêzîkî hev bûbûn, hersê welatên sereke ku Kurdistan di nava xwe de par ve kirine, yanî Turkiyeya ku şeş milyon Kurd lê dijîn, Îrana ku çar milyon Kurd lê dijîn û Iraqa ku du milyon Kurd lê dijîn di nava xwe de peywendiyên xurt danîn, bi taybetî jî bi beşdariya hevpar ya paktên leşkerî ve (pakta Saadabadê ya 1937'an, bi dû re jî, pakta Bexdayê ya 1955'an), ku hin ji xalên bingehê wan paktan li ser tevdîrên li dijî çalakiyên tevgera kurd ya neteweperwer bû.

Li Îranê, pirsgirêka kurdî tu carî weke li Turkiye û Iraqê nebû mijara pêkutiyên xwînrij. Li Turkiyeyê, di serhildana Şêx Seîd (1925), serhildana Agiriyê (1930) û serhildana Dêrsimê (1937) de çil hezar Kurd hatin kuştin. Lê belê, avakirina Komara kurd ya Mehabadê ku li Kurdistan Îranê, çileya paşîna 1946'an pêk hat, rast e ku di konjonktureke siyasî ya gellekî baş de pêk hatibû (têkçûyina desthilatdariya navendî, ketina hêzên rûs ya bakurê Îranê û ketina hêzên brîtanî ya başûrê wê ku ev hemû di çarçoveya çalakiya hevpeymaniyê de pêk hatin), û ev komar, li gorî Komara demokratîk ya turk ya Azerbeycanê (paytexa wê Tebrîz bû) ku di heman demê de ava bûbû û bi ser siyaseta komunîst ve bû, li ser bingehekî neteweperwer hatibû avakirin û ev jî nîşaneke zelal e ji bo ku mirov bibêje ku hêzeke netweperweriya kurd ya daîmî li Îranê heye.

William Eagleton ku nivîskarê pirtûkeke li ser Komara Mehabadê ye (3) û demekê li Tebrîzê jî maye û vê mijarê baş nas dike, weha dinivîse : «*Ya rast ew e ku fikra ku agirê neteweperweriya kurdî di navbera 1943 û 1945'an de li Îranê geş kir, îroj hê jî li Mehabadê û deverên Kurdistanê yên din heye*» (r. 126). Di dema seferekê de ku min havîna 1966'an li Kurdistana Îranê kir, min bi xwe jî dît bê ev agahî çiqas rast e û min fahm kir ku Mehabadê dev ji hêviya xwe bernedaye û dixwaze ji nû ve bibe navendeke çalak ya tevgera kurd.

Vê komara piçûk, digel temenê xwe yê kurt jî (hema hema salek), berhemeke ecêb pêk anî, bi taybetî jî di warê çandî de : vekirina dibistanan, çapkirina pirtûkên dersan û kovaran bi zimanê kurdî. Lê belê Stalîn weke ya Azerbeycanê, dev ji piştgiriya vê komarê jî berda, lewre wî dixwast li berdêla vekişîna hêzên sovyetî (gulana 1946'an) peymaneke avakirina şîrkete dualî îrano-rûs bi dest bixe ku li ser petrola bakurê Îranê bixebite. Hingê ev komar jî bi awayekî trajîk bi dawî bû û serokê wê Qazî Mihemed û herweha gellek mezinên Kurdan roja 31'ê adara 1947'ê hatin bidarvekirin. Ji hêla din ve, piştî vegirtina Mehabadê (çileya paşîna 1946'an) artêşa Îranî jî pirtûkên kurdî yên ku dezgeha perwerdehiya Komarê çap kiribûn, hemû şewitandin.

Heger mirov bibêje ku li gorî welatên din, peywendiyên kurdo-îranî aram in û sedemên vê yekê di nêzîkahiya wan ya etnîkî û zimanî de bigere, kes dê pê qane nebe, lewre nêzîkahiya etno-zimanî nayê wateya nasnameya neteweyî. Em di wê baweriyê de ne ku çiqas çewt be ku mirov mehû milletên silav weke neteweyekê bihesibîne, ewqasî çewt e ku mirov hemû milletên îranî weke neteweyekê bihesîne ! Belkî mirov dikare sedema vê yekê di bisernetina Farisan ya «şoreşa destûrê» ya 1907-1911'ê de bigerre ku ev şoreş bi armanc û awayê xwe ve gellekî dişibiya şoreşa neteweyî ya Mistefa Kemal (modernî, laîkî, navendîkirina Dewletê, şerrê li dijî desthilatdariyên biyanî û gendeliya navxweyî). Bi îdeolojiyeke neteweperest ya faris, weke neteweperestiya etnîkî ya Turkiyeyê ku ji dewra Mistefa Kemal ve heye û neteweperestiya ereb ya Iraqê, bi tenê ev şoreş dikare, li gorî pêvajoya klasîk ya sedem-encamên diyalektîk, bibe sedema helwêsteke Kurdan ya neteweperest.

Sedem çi be jî, ji bo Tehranê, pirsgirêka Kurdan ya neteweyî nikare li Îranê hebe. Hasan Arfa'yê ku weke generalekî tev li gellek operasyonên leşkerî yên li dijî Kurdên Îranê bûye û herweha nivîskarê pirtûkeke li ser pirsgirêka kurdî ye (4) têgihiştina fermî xweş aşkere dike û weha dinivîse: «*Îranî Kurdan weke kurd qebûl dikin, lê belê Kurd ji malbateke nijada îranî tên û ev malbat dibe şaxê vê nijadê yê kurd, dibe beşekî Îranê; ji xwe, Îran împeretoriyeke pirrnijadî ya weha ye ku li ser dîrokê, li ser adetan û li ser girêdana bi Şahî ve hatiye avakirin. Ji ber wê, ji bo Îraniyan, pirsgirêka kurdî tuneye*» (r. 159-160).

Ji hêla xwe ve, general Teymûr Baxtiyar ku kevneberpirsê polîsê siyasî yê îranî (Savak) ye, roja 26'ê tîrmeha 1958'an ji *New York Timesê* re weha gotibû : « *Li derveyî Îranê, li kuderê bin jî, Kurd li herderê weke Îraniyan tên naskirin û zimanê wan jî farisî ye. Em pê bawer in ku ew peywendiyên ku wan bi xaka wan ve girê didin ji bîr nakin*».

JI ber dijayetiyên xwe yên bi Iraqê û welatên ereb yên din re ku her ku diçû tûndtir dibûn (naskirina Îsraîlê ya ji hêla Tehranê ve ; beşdariya Îranê ya li pakta Sentoyê, xwedîderketina Îranê ya li giravên Bahreynê û yên Erebistanê ; rikberiya sînorî ya li ser Şat-al Erebê), Îranê êdî şoreşa Kurdan ya li Iraqê ji xwe re weke xetere nedidît û ji 1964'an û bi şûn ve, nema tev li çalakiyên li dijî wê dibû û tew êdî, ji bo propagandaya panîranîst û anti-ereb, piştgiriya şoreşê jî dikir ; lewre, birevebiriya barzanîst, ji ber sedemên taktîkî yên malûm, nedixwast berî bidestxistina otonomiya Kurdistana Iraqê behsa pirsgirêka kurd ya li Îranê bikiraya.

Ji ber van sedeman, serhildana kurdî ya li Iraqê demeke dirêj ji vê «bêterefiya dostane» ya Îranê îstifade kir. Li gorî vê bêterefiyê, sînorê iraqo-îranî ji nû ve vebû (li hêla Iraqê sînor di destê Kurdan de bû) û bi xêra wê birîndar derbas dibûn, sîlehên ku Kurdên Îranê dişandin dihatin, alîkariya tendurustiyê digihîşt Kurdistana Iraqê û herweha rojnameger û rayedarên kurd tê re diçûn û dihatin. Lê belê, fraksiyoneke muhafizekar a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ji birevebiriya barzanîst ya Kurdistana Iraqê veqetiya û sibata 1965'an, li ser sînorê iraqo-îranî kongreyeke cuda li dar xist. Vî baskê şoreşger «reformîzma parlamenter» ya partiya Tûdeh (partiya komunîst ya îranî ya prosovyetîk) şermezar kir û şerrê çekdarî dast destpêkirin: «Take rêya rast ya ji bo azadiya neteweyî şoreşa çekdar ya li dijî kolonyalîzmê û berhemên wê ne, û ev şoreş divê li ser îdeolojiyeke civakî ya nuh bê avakirin ku bikare dawiyê li xizanî, li bêdadî û li zulmê bîne» (encamnameya kongreya duyem. Çavkanî: Eric Rouleau, «Daxwazên şoreşger li Îranê», *Le Monde diplomatique*, sibat 1966).

Hêzeke gerîllayî ya weha ku fraksiyona PDK'ya Iraqê ya antîbarzanîst ya ku bi hukumeta Bexdayê re dixebite jî piştgiriya wê dike, di navbera 1967-1968'an de li Kurdistana Îranê dest bi çalakiyên xwe kir. Îroj bi dehan milîtanên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di girtîgehê de ne û gellek birevebirên wan yên naskirî jî bi sîlehan hatine kuştin, mîna Mela Awara, Îsmaîl Şerîfzade û Silêman Ahmed Mueynî.

### Ber bi diyarkirina qedera xwe û ya Kurdistana Mezin ve

Li Kurdistana Turkiyeyê, ji dema Mistefa Kemal ve, zulmeke çandî û zimanî bi awayekî gellekî tûnd û bêrehm li ser Kurdan tê meşandin : qedexeya hemû celeb weşanên bi zimanê kurdî (alfabeya kurdî bi xwe jî bi qaçaxî belav dibe), redkirina hebûna Kurdan ya neteweyî, ku bi awayekî fermî ji wan re dibêjin «Turkên çiyayî». Qanûneke fermî (n° 6/7635) roja 14'ê sibata 1967'an di rojnameya fermî ya Komara turk de hate belavkirin û got ku «bi çi awayî be jî (weşan, dîsk û qeyd), hemû alavên ku bi zimanê kurdî ji welatên derve bên û li Turkiyeyê belav bibin qedexe ne». Daxuyaniya ecêb ya general Gursel hê jî di bîra herkesî de ye: «heger ev Turkên çiyayî (yanî kurd) yên ku nayên ser rêyê rehet rûnenin, artêş dê gund û bajarên wan bide ber bombeyan. Dê goleke xwînê ya weha pêk were ku ew û welatê xwe dê di nav de bifetisin» (ji Dagens Nyheter'a Stockholmê, çiriya paşîn 1960).

Hingê, naskirina otonomiya Kurdistana Iraqê ya ji hêla Bexdayê ve desthilatdariyên Tehran û Anqereyê ditirsîne, lewre ew ditirsin ku bandor li hişmendiya Kurdên welatên wan jî bibe û Kurdistanê Iraqê, weke sala 1959'an ku «dewra çep» ya şoreşa iraqî bû, bibe binkeyeke piştgiriyê ji bo tevgera neteweperwer ya kurd ya li Turkiye û Îranê, û bi vî awayî, bibe cihê kêfxweşiya hemû Kurdên Rojhilata Nêzîk. Rojnameyên turk dan zanîn ku serdana Anqereyê ya wezîrê iraqî yê karên navxweyî, Saleh Mehdî Ammeş, ku hema berî agirbesta Kurdistan Iraqê pêk hat, bi armanceke nihênî bûye ku piştgiriya Anqereyê ya leşkerî wergire, da ku heger bazar bi ser nekevin, koka tevgera Kurdan ya Iraqê paqij bikin. Divê mirov bi bîr bixe ku xala 23'an ya rêbaza Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê weha dibêje: «Em, li parçeyên Kurdistanê yên din, di rêya azadiyê û bidestxistina mafên xwe yên neteweyî de, piştgiriya doza milletê kurd ya rewa dikin».

Weha diyar dibe ku tevgera kurd di bernameya xwe de berê xwe dide hemû statukoya axî û civakî ya li Rojhilata Nêzîk, lewre doza kurd Dewletên iraqî, îranî û turk ber bi qeyraneke sazûmaniyê û federalîzmê ve diajo. Ev tevger hevkariyê bi hêzên van hersê welatan yên muxalif re dike û li dijî sînorên çêkirî ye ku ev sînor bûne sedema parçekirina Kurdistanê û bermahiyên siyaseta rojavayî ne, eynî wekî tevgera neteweperwer ya ereb ku li dijî balkanîzekirina Rojhilata ereb e. Tevgera kurd herweha armancine civakî yên dijwar jî danîne ber xwe, bi taybetî derbarê zeviyan de, ku heta nuha encamên baş nedane û dikarin, di dema bicihkirina dezgehên otonom ya li Kurdistana Iraqê de, navkokiyên civakî yên vê tevgerê derxin holê.

* Xwediyê tezeke doktorayê ye ku li Zanîngeha Sorbonê li ser mijara *Pirsgirêka kurdî* çêkiriye û roja 9'ê çileya pêşîna 1969'an bi awayekî fermî parastiye.

1 Di sîstema Iraqê ya îdarî de *lîwa*, *qeza* û *nahiye* hene ku ya herî mezin *lîwa* ye

2 Nota wergêr : *Liwa* û *qeza* di orjînala nivîsê de jî li gorî bilêvkirina wan a erebî hatine nivîsandin. Tên wateyên «herêm» û «bajar» Di nava Kurdên başûrî de peyva «lîwa» weke « parêzgeh » hatiye wergerandin. Di sîstema Iraqê ya îdarî de, navê herêmê ji navê serbajarê wê tê, weke parêzgeha Hewlêrê, parêzgeha Kerkukê û hwd

3 *The Kurdish Republic of 1946* (Komara kurd ya 1946'an), Oxford University Press. Londres, 1963. Zimanê kurdî, weke farisî, osetî, belûcî, tacikî, paştûya ku zimanê Afganistanê yê fermî ye û li herêma Paştûnistanê jî (li Pakistanê ye) tê axavtin, dikeve nava koma «zimanên îranî». Lê belê, weke ku zimannas dibêjin, mirov nikare wî weke zaravayeke farisî bipejirîne, digel ku helwêsta Îranê ya fermî dixwaze wî weha bide naskirin

4 *The Kurds-an historical and political study* (Kurd – lêkolîneke dîrokî û siyasî), Oxford University Press, Londres, 1966

Wergera ji fransî:
Îbrahîm Seydo Aydogan

## ALMANYA

# Serkevtineke qaşo a "şampiyona îxracatê"

TILL VAN TREECK *

Aborî bilind dibe bêkarî kêm dibe: sanayiya alman ji nû ve dest pê dike. Her çend encameke weha ji ber îxracatê ye û heqdest zêde nabin jî û rewşa karkiran ber bi başbûnê ve naçe jî, ev model, modeleke aboriyê a rehetkir e. Lê di dema dirêj de, ew ê çawa bibe? Pêkanîna stratejiyeke weha Ewropayê bi xetera xirabbûna hevkêşiyê re rû bi rû dihêle.



LMd arşîv

Rayedarên alman baweriyeke xurt bi hêzdariya aboriya xwe nîşan didin. Çi sosyal-demokrat û çi muhafizekar, herdu jî hevdu pîroz dikin ku di nava deh salên derbasbûyî de reformên strukturel pêk anîne ku welatê wan "di warê îxracatê de bûye şampiyona cîhanê" – vê şampiyoniyê sala 2009'an dilê Çînê xweş kir, ji xwe, Çîn hê jî di warê nirxî de li dunyayê îxracatvanê yekemîn e.

Dîsa jî, aboriya Almanyayê ji qeyrana aborî ya sala 2008'an û jihevdeketina bazirganiya cîhanî ya ku piştî wê hat, derbên xirab xwarin. Hilberîna welêt a brut (HWB) sala 2009'an ji sedî 5 kêm bû, tevî ku li welatên din ên Yekîtiya Ewropayê "bi tenê" ji sedî 3.7 daket. Tevî vê yekê jî, Almanya timî weke modeleke îstîqrarê di nava Yekîtiya Ewropayê de tê dîtin; bi taybetî jî dema ku mirov wê dide ber welatên keviya Yekîtiyê (Portugal, Îtalya, Yûnanistan, Spanya, Îrlanda). Weke mînak, mirov behsa bipîvanbûna lihevderneketina butceya wê bike ku di 2009'an de kêmî ji sedî 3'ê HWB'ya wê bû (di 2010'an de wê li der dora ji sedî 5'an be). Ev rêje li Portugalê ji sedî 8, Yûnanistanê nêzî ji sedî 14'an û li Fransayê ji sedî 8 e. Qaşo bi hewldanên xwe û disîplîna xwe ew bi ser ketiye û "baweriya bazarê" –heq kiriye. Yên din jî divê weke wê bikin.

Ev nirxandina qeyranê ku ji Renê û bi wê de şêwaza nirxandinê ya serdest e, xwe li ber azmûnan nagire. Heger aboriya herî mezin a Ewropî (ji çar paran yekê tevahiya HWB'ya herêma euroyê, ya wê ye) stratejiya mezinbûna aboriya xwe li ser hîmê îxracatê daniye, hingê hevnegirtin û bêdengetiyên peywendiyan dê bazirganiyê xirabtir bibin. Ew ê zorê li welatên din ên endamê Yekîtiyê bikin ku butçeya xwe bi ciddiyet kontrol bikin û mesrefên mûçeyan kêm bikin, da ku di warê aborî de karibin hevrikiya Almanyayê bikin. Dema ev tedbîr bi awayekî sîmultane hatin girtin, hingî xetere heye ku bibin sedema peydabûna xelekeke neyînî ku zêdebûna bêkariyê, deflasyonê û tansiyona civakî bi hev ve girê dide. Ev teşhîs bi tevahî bi ya John Maynard Keynes re li hev dike ku di rexneya wî ya merkantîlîzmê – doktrînek e ku sedsala 16'an hatiye bipêşxistin – de cih digire. Li gorî merkantîlîzmê, her netewe divê mêzîna xwe ya bazirganiyê ya bi lêçûnên welatên cîran re, baştir bike. Ev yek jî ji bo hevgirtîbûna tevahiya sîstemê, bi awayekî mecbûrî, dike ku daxwaza navneteweyî dakeve asteke gellekî kêm. Neo-Merkantîlîzma Almanyayê yekîtiya pereyan a ewropî bêîstîqrar dike. Dîsa jî ew heta 2009'an mijara konsensusekê bû, qet nebe heta 2009'an weha bû.

Sedemeke vê yekê ya baş jî hebû: Heta ku serokwezîr Gerhard Schröder cihê xwe da Angela Merkel, a ku hevsarê hukumeteke koalîsyonê ya ku tê de muhafizekar (CDU) serdest bûn girte destê xwe, Partiya Sosyal-Demokrat (SPD) bû ya ku di navbera 1998 û 2005'an de Almanya bi rê ve dibir. Ji bo SPD'ê zehmet e ku lê mikur were, "reformên strukturel" ên ku di çarçoveya bernameyeke berfireh a bi navê "Agenda 2010" de sala 2002'an dest pê kirin, kirin ku berxwuriya hindur a Almanyayê kêm bibe û hevnegirtin peyda bibin. Di hilbijartinên federal ên 2009'an de namzetê SPD'ê Frank-Walter Steinmeier "Plana ji bo Almanyayê" ji raya giştî re eşkere kir. Di vê planê de Steinmeier weha pesnê serketina Agenda 2010'ê dide: "*Ji 1998'an û pê ve, me sosyal-demokratan Almanya modernîze kir û hêza wê ya hevrikiya aborî ya navneteweyî ji nû ve xurt kir. Bi hevkariya bi pardarên civakî re, bi xêra hewldanên kêmkirina mûçeyan, ji me hat ku em bikin şîrketên me (û berhemên me) di bazara cîhanê de di rêza pêş de bin. Welatê ku çapemeniya navneteweyî beriya bi deh salan navê "nexweşê mezin yê Ewropayê" lê dikir, veguherî lokomotîfa Yekîtiyê û pêşiya wê dikişîne.*"

Navê şermiyê ku li betalkirina kontrola mûçeyan a bazara kar hatiye kirin, "modernîzasyon" e; vê "modernîzasyonê" di salên 1990'î de dest pê kir û bi bandora Agenda 2010'ê jî bi leztir bû. Yekane kêrhatîbûna ew e ku para mûçeyan a di dewlemendiya neteweyî de kêm bike û newekheviyan zêdetir bike. Di axaftineke xwe ya di Foruma Aborî ya Cîhanê ya li Davosê ya 2005'an de, serokwezîrê hingê Gerhard Schröder bi kurtî ev yek weha dianî zimên: "*Me sektoreke veşartî ya bazara kar ava kir ku tê de mûçe kêm in. Me herweha sîstema mûçeyê bêkariyê guherand, da ku zoreke bêhtir a vegera ber bi kar ve li mirovan bike.*" Li gorî pêşniyarên Konseya Analîzên Aborî ya Alman û pirraniya pisporan, hukumet hê jî qebûl nake ku mûçeyê asgarî yê qanûnî diyar bike, lewra ditirse ev yek bike ku zexta li ser mûçeyan kêm bibe. Ev tercîh û li ser hev redkirinên ku peymanên şîrketan heta bi şaxên wan werin belavkirin, bi hev re armanca wan jihevdexistina sîstema peymana giştî ya kar e; ev sîstema peymana giştî a kar piştî şerrê cîhanê yê duyem ketibû pratîkê. Bi vî rengî, weha xuya dike ku hukumeta alman û şêwirmendê gellekî bi tesîr Hans-Werner Sinn hemfikir in. Sinn sala 2009'an ev texmîn dikir: "*Pêkhatina sektoreke mûçeyên kêm û gellekî kêm, ne ku têkçûyina Agenda 2010'an, berevajî serkevtina wê piştrast dike* (1)."

### Neyeksanî, xizanî, paşdeçûna dewleta sosyal mûcîzeya Rhenan pûç kir

Ji bo yên ku serê xwe bi aboriya Almanyayê ya deh salên dawîn diêşînin, weha xuya ye ku ji daneyên berbiçav bêhtir, ev vîzyona xweşbîn xwe di serî de disipêre baweriyên nîzama îdeolojîk. Di nava herêma euroyê de, bi Almanyayê re Îtalya jî bi mezinbûna herî kêm kete sala 1999'an û 2007'an. 1999 sala destpêkirina pereyê hevpar euroyê bû û 2007 jî sala beriya qeyrana heyî bû. Aboriya wê li gorî ya Fransayê, Spanyayê û yan jî Îtalyayê hindiktir derfetên kar afirandin (eger em cûdatiyên HWB'ê li ber çavan bigirin, di warê afirandina derfetên kar de, ev paşvemayîn dewam dike). Heta dewra refahê ya di navbera 2005 û 2008'an de jî ku hin berpirsiyarên siyasî xwe jê venedan û weke "mucîzeya nû ya aboriya alman" bi nav kirin, di heman dewrê de û di destpêka vê mîlenyûmê de Almanyayê li gorî Fransayê (weke encama bi qanûnan diyarkirina hefteyê 35 saetan kar) hindiktir derfetên kar afirandin.

Di heman wextê de qelşa ku dewlemend û xizanan ji hev qut dike ewqasî bi lez mezin bû ku Saziya Hevkarî û Pêşketina Aboriyê (OECD) jî pê êşiya. Raporeke OECD'yê tesbît dike ku di navbera 2000-2005'an de "*newekheviya mûçeyan û xizanî li Almanyayê ji hemû welatên din yên OECD'yê bi leztir zêde bûne* (2)." Tevî başbûna aboriyê ya di navbera 2005 û 2008'an de jî, pîvana xizaniyê ku weke "rêjeya Gini" tê binavkirin û bi zêdebûna newekheviyê re ew jî zêde dibe, li Almanyayê çar puanan bilind bû. Beridîneke bi heman rengî mirov dikare qismî bi rakirina kontrola mûçeyan a di bazara kar de jî rave bike, ku bû sedem mûçe weke xwe bimînin û heta kir ku mûçe kêm bibin – herweha di *boom* (dewra bi carekê başbûna aboriyê) a ji 2005'an heta 2008'an de jî. Sedemeke rewşê jî ew e ku alîkariya civakî û mesrefên gelemperiyê bi awayekî giştî kêm bûn. Bi vî rengî, li gorî daneyên Komîsyona Ewropayê, Almanya li dunyayê tevî Japonyayê yekane welat e ku lêçûnên dewletê – piştî ku enflasyon jî li ber çavan hat girtin – di navbera 1998 û 2007'an de *kêm* kirine. Di herêma euroyê de em Almanyayê jî pê re hesab bikin, di nava heman salan de mesrefên dewletê ji sedî 14 zêde bûne... Ev piçûkbûna dewletê encama kêmkirinên bacên girîng e ku bi kêrî şîrketan û dewlemendên ku bac li ser wan ferz e, tê. Daxwaza xurt û hişk a "lihevderxistina butçeyê" û kêmkirina deynên dewletê jî sedemên vê piçûkbûna dewletê ne.

Kontrasteke zêde tê bilêvkirin a di navbera aboriyeke hundir a gellekî yekreng û neenerjîk û sektoreke îxracatê ya gellekî dînamîk, para bêtir encama vê siyasetê ye. Di navbera 1999 û 2007'an de Almanya yekane welatê herêma euroyê bû ku ji aboriya hundir bêhtir, îxracatê bi awayekî erênî tesîra xwe li zêdebûna WHB'yê kir. Ji ber kêmbûna mûçeyên reel û hîsa neewlebûnê ku reformên bazara kar û sîstema parastina civakî bûn sedem, mesrefên mal (malbat) dikin pirr kêm dimînin. Herweha bandora mesrefên ku dewletê li mezinbûna aborî kirine, di nava welatên endamên Yekîtiyê hemûyan de ya herî lawaz bû.

Bê guman, "modernîzekirina mûçeyan" hêzê dide hevrikiya îxracata Alman. Lê belê, gelo zirara ku ev yek

li Ewropayê dike çi ye? Di çarçoveya yekîtiya darayî de, qelşa cudahiya hevrikiya di navbera welatan de êdî nabe ku bi devaluasyonên qaşo (bi tenê navlêkirî) li hev were derxistin. Weke encam, beridîna buhayê heqdestê karkirekî (peywendiyeke xurt di navbera wê û rêjeya enflasyona neteweyî de heye) di navbera welatan de ji hev cihê ye, hin jê bi awayekî mekanîk di hevrikiyê de li gorî yên din bi ser dikevin. Lê belê, di navbera 1999 û 2007'an de buhayê heqdestê karkirekî li Almanyayê kêmtirî ji sedî 2'an zêde bû, tevî ku li Yûnanistan, Îrlanda, Portûgal û Spanyayê ev rêje ji sedî 28 ta 31'ê zêde bû. Ev yek îşaret pê dike ku welatên din hemû di warê hevrikiyê de li hemberî Almanyayê têk çûn û herweha nîşan dide ku li Almanyayê enflasyoneke kêmtirî deverên din hebû, rêjeya faîza reel li wira bilindtir bû. Vê yekê jî daxwaza kirrînê di bazara hundir de kêmtir kir.

### Şampiyona îxracatê, rewşa partnerên xwe yên aborî xerab dike

Li Fransayê bi xwe jî ku buhayê heqdestê karkirekî di navbera 1999 û 2007'an de ji sedî 17 zêdetir bû (ku kêm û zêde li gorî rêjeya enflasyonê ye ku Bankaya Navendî ya Ewropayê weke hedef diyar kiribû), mêzîna bazirganiyê ji 1999'an heta 2003'an li xwe zêde dikir, paşê mêyla wê çû aliyê zirarê - û piştre jî bi tevahî aliyê zirarê giraniya xwe nîşan da.

Belê, hedef ji hevnegirtina butçeyê bêhtir, êrîşên spekulatîf ên bihara bihurî girêdayî bêdengetiyên mêzîna bazirganiya welatên ewropî bûn. Di navbera 1999 û 2007'an de hevnegirtina butçeya Spanyayê ya dewletê tu carî ji sedî 3'an nebihurî – sînorê ku ji aliyê peymana Maastrichtê û Pakta Ewropî ya Îstiqrar û Mezinbûna Aborî ferz dikin (ji bo ku em bidin ber hev, em li vira bêjin ku Almanyayê ev pîvan di navbera 2002 û 2005'an de pêk neanî). Ya ji vê jî çêtir ew bû ku di vê demê de deynê gelemperiyê li gorî HWB'ê ji sedî 62'an dakete ji sedî 36'an (li aliyê din li Almanyayê ev rêje ji sedî 61'ê gihişte ji sedî 65'an) û dewletê di navbera 2005 û 2007'an de berhêmên zêde jî bi dest xistin. Di beramberî vê de di sektora taybet de (malbat û şîrket), mesref bi awayekî sîstematîk ji hatinên aborî bihurîn, sedema vê jî bi awayekî pirr bi lez buhabûna xanî û milkan bû ku, ya ku hin salan gihişte ji sedî 12'ê WHB'ê lihevderneketineke sabît bû. Mêzîna di navbera dewletê û sektora taybet de bi awayekî zelal negatîf bû, deynên giştî bi nisbetên mezin zêde bûn. Dema ku balona deyndariya sektora taybet diteqe û bêkarî bi carekê de gellekî zêde dibe ji 2008'an û pê ve, dewleta Spanyayê neçar ma ku dayina deynên ku doza wan tê kirin, bigire ser milên xwe û hê jî ne mumkin e van deynan bide.

Ev yek jî Spanyayê neçar dike ku bi miqdarên mezin pereyan deyn bike. Bi awayekî ciddî bazar ji îhtîmala rizgarkirina Spanyayê gumanan dikin. Rewş li Îrlandayê jî bi heman rengî ye. Li Îrlandayê di navbera 1999 û 2007'an de deynên dewletê ji sedî 49'an daketin ji sedî 25'an, lê belê di heman demê de deynên sektora taybet jî zêde bûn. (Li Yûnanistan û Portugalê jî demeke dirêj hatin û lêçûnên dewletê li hev dernediketin, lê dîsa jî ji deyndariya sektora taybet kêmtir bû.) Ango yên ku zirarê li îhtîmala rizgarkirina welatekî dikin û wê li spekulasyonên malî vedikin, ji lihevderneketina butçeya dewletê bêhtir, lihevderneketinên bazirganiyê ne ku herweha sedema deynên derve ne jî.

Yanî, rayedarên alman şaş in dema ku "reformên strukturel" mîna ku welat di çavên kes û saziyên pereyan razînin de "biîstîqrartir" û "ewletir" kiribe, pîroz dikin. Xurt xuyakirina Almanyayê ji serkevtineke qelp pê ve ne tiştekî din e. Eger em ji Plutark bawer bikin, dema ku ji bo serkevtina wî ya nû ya li dijî Romayê xelkê ew pîroz dikir, melikê Epîrê weha peyiviye: "*Eger em careke din bi vî rengî bi ser bikevin, hingê Xwedê ji me stand!*" Lewra wî di şerr de beşekî mezin ji hêzên xwe, pirraniya fermandarên xwe yên leşkerî û hevgirên xwe wenda kiribûn.

Rewşa Almanyayê jî ne cuda ye: serkevtina wê ya di şerrê globalbûnê de bi buhayekî giran hate bidestxistin. Serê pêşî, di warê civakî de bi carekê zêdebûna newekheviyê û xizaniyê, kêmbûna mûçeyên reel – ji bo çîna navî bi xwe jî. Di warê siyasî de jî li gorî pîvanên ewropî, lewma hevgirên wê yên herî baş hevîrê encamên neo-merkantîlîzma alman disitirin û her ku diçe bêhtir bi awayekî aşkere ji piştgiriya ewropî ya Angela Merkel gumanê dikin. Ya rastî, stratejiya alman ya ku xwe bi tenê disipêre îxracatê, ne mumkin e ku serkevtî bixebite eger tevahiya hevparên wê zêdekirina hevnegirtin û deyndariya xwe ya bazirganiyê dewam nekin. Ev jî weke ku me li jorê behsa wê kir, sedema qeyrana heyî ye. Mirov bi awira hişk a berjewendiyên neteweyî jî lê binêre, karekî kelevajî ye ku mirov bibe "şampiyona cîhanê yê îxracatê" da ku, paşê, gazindan ji buhayê tevdîrên rizgarkirina welatên ku ji derve dikirrin, bike. Ev tevdîr ji ber deynên ku hew dikarin werin dayin mecbûrî ne (bêhtirî ji sedî 40'ê îxracata Almanyayê ber bi welatên herêma euroyê ve ne). Heger aboriya wê ya herî hêzdar, ewqasî hindikî para xwe li daxwaza global zêde bike, yekîtiya darayî nikare demeke dirêj bikêrhatî bixebite. Ev dersek e ku divê ji analîza ku Keynes li ser şerrên bazirganiyê kiriye, bigire. Di pêncî salên destpêkê yên sedsala bihurî de, van şerrên bazirganiyê Ewropa parçe kirin û ji hev dirandin.

Sosyal-Demokratan ji xwe va ye dest pê kiriye û doktrîna xwe di ber çavan re derbas dikin. Di plana ji bo Almanyayê ya sala 2009'an de, SPD'yê bi gotinên nîv bilêvkirî, lê mikur tê ku "*beramberî serdestiya alman, di qada hevrikiyê de berxwuriyeke lawaz heye. […] Wê pêwîst be ku parvekirina hatinên aborî bi awayekî wekhevtir pêk were û pererazandinên li qada dewletê werin bipêşxistin*". Li aliyê din, muhafizekarên ku Merkel pêşengiya wan dike tu meyila ku berê siyaseta heyî biguherin jî, nîşan nadin.

* Aborîzan, Institut für Makroökonomie und Konjunkturforschung – IMK (Enstîtuya Lêkolînên ekonomiya makro û Konjonkturê) ya Weqfa Hans Böckler.

1 Hans-Werner Sinn et al., "Die Agenda 2010 und die Armutsgefährdung (Agenda 2010 û xetereya xizaniyê)", *Ifo Schnelldienst*, Munich, hejmar 17, 2009, rûpel 23-27

2 OECD, "Growing Unequal? Income Distribution and Poverty in OECD Countries. Country note: Germany (Newekhevî zêde dibe? Parvekirina hatina maddî û xizanî li welatên OECD'yê. Welatê ku bêhsa wî tê kirin: Almanya)", Paris, 2008

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

FRANSA

# Pirsgirêkên civakî û derdê ewlekariyê

LAURENT BONELLI



LMd arşîv

Déjà vu". Rêzebûyerên tîrmeha bihurî li Grenoble û Saint-Aignan (li Loir-et-Cher, herdu jî bajarên Fransayê ne) rû da, vê hesta kezebşewat bi mirov re çêdike. Ciwanên gihayî dema hewl didin ku ji hêzên ewlekariyê birevin dimirin û pê re li cihê ku lê diman şîddeta kollektîf bi carekê dest pê dike. Hukumet biryardariya xwe ya hişk di şerrê li dijî sûcan û herweha planeke nû ya çalakiyê, dide zanîn. Anket nîşan didin ku hîmê vê biryarê zexm e. Hin parlemanterên muxalefetê, întelektuel û komeleyên parastina azadiyan, mubalexekirina tedbîrên ku li ser wan tê fikirîn protesto dikin. Ji sîh salekî û bi vir ve, tim cîh û beşdar diguherin, lê belê bingeha meseleyê bi qasî ku mirovan matmayî bihêle weke xwe dimîne. Gelo tu tişt nehatibû kirin? Wezîrê karên hundir Brice Hortefeux weha rave dike: "*Şerrê ji bo ewlekariyê tevahiya qelşên ji berê ve mayî ji hev de dixe. Li aliyekî yên ku rastiyan dibînin û li gorî vê gavan diavêjin hene – li aliyê din yên ku rastiyan înkar dikin da ku tu tiştî neguherin. Em têra xwe wêrek in ku rastiyê bibêjin, em bi israr in ku kirinên xwe pêk bînin û li ser me ferz e ku em encaman bi dest bixin.*" (*Le Monde*, 22-23'ê tebaxa 2010'an). Kêm caran dilxwazî xwe mîna li ser vê mijarê bi ewqasî dildariyê nîşan dide. Ji bo ku em karibin li ser bibin xwedî hukmekî: di navbera 2002 û 2010'an de ne kêmî sêzdeh qanûnên taybet ên li ser vê mijarê li parlamentoyê hatine erêkirin; bêhtirî çil xalên qanûna dozên cezayan û bêhtirî sîh xalên qanûna cezayan hatine guhertin. Û hukumeta fransî û endamên Yekîtiya Tevgera Gelî (Union pour un mouvement populaire – UMP) îro pêşniyar dikin ku bi qanûnên cezayan, dê û bavên ku zarokên wan ên nebîrbir ku du caran heman sûcan bikin, werin cezakirin, hin sûcdar ji welatîbûnê werin derxistin, sê sed wargehên neqanûnî yên Romanan beriya çiriya pêşîn werin hilweşandin û heta şaredariyên ku "*li gorî ferza xwe ya pêkanîna ewlekariyê tev nagerin*" jî werin cezakirin.

Ji bo çi enflasyoneke bi vî rengî? Li gorî hinan, dibe ku armanca ji nû ve derketina pêş a nîqaşa li ser ewlekariyê ew be ku mijarine din bide jibîrkirin: tesîrên qeyrana aborî yên civakî; vejîna gellek beşên "skandala Woerth"; yan jî projeya ku nayê hezkirin a reformên sîstema teqawîtbûnê. Ev ravekirin têrê nake. Ji dawiya salên 1990'î û bi vir ve li Fransayê û herweha li Brîtanya û Belçîkayê jî, "neewlebûn" bi serê xwe di asta "kategoriya aboriyê" yan jî ya "civakî" de, bi tevahî, bûye kategoriyeke siyasî, belê ya rastî ew berê di nava van herdu kategoriyan de bicihkirî bû. Wê xwe xweser kir û heta di nava gel de, xwe weke yek ji şêwaza li pêşgirtî yê axivîna li ser rastiya rojane ferz kir. Bi heman rengî di axaftineke ji xelkê re ya 18'ê adara 2009'an de Nicolas Sarkozy weha dipeyivî: "*Neewlehî di nava newekheviyan de ya herî li pêş e, neheqiya herî xirab e: bi tevahiya hêza xwe qamçiyê xwe li yên herî lawaz, herî şepirze, li yên ku ji wan nayê di taxên xweş de bi cih bibin, dixe.*" Serokkomarekî ku ji destpêka erka xwe û pê ve xwe ji yên beriya xwe bi mertalê li dijî bacan cihê kir – ev mertal dewlemendan ji êş û azara ji nû ve belavkirina bacan diparêze – ev gotin kirin. Ev yek jî vê pêşniyarê balkêş dike.

Dîsa jî ji hingê ve, çepgir jî di navê de, ev raman parçeyekî hîsa siyasî ya hevpar e. Di Partiya Sosyalîst (PS) de krîmînalîte demeke dirêj weke encama newekheviyên civakî dihat dîtin û hê jî weke yek ji prensîbên wan ên bingehîn tê qebûlkirin. Serokwezîrê berê Lionel jospin weha rave dike: "*Girseyên gel înkar nakin ku sedemên bingehîn ên krîmînalîteyê hene*: *malên hejar, şert û mercên jiyanê yên perîşaniyê, nebûna kar û cihêkarî.* (…) *Lê belê, ew herweha dizanin ku gellek dem jê re divê ku mirov tiştekî li dijî van sedeman bike û ew nikarin xwe li vê demê bigirin* (1)." Ev cudakirina "neewlebûn" û pirsên civakî û aborî ji bo ku mirov nîqaşên ku nuha tên kirin fahm bike, diyarker e. Ya rastî, piştî ku em kar û xebata li ser çavkaniyên krîmînalîteyê taloqî siberojeke nediyar bikin, ya ku li ber destê mirov dimîne bi tenê ew e ku mirov berpirsiyariya şexsî ya sûcdar (heta ya dê û bavên wan jî) bike hîmê sereke yê mudaxeleya dewletê. Fîlozofiyeke bi vî rengî lîberal ku civakê weke li pey hev rêzkirina aktorên mentiqî yên azad û wekhev dibîne, li gorî hesabê mesref/kar tev digere, hertiştî di nav daxuyaniyên mîna yên Eric Ciotti, sekreterê giştî yê UMP'yê ku ji ewlekariyê berpirsiyar e û Julien Dray, parlemanterê sosyalîst ê Essonneê, dadike. Ciotti dibêje "*tevdîra herî baş a pêşîlêgirtinê, di serî de tirsa ji cezayan e*" (*Le Figaro*, 10'ê tebaxa 2010'an) û Dray jî 16'ê tîrmeha 2002'an li pêşiya Parlamentoya Neteweyî got: "*Mirov cihê ku lê ji dayik bûye hilnabijêre, lê jiyana xwe hildibijêre – û van mirovan jiyaneke weha hilbijart ku bibin sûcdar.*" Dîsa jî, mirov bi vî awayî kesan îzole bike, hingê rê li ber tê girtin ku sîstema têkiliyan a ku, sûc jî di navê de, kirinên kesan watedar dibin, were fahmkirin.

Hortefeux zend û ben d badane û ketiya nav kar û barê "*şerrê li dijî*

*bazirganiya narkotîkê û çeteyan*". Dîsa jî, gelo aboriya neqanûnî û kombûna "ciwanên keviyên bajaran" xwe disipêre çi? Ya pêşî, li ser hîmê xizanî û neparastîbûna civakî kat dide û dewlemend dibe. Dema vê dike jî li gorî tax û kêliyan xisleta wê diguhere; bazirganiyeke tevlihev a karê qaçax, pevguherîna mal û xizmetan bêyî bikaranîna pereyan, ji nû ve firotina narkotîkan, dizî û bazirganiya qaçax e. Ev aboriya nefermî ku ji aliyê endamên civaka meşrû (yên ku maddeyên neqanûnî yan jî berhemên serfkirinê ji xwe re peyde dikin) ve tê bikaranîn (2), bêguman çavkaniyan dide kesên ku pê radibin. Lê belê, ew herweha nîşana xwe xilaskirina ji qutbûn û bêrûmetiya xisleta hejariyeke girseyî ye ku derbê li beşên herî kêm perwerdebûyî yên girseyên gel dixe.

Ev yek ji bo "çeteyan" derbas dibe. Ev çete, pirrî caran herikbar û demî bin jî, ji bo hin "ciwanên heta hetayê" ye (yên ku ji wan nayê ku karekî bi îstîqrar peyda bikin, xweseriya xwe ya ji malbata dê û bavan bi dest bixin û malbateke bi zewacê ava bikin) li beramberî redda cîhana kar û dibistanan alternatîfeke baweriyê dide û herweha derfeteke *rêzdarbûnê* ye jî (3).

Ev du-cîhanên aborî û sembolîk rave dikin ku dema ku mirov doza derfeta tunekirina van fenomenan li polîsan bike, hingê ofbûn û bêzarî serdest e. Li gazindên ji berê ve yên li dijî dadgerên ku qaşo, sûcdaran, çerr ku tên girtin berdidin, êdî gazindên nû zêde dibin ku bi peyvên "*çare tê de nîne*" yan jî "*karê Sîsîf*" tên îfadekirin. Heger em berê xwe bidin saziyên dadgeriyê, ceza êdî li gorî berê zêde hişk in û di temenê piçûk de dest pê dikin. Çawa ku gellek dadger û dozger jî lê mikur tên, êdî ji saziya dadgeriyê nayê ku rêyê li ber bigire ku kesên sûcên piçûk dikin û tên ber wê, dev ji van sûcan berdin.

Rastî bi israr in û nîqaşa bêdawî ya li ser berpirsiyariya şexsî nikare nebîne ku sedema vê rewşê şêwazên modern ên rêxistiniya gelê xizan e ku encama qeyrana civakî û aborî ya sîh salan e. Dîsa jî mijar ne têkçûyineke hêsan a tercîha polîsiye û dadgeriyê ye ku dê vegera ber bi *statu quo ante* (statukoya berê) ve mimkun bike. Her tevgera aliyekî di şêl û tevgera yê din de xwedî rol e û bandorê li tevgerên wan ên pêş dike. Sarkozy bi qêrîn xweş got: "*Hin kes şîddetê bi mudaxeleya polîsan a li taxên keviya bajêr ve girê didin. Lê belê, ya rastî, ev dunyaya berevajî ye!*" (daxuyaniya 18'ê adara 2009'an). Stratejiyên polîsiye têra xwe para xwe li pirsgirêka ku ne ji xwe ve ew şerrê wê dikin, zêde dikin (4).

Pirraniya berpirsiyarên polîsan ên payebilind ku li ser wan liv û xebata li dijî tevliheviya civakî û krîmînalîteya ciwanan hatiye ferzkirin, li ser vê yekê hemfikir in: bi tenê polîsekî li deverê darîçav û dewamî dikare bi rolekî kêrhatî rabe. Polîsekî ku jê tê ku kesên aramiyê xera dikin ên potansiyel nas bike û gellek aksiyonan bike û tedbîran bigire (ji gefxwarinê heta tepisandinê, hişyarkirin û îxtarên cihêreng jî di navê de), lewra rewa tê dîtin ku polîs dikare van bike. Ev, fikra "community policing" e weke ku em dikarin li Chicago, Brîtanya û Hollandayê bibînin û bi reformkirina polîsê nêzîk (1998-2003) li Fransayê jî hate bicihkirin û paşê bi rengekî şermokîtir ji 2008'an û pê ve bi Yekîneyên Herêman ên Taxan (UTEQ) dewam kir û beriya demeke kurt navê Tûgayên Pispor ên Qadê (BST) li wan hat kirin.

Lê belê, li vir hê jî em bi vegereke tetmînnebûna aborî re rûbirû ne. Organîzekirina polîsan ji rêxistinên giştî yên hukumeta dewletê qut û serbixwe pêk nayê. Di çarçoveyekê de ku krediyên dewletê û hejmara karmendan gellekî tên kêmkirin, zehmet e ku mirov şêwazeke çalakiyê ku ewqas personel jê re divê, teşwîq bike. Eger em derbarê mijarê de şaş nebin, hukumetê dev ji reforma sala 1998'an berda û sedema wê ya sereke jî kêmbûna derfetên maddî bû û xetere heye ku aqûbeta BTS'an jî bi heman rengî be. Heta, eger hejmara polîsên wezîfedar neguhere jî – lê rewş ne ev e, heşt hezar kar divê di navbera 2009 û 2014'an de werin jêbirin – mirov fahm nake ka çawa dê mimkun be ku li qereqolan polîsan bineqînin da ku wan li yekîneyên ku dê dewriye bigerin, zêde bikin.

Niha berê awiran ketiye ser yekîneyên mudaxeleyê yên weke Tugayên Dijkrîmînalîtê (BAC), yên ku dikarin bêhtir çalakiyan bikin: du komên BAC'ê têrê dikin ku bîst qadên herêmeke polîsan kontrol bikin, tevî ku bi awayekî teorîk *serê* qadekê sê polîsên dewriye pêwîst in. Ango, di demeke diyar de şeş kes li dijî şêstî… ji bo ji hev belavkirina pevçûnekê, di ser sûc de girtina xirabkaran gellekî kêrhatî ye; bi her rengî, di halkirina bêdisîplîniyên ciwanan ên piçûk de ev yekîne gellek zehmetiyan dikşînin. Ya rastî, gellek caran neçar dimînin bêyî ku sûcek hebe çalakiyeke tepisandinê û bêyî ku qanûn were binpêkirin, kontrolekê bi rê ve bibin; pirrcarîbûna vê jî dike ku komên bi van kirinan re rûbirû dibin, kêmtir baweriyê bi wan bînin û bi guman nêzîkî wan bibin. Ev yek xwe bi zêdebûna heqaretan û heta serhildêriyan dide der ku hejmara wan di nava deh salan de du caran li berê zêde bûye. Kombûnên sîstematîk ên dema kontrolê (ji bo ku "zextê bikin") heta "kevirkirina" erebeyên polîsan ên dewriye digerin bersivek e li dijî kontrolkirinên nasnameyan yên belesebeb û pirrcar, çavtirsandin, piçûkxistin û heta derbkirinan.

Di rewşeke weha de ku hejmara polîsan kêm e, bi şidbûna van têkiliyên li jor, weha xuya dike bi tenê rêyek ji xwe re peyda kiriye û ew jî ew e ku pirr zêde girîngiyê bide teknolojiyê. Armanca kirîna *flashball* (5) û *taser*an ev e, ku bikaranîna wan aloziyên di navbera aliyan de zêdetir dike. Bi vî rengî, em dikevin nava dînamîkeke rikberiya hêzê ku tê de "mîlîtarbûna" mudaxeleya polîsan dibe sedem ku astên şîddetê zêde bibin, çawa ku me sala 2007'an di dema îsyanên Villiers-le-Belê de dît yan jî di asteke kêmtir de di yên Grenoble'ê de.

Di van şert û mercan de nîqaşên li ser ewlekariyê, têkçûyina xwe bi xwe jî di nava xwe de vedihewînin, lewma ew xwe weha nîşan didin ku ew ê liv û tevgerên ku gellekî kêm dikarin kontrol bikin, ji holê rakin. Mijarek bi tenê dimîne û ew jî zêdebûna gotinan û qanûnan e. Lê belê, ev zêdebûn bi rexneyên muxalefetekê re rûbirû ne ku dikare bê zehmetî danezanan û encaman bide ber hev. Bi vî rengî, sekretera wê ya sereke Martine Aubry jî di nav de, hin birêvebirên PS'yê ji niha ve hukum dikin ku pêwîst e ku vegerin ser mijara parastina azadiyên raya giştî (weke mînak di nîqaşa li ser binçavkirinan de) û xwe ji fîgurên partiyê ên herî "ewlekarîparêz" yên mîna Manuel Valls bi dûr dixin (6).

Ji nû ve pêkanîna mêzîna di navbera polîsê "taxê" û yê "mudaxeleyê" de û herweha adeta ku kêfa xwe zû ji qanûnên cezayê re tîne, pêwîst bin jî, dê têra çareserkirina alozî û pirsgirêkên reel ên di nava girseyên gel ên xizan de nekin û herweha bi kêrî dîsîplînekirina beşên wan ên ku herî kêm tên kontrolkirin jî neyên.

Bi tenê ji ber ku bi awayekî berfireh di nava hebûna rojane ya şexsan de, li kar, li taxan, li dibistanê, li malê, li dêrê, li partiyê û sendîkayê bi cih bûne, disîplînên civaka pîşesaziyê dikarîn bi kêr werin. Encama wan girêdan û baweriya zêde ya bi mecbûriyetan bû û rewabûna wan jî bi awayekî berfireh girêdayî *berdêlan* e ku li ser kesên ku ev disîplîn di ser wan re pêk tên, ferz dike (7). Wekî din, gellek ciwan xwe ji cezayê karê bi zorê xilas dikin. Berdêlên ku cezayên herî kêm bi xwe re anîn, wezîfedarkirina polîsên dewriye digerin – "yên nêzîk" jî bin – yan jî qanûnên dij-çeteyan, xuya ye ku bi kêr nayên. Berevajî vê, ev tevdîr weke hişkbûna disîplînî ya yekalî û bêyî derfeta telafîkirinê xuya dikin. Weke zalim û cihêkar tên dîtin û ji ber vê jî îhtîmaleke mezin e ku werin redkirin, çawa ku teqînên geh li vir û geh li wir didin der yên ku rojevê dixemilînin nîşan didin (ji Vaulx-en-Velinê heta bi Clichy-sous-Boisê, ji Mantes-la-Jolie heta bi Grenoble'ê) yan jî bi awayekî rojanetir girîftbûna têkiliyên di navbera saziyan de (dibistan, polîs, xizmetên şaredariyan, xizmeta birinûanîna xelkê) jî vê yekê nîşan dide.

Eger çetevaniya mezin, bênîqaş, karekî polîs û dadgeriyê ye, hingê belkî êdî dem hatiye ku em cudakirina di navbera sûcên piçûk û civakê de ji holê rakin û wê ji nû ve di nava civakîbûnê de bi cih bikin. Divê em herweha bînin bîra xwe ku yekane şêwaza birêvebiriyê bi rêya neewlekariyê ya ku demeke dirêj bi awayekî kêrhatî dewam kir, îcada çîlexaneyên dîndarên katolîk ên sedsala XII'an e (8). Derxistina pêş a qadeke hevdîtinê di navbera dojeh û buhiştê de, ya rastî, navgîneke sereke bû da ku li Rojavayê desthilatdariya dêrê were rûnandin. Lê belê, li gorî mijara şerrê li dijî krîmînalîteyê, xetereya ku rastî mirovî xelet derbixin, kêmtir bû.

1 Lionel Jospin, *Dunya wekî ku ez dibînim* Gallimard, Paris, 2005, p. 249

2 Alessandro Dal Lago û Emilio Quadrelli, *La Città e le Ombre. Crimini, criminali, cittadini*, *Feltrinelli*, Milan, 2003

3 Gérard Mauger, *Kom û hawîrdor û populasyona roma. Lêkolîna li ser guherîna ciwanên çînên populer* (1975-2005), *Belin*, Paris, 2006

4 Hejmara wan ku di 1998'an de 32 038 bû di sala 2008'an de derket 57 903. Serçav: "Cureyên sûcdarî û qebahatên ku li Fransayê tên dîtin". *Arşîva Fransayê*, Parîs

5 Di serî guleyên plastîk û ya duduyan jî çeka ku bi şîddeta 50 000 voltan şoka elektrîkê dide

6 Binihêrin: wekî mînak gotara Jean-Jacques Urvoas, Nûnerê Finistère û sekreterê ewlekariya neteweyî ya PS'ê. *Ji ewlekariya dewletê ber bi ewlekariya gel*, *Fondation Jean-Jaurès*, Paris, 2010

7 Binihêrin: "Fransa di nav tirsê de ye. Dîroka civakî ya bêEwlekariyê", *La Découverte*, Paris, 2010 (çapa nû ya berfireh)

8 Jacques Le Goff, "Destpêka Qiyametê", *Gallimard*, Paris, 1991

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Ji Berlînê heta bi Chicagoye

# Li gorî elîtan şerrê çînan

Noëlle Burgi

Almanyaya derdar vê pêlê pê mijûl e ku îmaja neteweya ku di warê aborî de dewlemend e, xurt bike. Belê, aliyê veşartî yê dewlemendî û refaha wê ji aliyê cîranên wê ve baş nayê zanîn. Bi taybetî jî li Fransayê, welatê ku anket û lêkolîn gellek caran fikra "taybetmendiyeke" neteweyî piştrast dikin: di nava welatên pêşketî de, ya ku têkiliyên nava kar lê herî zêde dijminane ne, Fransa ye. Bêguman di dema nêz a bihurî de, xwekuştinên karmend û karkiran, yên li pey hev, bi taybetî yên şîrketa *France Télécomê* (1), hebûna dunyayeke bi rastî jî bi nexweşiyê ketî, piştrast dike (2). Dîsa jî Fransa ne "îstîsna" ye: Li gorî rojnamevan Günter Wallraff (3), neewlebûna kar, xirabbûna şert û mercên kar û muameleya xirab a bi karkir û karmendan re hemû "*stratejiyeke rastî ya şerrê çînan a ku bi destê elîtan tê birêvebirin*" pêk tînin.

Wallraff ê ku bi rêbazên xwe yên lêkolînê ve navdar e, heyşt lêkolîn weşadin ku li seranserê Almanyayê hatine meşandin. Pirraniya caran, wî xwe xistiye kirasê endamekî komên civakî ku mijara lêkolîna wî bûn û bi xwe rasîzma rojane ya asta jor a ji aliyê hemwelatiyên xwe ve ceribandiye. Wî herweha rewşa mirovên ku xaniyekî wan yê diyar nîne û di marjînalîteyeke weha de ne ku ji aliyê birêvebiriyê ve ecêb tê kontrolkirin, cerribandiye û dîtiye bê ka çawa tên redkirin û li rastî gellek hevrêyên xwe yên bextreş hatiye ku demekê gellek ji wan karmend an jî karkir bûn û bûbûn mexdûrê qezayeke kar. Wî şahidiyên li ser mêhtina keda karkirên di nanpêjekî îndustriyel de, di xwaringehên dewlemendan de û di kafeyên Starbucks de kom kirine. Di navendeke bersivdayîna telefonan de kar dibîne, "*çanda birêvebiriya şîrketan a mafyawarî*" rave dike ku xwe bi "*xelekeke dek û dolaban*[…] *ku veguheriye çaleke bê binî*" xwedî dikin. Herweha karmendên *Deutsche Bahn*'ê yên ku li dijî taybetkirina rêyên hesinî yên alman rabûbûn, bi çi tacîza ku li gorî wan re rûbirû mane, Wallraff behsa wan dike. "*Parêzerên terorê*" dide axaftin, yên ku di "*jikarderxistina ku nabe bibe*" de pispor in û ji tacîza ku li gorî wan baş li stratejiyên "qanûnî" hatiye anîn û ji jikarderxistina neqanûnî jî gellekî hez dikin. Berevajî "mûcîzeya aborî" ya alman, panoramayeke fikaran bi mirovan re çêdike…

Dibe ku ev tablo ne îstîsnayek be ku qaîdeyê bipeyitîne, lê belê dibe ku qaîdeyek be ku li ser rêya normalbûnê be. Qaîdeya rejîmeke seferberiya karkiran e ku li ser keviya qanûnîbûnê – yan jî neqanûnîbûnê – ye û tê de qanûna yê herî xurt *neewlebûna* yê herî lawaz bi sazî dike. Alav, tevn û prosedurên ku bi kêrî wê tên ku ji nû ve reng bide mafên civakî û siyasetê û li gorî kategoriyên exlaqî û "dilpêvebûnê", wan ji nû ve şîrove bike: şaş, bi xêr û ber, ceza, xelat. Sébastien Chauvin lêkolîneke etnografîk a hêja li ser ajansên karê rojane yên li Chicagoyê pêk aniye (4). Ya rastî, yek ji encamên vê lêkolînê û encama ku me li jorê behs kir heman tişt in. Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, *bi destê* van ajansan *normalkirina* neqanûnîbûna karkirên rewşa wan neqanûnî û cihêkariya li dijî afro-amerîkiyan, armanca wê ew e ku şêwazeke "*sîgorteya neqanûnîbûnê*" bide şîrketên ku mişteriyên van ajansan e; û di heman demê de hêzeke kar a ji mirovên kêmî-welatiyan pêk tê, ji bo van şîrketan bi awayekî biîstîqrar ewle bike. Mirovên kêmî-welatiyan bêguman *li gorî rewşê dikarin xwe eyar bikin*, lê belê di statuyeke weha de ne ku li ser hîmê bêkariyê hatiye danîn û *nikarin xwe tev jî bidin*. Ev statu ji bilî derfeteke neewle ya ketina bazara kar a karkirên nekalîfiye, tiştekî din nade. Ev derfet jî bi şertên delîlên baş ên sebrê, heqkirinê û niyeta baş ve girêdayî ye.


1 Binêre li malpera *Observatoire du stress* a li ser France Télécomê (www.observatoiredustressft.org) û pirtûka dawî ku karmendekî şîrketê jî di nava nivîskarên wê de ye: Marin Ledun û Brigitte Font Le Bret, *Pendant qu'ils comptent les morts. Entretien entre un ancien salarié de France Télécom et une médecin psychiatre* (Dema wan mirî dijimartin. Hevdîtina di navbera karmendekî berê yê France Télécomê û doktorekî Psîkyatriyê de), weşanên La Tengo, Parîs, 2010, 15 €

2 Bixwîne; Yves Clot, *Le Travail à cœur. Pour en finir avec les risques psychosociaux* (Karê bi dilê xwe. Ji bo dawîanîna li rîskên psîko-sosyal), La Découverte, Parîs, 2010, 14.50 €

3 Günter Wallraff, *Parmi les perdants du meilleur des mondes* (di nava yên herî baş têk diçin yên dunyayê de), La Découverte, Parîs, 2010, 19 €

4 Sébastien Chauvin, *Les Agences de la précarité. Journaliers à Chicago* (Ajansên xizaniyê. Li Chicagoyê karkirên bi yewmiye), Seuil, Parîs, 2010

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



## ŞERR LI AFGANISTANÊ

# Pereyên Talîbanan ji ku tên

LOUIS IMBERT


LMd arşîv

Bextê Hecî Mihemed Şah reş bû. Par, li bakurê Afganistanê, li derdora bajarê Kunduzê wî dest bi avakirina rêyekê kir: vê rêya 25 kîlometroyan dirêj dê destûr bidaya gundiyên navçeya Çehar Dara ku biçûna û hilberîna xwe ya çandiniyê li bazara bajêr bifiroştana. Buhayê vê projeyê 63.600 euro bû. Banqeya Asyayî ya Pêşketinê ev pere dabûn. Hê di destpêka projeyê de endamekî Talîbanan hat û doza baceke ji bo heyeta rîspiyên navçeyê li fînansorên vî karî kir. Ji bo ku berî ku rê bi dawî bibe neyê xirabkirin, birêvebirên vî karî 13.900 euro bac dan. Paşê, qasidekî din hat: wan dîsa bac da. Dema ku yê sêyem hat, wan jê re got ku êdî pereyên wan nemane. Encam: rojeke adara 2010'an, dema ku Şah ji navbera xwe ya taştê ya li bajêr vedigeriya, dît ku karkirên wî ji aliyê çekdaran ve dîl hatine girtin. Van çekdaran 6 mekîneyên wî yên kar jî şewitandibûn. Ziyana lê bûyî digihêje 176 000 euroyan. Ji hingê ve jî ew li dûv şîrketên sîgortayê dibeze da ku berdêla ziyana xwe bistîne…

Waliyê Kunduzê, Muhemed Omer, bi dudilî rave dike; ew nizane ka gelo rîspiyan kêm pere daye yan jî bertîl nedane. Bi awayekî neçar, ew dibêje: "*Talîban, dilê wan çi bixwaze, wê dikin li vir. Li gorî dilê xwe dikujin, îşkenceyê dikin û kûxîtiyê dikin.*" Mihemed Omer bi mezinahiya sîstema kûxîtiyê ku ji aliyê hempîşeyê wî yê Talîbanan "waliyê piştperdeyê" yê Kunduzê ve hatiye danîn, baş dizane. Ev "waliyê piştperdeyê" bacekê ji her tiştê ku li herêmê tê avakirin distîne: rê, pire, dibistan, nexweşxane… mirov Afganistanê çiqasî "ava bike", Talîban jî ewqasî dewlemend dibin.

Li ser pirsa "gelo Molla Omer ji çi dixwe?", bersiva ku tê dayîn para bêhtir yek peyv e: esrar. Li gorî raporeke ku Buroya Neteweyên Yekbûyî (1) ya li dijî narkotîk û sûcan dawiya sala 2009'an weşandiye1, esrar bi tenê dibe % 10 an 15'ê hatiniya Talîbanan (baca li ser esrarê û bazirganiya wê).

Kirk Meyer'ê berpirsiyarê *Afghan Threat Finance Cell* yê sefareta amerîkî ya Qabûlê, piştrast dike ku "*pirraniya pereyan di qada herêmî de tên komkirin. Em nizanin ka pereyên ku ji esrara Helmandê* (2) *bi dest dikevin çawa li herêmên herî xizan tên parvekirin.*

*Wekî din, Talîban xwe bi xêra alîkariyên ku saziyên civaka sivîl ên qelp didinê, revandina mirovan, qaçaxçîtiya sedar û mîneralên kromê ya li ser sînorê Pakistanê, debara xwe dikin.*"

Abdulqadir Mucaddedî'yê 32 salî muhendis e. Ew biraziyê Sibxatullah Mucaddedî ye ku niha serokê Senatoyê ye û piştî têkçûna rejîma komunîst ya sala 1992'an, yekem serokkomar bû. Abdulqadir Mucaddedî van rojan li herêma Laxmanê, li ser çiyayan, rêyeke bi dirêjahiya 7 kîlometroyan çêdike.

Li dora mekîneyên xwe, wî bêguman nobedar jî wezîfedar kirine. Agahdariya ku mirovan matmayî dihêle jî ew e ku bi tenê nîvê van nobedaran bi unîforma ne, yên mayî bi kincên xelkê ne û riha wan dirêj e. Çima? Lewre nîvê zilaman ji aliyê berpirsiyarên Talîbanan yên herêmê hatine şandin. Buhayê vê jî, heta dawiya karê çêkirina rêyê, 52.000 euro ne. Abdulqadir Mucaddedî bi bişirîn dibêje "*Ne giring e. Eger ez neçar bûma ku pereyên sed nobedaran bidim, buhayê vê dê mehê 16.000 euro bûna. Bi Talîbanan re ev buha mehê 8.000 euro ne û bi ser de jî şantiye ewle ye.*" Çar an jî pênc êrîş di ser Abdulqadir Mucaddedî re bihurîne, lê ji şeş mehan û vir ve ye ku her tişt bêdeng e. Kêf kêfa waliyê herêmê ye. Amerîkiyên ku çêkirina vê rêyê bi bernameyeke leşkerî ya bi navê *Provincial Reconstruction Team* dimeşînin û armanca wan ji vê bernameyê ew e ku "dil û mejiyê Afganan bike dostê xwe", dengê xwe ji vî awayê xebatê re dernaxin.

Ev şantiyeya Laxmanê, bûyereke bi serê xwe nîne. Walî Muhemed Resûlî'yê ku kevnecîgirê wezîrê karên avakirinê ye û ev çar meh in ku teqawît bûye, vê sîstemê weha diparêze: "*Der barê mijarê de ez du caran, bêhtirî du saetan bi serokkomar Hamîd Karzaî re axivîm. Eger em rêyan xelas bikin, hatûçûn û bazirganî dê ji xwe ber ewlekariyê zêde bikin. Em ji xwe pereyan didin Talîbanan, divê em dev ji vê durûtiyê berdin!*" Ji bo wezîrê niha, herweha ji bo tevahiya fînansorên navneteweyî, nabe ku behsa vê hîpotezê were kirin. Xeta fermî ev e: em qet pereyan nadin serhildêran. Armanca vê xerac û şantajê ya sereke eskerên amerîkî û ew kes in ku bi wan re û ji bo wan kar dikin. Her meh, şeş ta heşt hezar konvoy ji nêzî du sed baregehên amerîkî yên eskerî re, alavên ku ji bo dewamkirina şerrî hewce ne, dikşînin: Cebilxane, benzîn, alavên buroyê, kaxezên tuwaletê, televizyon… (3)

Pirraniya karê birin û anîna konvoyan ji aliyê şîrketên taybet ve tê kirin û ev kar bi peymaneke weha hatiye girêdan ku buhayê wê 2.16 milyar dolar e (% 16.6'ê hilberîna Afganistanê ya brut) ku navê wê jî *Host Nation Trucking* e û di 2009'an de hatiye îmzekirin. Rayedarekî amerîkî yê Hêza Navneteweyî ya Alîkariya Ewlekariyê li Afganistanê (ISAF) balê dikişîne ser xalekê: "*Em taşeronên ku vî karî digirin, nas nakin. Em nizanin ka gelo ew ji bo ku konvoyên xwe bi ewleyî derbas bikin, pereyan didin Talîbanan yan na (...) Em bi milyaran pereyan lê didin, û mumkin e ku bi milyonan ji vî pereyî dikevin destê serhildêran.*"

### Banqevan karê xwe dikin û dengê xwe nakin

Zarxuna Walîzada takejin e ku li Afganistanê şîrketeke barkêşiyê bi rê ve dibe. Serê wê vekirî ye û di buroyeke mobîlyayên rengavêtî yên salên 1970'î de mêvanê xwe vedihewîne. Haya wê ji zexta ku Amerîkî di bin de kar dikin heye û dizane ku gava ku qemyon li ser rêyê rastî êrîşan bên, ew ji kîsê wê diçe. "*Divê mirov pereyan bide kê? Polîs, serhildêr, Talîban, ev ne xema min e. Ya girîng ew e ku qemyon derbas bibin*." Hin caran jî konvoy bêyî ku ji aliyê refaqeta eskerî ve werin parastin barê xwe vediguhêzin, Walîzade vê yekê jî weha kurtebir bi lêv dike: "*Ma çi pêdiviya me pê heye? Talîban ji xwe ewlekariya me misoger dikin.*"

"*Bêguman em pereyan didin Talîbanan*", serokê sendîkaya sereke ya sektora barkêşiyê Ehmed Nawîd weha li xwe mikur tê û dewam dike: "*Bi navê Xwedê, hûn dikarin ji min bawer bikin: ev bi awayekî zelal xerac e. Hin şîrketên ewlekariyê, serê qemyonekê ji bo rêyeke çend sed kîlometroyan, 2.000 dolaran dixwazin. Mumkin e ku nîvê vî pereyî bikeve bêrîka Talîbanan.*"

Çawa li ser derbaskirina konvoyan li hev bikin? Xuya ye ku ne bi awayekî rasterast e. Juan Diego Gonzales kevneleşkerekî amerîkî ye û patronê şîrketa afganî ya ewlekariyê ya taybet *White Eagle* e, dibêje "*Heger ez rabim, rûbirû bi serokeşîrên Helmandê re bazarê bikim, kêfa patronê min dê ji vê re neyê. Navbênkarên me hene ku ji me re zilaman peyda dikin. (...) Carinan serokeşîr an jî kurê wî bi xwe li ser konvoyê ne. Hûn bi tenê hêvî dikin ku têkiliyên wan ên yekser bi Talîbanan re nebin.*" Dibêje ku ew li ser rêyan dixebite û li wira, mêzîna hêzan zû diguhere: di nava giregirên ku ji şerrî dixwin de, kes nikare bi serê xwe soza ewlekariya derbasbûna konvoyan bide. Ev jî derfetê dide wî ku karibe hevkarên xwe hilbijêre. Lê belê, li gorî ku berpirsiyarekî *Tac Force,* şîrketa afgan ya taybetî ku bi eslê xwe awûstûralyayî ye, haya me pêxist, hin rêyên din jî hene ku "*eger hûn bi tena serê xwe herin, hûn ê pirsgirêk û serêşên gellekî mezin ji xwe re çêkin. Eger we destûra serokeşîrê herêmî negirtibe, hûn ê bimirin.*" Li gorî agahiyên ku wî dan, *Tac Force* li gorî pêşniyarên wezareta afgan ya karên hundir yên li ser diyarkirina serokeşîrên "baş", tev digere.

Di nava van serokên kurtêlxwur ên rêyan de, yê niha herî navdar Ruhullah e. Ev fermandar ku tu carî rastî rayedarekî amerîkî nehatiye û temenê wî li derdora 40 salan e. Saeteke *Roleks* di destê wî de ye şelwerê gelêrî lê ye. Bi dengekî ecêb bilind dipeyive. Ev kes beşekî mezin a otobana ku Qabûlê di ser Qandaharê re bi başûrê welatê Paştûnan ve girê dide, kontrol dike. Ruhullah bi birayên Popal re kar dike. Popal xwediyên koma şîrketan *Weten* in û pismamê serokkomar Karzaî ne. Li ser rêya wan, konvoyek weha heye ku ji sê sed kamyonan pêk tê û ji aliyê çarsed ta pêncsed nobedarên taybet ve tê parastin. Li derbaskirina konteynerekê heta bi Qandaharê mumkin e heta bi 1.200 euroyî pere biçin. Li gorî raporeke nû ya Kongreya Dewletên Yekbûyî ya Amerîkayê (4) ji bo parastina konvoyên amerîkî "*salê bi dehan milyon dolar*" dikevin kîs û berîkên serokên kurtêlxwur ên rêyan û hevkarên wan ên ingilîzîaxêv. Hem Ruhullah û hem jî birayên Popal ji binî ve red dikin ku li cihê nikaribin bi zora xwe derbas bibin, pere dabin Talîbanan. Ruhullah dibêje ku par çarsed û pêncî zilamên wî hatine kuştin.

Gellek şîrketên ewlekariyê û barkêşiyê pirr caran gazindên xwe li cem artêşa amerîkî kirine û gotine ku ji ber ku ew bi awayekî sîstematîk alîkariyê ji serokên kurtêlxwurên şerr dixwazin, ziyana wan a maddî çêdibe. Artêşa amerîkî bi xwe nizane ka vê pirsgirêkê çawa çareser bike.

Talîban timî bi zora tivingê pereyan bi dest naxin. Carinan ev pere di destê banqevanên bikêrhatî û nedarîçav re derbas dibin. Ev banqevan alîkariyên pereyan yên ku ji welatên kendavê di ser Dûbaî û Pakistanê re tên, digihînin Talîbanan. Cihê diyarker, bazara pevguherandina pereyan a Qabûlê ye: galeriyeke sêqatî heye ku berê wê li bexçeyekî ye, dezgehên text li ser zemîn jî hatine danîn ku ser wan bi taxên dolar, ruple û yuanan ve hatiye girtin û geremoleke weke ya rojên taybet a li *Les Halles*'a Parîsê lê heye. Li gorî lêkolîneke *Afghan Threat Finance Cell*'ê, li şûna gîşeyên banqeyan, ji sedî 96'ê Afganan vê bazarê ji bo şandina pereyan tercîh dikin. Ya ku divê bikin bi tenê ew e ku deriyê buroya simsarekî (*hewale*) daf bidin, ku li vir bi sedan ji wan hene: Dikankên teng, ên ku bazar û karê wan bi tu awayî bi firehiya dikanên wan re li hev nake, yan jî şeş, heft xebatkarên ku xwe li ser yanên çermî yên bedena mirov dişewitînin pan kiriye, her êvar pereyên wê rojê bi dest xistî dijimêrin. Ev tevn ji sedsala heyştan ve hene. Bi xêra wan, mirov dikare di nava çend saetan de bi sedhezaran euroyan ji aliyê dunyayê yê din bide anîn, ev jî bi rêya acentayeke bi ser a we ve, bi dana komîsyoneke gellekî hindik ve pêk tê. Li gorî sendîkavanê herêmî Hecî Necîbullah Axterî, her roj 4 milyon euro di vira re derbas dibin. Sîstem xwe disipêre baweriyê: herkes mişteriyê xwe yan jî kefîlên wî nas dike.
Ji 2004'an û vir ve dewlet hewl dide ku van acentayan qeyd bike û her meh kîtekîtên karûbarên danûstendina wan kontrol bike. Li ser cihê ku Axtarî lê rûniştiye, televizyonek heye û beşekî ji filma karton ya bi navê *Tom and Jerry* diweşîne; Axtarî bi bîr dixe ku "*her roj bi dehan endamên rêxistina îstîxbaratê li vira digerin*" û li defterên hesaban diniherin. Lê belê bazara Qandaharê ya ku gellek kar lê dibe, ji ber nebûna ewlekariyê, mufettîş nikarin gava xwe bavêjinê. Dîsa jî beşek ji fînansên Talîbanan a têra xwe mezin, di vê sîstema *hewale*yan re derbas dibe.

Beşa îstîxbarata fînansê ya Banqeya Navendî li Afganistanê ji 2007'an û vir ve qeyd kiriye ku banqinotên Erebistana Suûdî bi 1.3 milyar dolaran hatine guhertin. Serokê banqeyê yê ciwan Mistefa Mesûdî rewşê weha şîrove dike: "*Pere li herêmên eşîran ên Pakistanê derdikevin holê: gelo hûn dikarin ji min re bibêjin ka pêdiviya kê li van deveran bi riyalên Erebistana Suûdî heye? Ji Peşawerê (bakurê Pakistanê) van pereyan bi rêya* hewale*yan dişînin Qabûlê, li vira jî ev pere bi dolaran tên guherîn. Pişt re, dolar li serê giran ji holê wenda dibin û riyal jî bi awayekî qanûnî di balafirgehê re ji nû ve berê xwe didin Dûbaiyê.*"

Divê mirov guh bide general Mihemed Asif Cebar Xîl jî ku ji ewlekariya balafirgeha Qabûlê berpirsiyar e. Ew gellekî bi hêrs e , lewre qanûnek heye ku dibêje ku heger were beyankirin, herkes dikare tevî çend milyon pereyan ji welêt bi rêya balafirê derkeve. Ji 2009'an û vir ve, ji wextê ku qeyrana aborî li welêt xistiye, li Dûbaiyê rayedar hindiktir serê xwe bi çavkaniya pereyan re diêşînin. Rayedarekî amerîkî rapor kiriye ku par ji balafirgeha Qabûlê 1.75 milyar euro pere ketine nav erdên Emîratên Ereb yên Yekbûyî. Agahdariyeke weha ku mirov matmayî dihêle: Li gorî Mesûdî, herî zêde deh kesên ku pirraniya wan acentayên *hewale*yan in, para mezin a şandina van pereyan pêk tînin. General Cebar lîsteyekê nîşanî me dide. Binê navan bi awayekî hêrs hatine xêzkirin, mîqdara pereyan devê mirovan ji hev dihêle: di 2009'an de 360 milyon euro ji bo yek kesî, ji bo yekî din 69 milyon…

Peywendiya van hemû pereyan bi Talîbanan re nîne. Hin mîqdar qanûnî ne, hin jê alîkariyên navneteweyî ne ku ji aliyê rayedaran ve hatine redkirin, hin jê eleqedarî bazirganiya narkotîkê ne, ku para bêhtir ne ji aliyê serhildêran ve tê birêvebirin. Ev taxên pereyan ên ku ser wan bi plastîkê girtî ye û li bagajên Ariana Airlinesê barkirî ne, herweha semptomên dijwariyên dewletê ne ku di kontrolkirina fînansên xwe de dikişîne. Par, ji gumrukan bi tenê 636 milyon euro bac hatiye berhevkirin, tevî ku reveberî dikare du qatên mîqdarê kom bike. Berpirsiyarê gumrukan, alîkarê wezîr yê ciwan û niyetbaş, nikare biçe hin deriyên sînor û ji xwe dipirse ka kî dikare wî biparêze… Li herêma Qandaharê, li deriyê sînorê Spîn Boldakê, ew refaqeta mîna ya bavan a serokekî kurtêlxwirê şerrî yê weha tercîh dike ku guman jê tê kirin ku bi awayekî dizî peyman bi Talîbanan re danîbe…

1 UNODC, «Addiction, crime and insurgency: The transnational threat of Afgan opium», çiriya pêşîn 2010, www.unodc.org

2 Li bajarekî li başûrê rojavayê Afganistanê li qadên gellek berfireh esrar tê çandin

3 Bixwîne: Syed Saleem Shahzad "Afghanistan, Pakistan, l'irruption des "néotalibans". *Le Monde diplomatique*, çiriya pêşîn 2008

4 Warlord Inc. : Extorsion and corruption along the U.S. supply chain in Afghanistan", Meclîsa Nûneran, Washington, 22 hezîran 2010


Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## Li Srî Lankayê, biserketina Sîngaliyan kêmayetiyan ditirsîne

# Piştî têkçûna Pilingan li Tamûlê tevlihevî

Cédric Gouverneur

**Hukumeta Srîlankayê di hezîrana 2010'an de hatina şandeyeke pispor qedexe kir ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hatibû şandin, da ku li ser binpêkirinên mafên mirovan lêkolînê bike. Piştî ku artêşa dewletê pişta Pilingên Tamûlî şikand, zordariyeke ecêb li herêma Elamê bi cîh kiribû. Serokwezîr Mahinda Rajapakse hêza xwe xurt kir û berê xwe da Tamûlan. Tamûl ditirsin ku bibin koloniya Bûdîstan ku li herêmê pirranî ne**



Koalîsyona serok Mahinda Rajapakse ku di gulana 2009'an de, bi biserketina xwe ya li dijî Pilingên azadiyê yên Elam Tamûlê (LTTE) serfiraz e, bi awayekî xurt hilbijartinên giştî yên 8'ê nîsana dawîn kar kirin. Lê belê, civata sivîl a sîngalî ketiye tirsa ji sîtemkarî û xanedaniya desthilatê. Kêmayetiya Tamûlî jî, tim li ber têkçûna Pilingan dikeve, û ditirse ku bibe mêtingeha Sîngaliyên bûdîst ku pirrhejmarî di destê wan de ye.

Ji adara 2008'an û bi vir ve, her ku kelehên serxwebûnxwazên Pilingên azadiyê yên Elam Tamûlê dikevin (LTTE), desthilata srîlankî, Tamûliyên bin kontrola gerillayan ku hejmara wan li dor 300 000'î ye li kampan kom dike. Li kampa Menic Farmê ya mezin ku li Vavuniyayê ye û li bakurê welêt e, 228 000 kes girtî ne. Piştî têkçûyina Pilingan bi deh mehan, 70 000 penaberên din xwe li paş têlên rêsayî dîtin û hîn jî li benda destûra vegera gundê xwe ne. Artêşê destûr da me ku em serdana kampekê ji van kampan bikin, ku navê wê "gundê tendurustiyê yê demkî" ye.

Li ber deriyê kampê, portreyeke serok Mahinda Rajapakse ku bilindahiya wê şeş metre ye, û tê de destekî xwe bi jesteke serkevtinê bilind kiriye, serdestî rêzebereqeyan e. Qumandarê kampê girtina Tamûliyan ya giştî piştrast dike: *"Diviya me terorîst û nifûsa sivîl ku ji alî wan ve hatibû rehîn girtin ji hev cuda bikiraya... Helbet, vegerandina wan wextê dixwaze. Lê, berî paqijkirineke mayînan a têrker, em nikarin xelkê bişînin malên wan."* Rêxistinên sivîl yên serbixwe (RSS) ku li vira hejmara wan kêm e û destûra wan a xebatê li van kampan hatiye dayin dîsa jî bi kêmanî sextiya şertên jiyanê wiha rave dikin; xêrxwazekî rojavayî dibêje, *"Artêş di nav hejmara sivîlên ku di bin kontrola Pilingan de dijiyan fetisîbû: ev hejmar li dor 300 000 kesan bû, lê wan texmîn dikir ku diviya îdareya 100 000 kesan bikin! Tevî hertiştî, di dema civînên ahengiyê yên di navbera nivîsgehên Neteweyên Yekbûyî, RSS û rêxistinên wê, diyar dibe ku serbazan tiştê ji destê wan hatiye kêmanî nexistinê. Ger mirov beramberî hev bike, min hin kampên penaberan ên Neteweyên Yekbûyî dîtine ku ji vira xirabtir in."* Bi tenê ferqa cudakarî, girtina xelkê sivîl ya bi giştî û li gorî taybetmendiyên etnîkî dimîne: Helbet Kolomboyê dê tu carî heman tişt bi serê Sîngaliyan de neaniyaya.

Li gel serdarekî artêşê –du Tamûlî ji bo ku bersiva pirsên me bidin hatin hilbijartin–, em li temamê kampa ne serî û ne binî xuya ye, geriyan: Navendên tendurustiyê, dibistan, dikan, banqe, nivîsgehên posteyê hebûn ku diviya giraniya nebûna azadiyê siviktir bikiraya. Girtiyên kampê carinan ji derfeta destûra katî ya derketina derve îstifade dikirin. Piştî jiyana bi mehan a li bin agirê şerrî, bêhna muxatabên me piçekî hatiye ber wan: demên herî dijwar derbas bûne. Ew sax in, zikê wan têr dibe, xizmeta wan a tendurustiyê heye, û amadekariyên xwe yên ji bo avakirina jiyaneke nû dikin. Lê, gerra me ku rêberek jî bi me re bû, gava ku grûbek hêrs bû, ji bin kontrolê derket –û li pêş awirên reş yên her du "caşan": *"Êdî bes e! Ma divê em heta kengî li vira bin? Malên me, hemû tiştên me hatine talakirin. Çima yên din serbest hatin berdan em hîn li vir in? Li gorî kîjan pîvanan? Çima Neteweyên Yekbûyî tiştekî nake?"* Di encamê de, gava kampanyaya hilbijartinên giştî bi hemî hêza xwe dom dikir, wan gazinên xwe ji nebûna azadiyê li kampan dikirin: *"Bi tenê berendamên ku piştgiriya serok dikin mafê hatina vira heye."*

Li kampa Menic Farmê xort pirr kêm in: Bi tawana endamtiya LTTE'yê, pirraniya wan hatine girtin. Herweha li Kolomboyê jî, di navbera 11 000 heta 13 000 kesên ku bi gerîllatiyê gumanbar in hene. Rajiva Wijesinha, kevnewezîrê ku nêzîkî serok e, bi me da zanîn ku *"Li gorî radeya têkiliyên xwe hatine dabeşkirin"*, û soz da ku *"Ji van, li dor hezarekî dê derkevin pêşberî adaletê û mahkeme bibin, lê ne zêdetir"*. Ger pirraniya Pilingan bi xwe teslîm bûbin jî yên mayî ji alî Tamûliyan ve hatine îxbarkirin, ji ber ku ew ji zordariya serhildêran bêzar bûne: digel ku ji têkçûnê pê ve rêyeke din li ber wan nemabû jî, yên ku ji nav lepên wan filitîne ji me re got ku *"ji her malbatekê du zarok digirtin"* û *"mirovên ku dixwast biçûna herêmên di bin kontrola artêşê de de jî didan ber gulleyan."*

Ji Menic Farmê ne pirr dûr, me serdana girtîgehekê kir ku weke navendeke rehabîlîtasyonê ya zarokên kevne-gerîlla dihate bikaranîn: di bin çavdêriya artêşê de, û bi alîkariya mamosteyên Tamûlî yên ji derdorê, piştî çend salên xwe yên li eniya şerrî keç û xortên li vira nuha herkê ji xwe re karekî fêr dibin. Şîvaneş 13 salî bûye gava ku LTTE'yê ew bi zorê girtiye û bi xwe re biriye. Vî xortê 17 salî yê ku birînên xwe pêçabûn bi awireke wendayî digot *"Min esker kuştin, û ez bi xwe jî birîndar bûm"* û ji me re behs dikir: *"Di tabûra min de, çi bigre jî zarokan pê ve kes tunebû. Gava ku artêşê dora me girt û serokên me hatin kuştin, em giş teslîm bûn."* Şîvaneş ji teslîmbûna xwe ne poşman e: *"Pilingan jiyana min ji min dizîn: Wan ez ji malbata min qetandim, dibistan li min qedexe kirin, ez hînî kuştinê kirim. Artêş karekî fêrî min dike û destûra ku dê û bavê min bên min bibînin dide. Ez niha kompîturê hîn dibim. Nêzîk, ne dûr ez ê vegerim mala xwe û ji nû ve merivên xwe bibînim."*

Handanên Kolombo yên ku ji bo rehabîlîtekirina van xortan hêjayî pesindayînê xuya ne, lê tenê bi kêrî hejmareke kêm a gerîllayên zarok tên. Ji xeynî vê jî, jêdereke serbixwe –ku destûra wê hatibû dayin da ku serdana girtiyên LTTE'yê bike– gazindên xwe ji ber nebûna agahdariyan dike: *"Hukumet tu lîsteyeke navan nade. Hayê malbatan ji tiştekî tuneye: Kes nizane bi rastî jî ka kî, li ku yan jî bo çi girtiye. Li welatekî ku înfazên bêdaraz berbelav in, rewşeke weha cihê tirsê ye."* Bi taybetî jî, redkirina daxwaza serdana girtiyan a Komîteya navneteweyî ya Xaça-Sor (CICR) ne normal e.

Ber bi aliyê bakur de herêma Vanniyê heye, ku nêzîkî bîst salan di destê Pilingan de ma û artêşê di destpêka sala 2009'an de ji nû ve kontrol ji wan stend. Ji wê çaxê û bi vir ve, Vannî bi temamî ji alî serbazan ve hatiye girtin; çapemeniya navneteweyî nikare bikeve vê herêmê. Li ser rêya A9'ê ku di seranserê welêt re derbas dibe, her ji sed metreyekî kozikek xuya dike. Ji bo rêlibergirtina kemînên mûhtemel, darûberên derûdorê hatine birrîn. Li vî aliyî û wî aliyî, panoyeke ku qoqekî serê miriya li ser e hebûna mayînan nîşan dide. Li herderê serbazên çekdar hene. Sîvîlên ku pirr kêm in, ne dûrî malên xwe yên wêran, bi awayekî giştî di bin konan de dijîn. Em bi dehan otobusên tûrîstên Sîngaliyan re, ku ji aliyê hukumetê ve ji bo serdana Bakurê ku heta niha kesî nikaribû bidîtaya hatine teşwîqkirin, di rêyê de ne. Kîlînoççî, "paytextê" berê yê Pilingan, ku gerillayan "wezaretên" kakilê Dewleta xwe ya dîktatoriyê lê ava kiribûn (1), nayê naskirin: avahiyek bi tenê jî li ser pêyan nemaye. Hete bi depoya avê di şerrî de sax nefilitiye: Vê avahiya mezin a ku bi perçeyên şarapnelan qulqulî bûye, bi aliyekî de ketiye û îro bûye armanca tûrîstên Sîngalî ku mekîneyên wêneyan di destê wan de ne. Rahîb û malbat yek bi yek li ber vê dîmena wêraniyê poz didin, paşê jî li otobusên xwe yên bi ala Srîlankî, afîşên serkevtinê yên serok û *"artêşa wî ya qahreman"* xemilandî siwar dibin û diçin bi rêya xwe de. Ji xeynî abîdeyeke ji bo miriyan, li Kîlînoççiyê bi tenê avahiyeke nû heye ku perestgeheke bûdîst e ku serbazan hema bi lez û bezê ava kiriye û bûye sedema aciziya gelê tamûlî, çi hîndû û çi jî xiristiyan.


Ev serxweşiya serketinê, Tamûliyên ku hîn nû ji Menic Farmê azad bûne, mirovên xwe wenda kirine û ji wan bêxeber in û bi alîkariya navneteweyî dijîn pirr hêrs dike. "Nayan" bi xemgînî ji me re dibêje: *"Me jiyaneke dojehî bihart, bi ser de jî ew tên henekê xwe bi me dikin"*. Ev piştgirê pilingan qezazedeyekî êrîşa dawîn e ku artêşê li derdorê Mullaitivuyê bi rê ve bir û ku bi bêînsafî LTTE -û bi hezaran sîvîlên ku rêxistinê dabûn pêşiya xwe- bombardiman kir. Wî bi kurtayî got *"Pilingan heta fîşeka xwe ya dawîn jî şerr kir. Û paşê, kapsula siyanurê ku weke qolyeyekê di stuyê wan de bû gez kirin. Topbaran bû, dêya min li pêş çavên min can da, û ez bi xwe jî birîndar bûm"*, û şûna birînên xwe yên mezin ên li milê xwe û li paqa xwe nîşanî me da. *" Ez têgihîştim ku piştî bombebaranê, artêş li gel sîvîlan bêtir bi tevdîr tevdigeriya: dixwazin dilê wan û hişê wan fetih bikin."* Lê, kes nikare baweriya Nayan sist bike: *"Ez bi salan di bin desthilatdariya Pilingan de jiyam. Min xwe li wira pirr baş hîs dikir. Nîzam hebû, kar hebû, xizmetên civakî û adaleta civakî hebûn."* Weke gellek sempatîzanên LTTE'yê, Nayan naxwaze mirina serokê wan Vellupilay Prabhakaran qebûl bike, tevî ku ev yek bi ceribandinên genetîk jî hatiye îsbat kirin: *"Televizyonê termê yekî bi simbêl ku dişibiya wî nîşan da."* Ew bawer dike ku Piling *"bi şûn ve kişiyane"*: *"Pênc helîkopterên me hebûn û 35 topên me yên dûravêj. Ew li ku ne? LTTE'yî xwe vedişêrin, ew ê disa derkevin holê!"*, ew dixwaze weha bawer bike.

Berevajiya wê, pirraniya Sîngaliyan bi serkevtinê kêfxweş in û ji ber ku êdî nema xema êrîşên xwekuj dixwin, serê wan rehet e. Herdem –tev li gellek tiştên veşartî jî– bi têkiliyên ji dil ên pîşeyî yan dostanî, bi hevwelatiyên xwe yên Tamûlî re didin û distînin. Ew vî şerrî jî weke *"şerrê li dijî terorizmê"* bi nav dikin: ji ber ku di bin bandora propogandaya medyayê de ne jî, ew ji dil bawer dikin ku artêşa wan Tamûlî ji nav lepên rêxistineke xwînxwar rizgar kirine. Têkçûyina Pilingan jî nîqaşa di vî warî de bi dawî tînê: girav dê di encamê de di nav aşitî û aramiyê de bijî, bala razîner û tûrîstan piştî navbereke bîst û pênc salan bikişîne. Girav dixwaze, di sala 2016'an de du milyon û nîv tûrîstan ber bi xwe ve bikişîne, ku ev jî dike pênc qatên yên nuha. Grûbên otêlvanan bi taybetî jî çav berdane delava Trincomaleyê ya xweşik ku berê keleha LTTE'yiyan (2) bû… Ev niherîna xweşbîn ji bîr dike ku doza serxwebûna Tamûlê ne bi bombeyên LTTE'yê, lê hîn sîh sal berê, ji destpêka tevdîrên cudakar ên ku ji alî Kolomboyê ve li dijî kêmayetiyê hatin stendin dest pê kiriye[3]. Lê têlên rêsayî yên Menic Farmê jî baweriya Tamûlan a ku weke hevwelatiyên rêza duyem muamela bi wan re tê kirin xurtir dike. Tevî despotiya Pilingan û binpêkirina mafên bingehîn, mêjiyê pirraniya gerîllayên zarok hîn jî tevlihev e, Şanti Saçithanandam ku birêvebira RSS *Tamoule Viluthu* (Herne pêş) ye û ew bi xwe jî yek ji qurbaniyên Pilingan e, radigihîne û dibêje: *"Xelk ji min re dibêjin: bi kêmanî, bi Pilingan re dengekî me hebû"* û lê zêde dike: *"Ew di wê baweriyê de ne ku, tev li kêmasiyên wan jî LTTE'yiyan li ser navê wan têkoşîn dida. Têkçûyina wan ew di nav şokê de hiştine û şaş û mital mane."*

Çerxa felekê carinan ters digere, bi kuştina sîstematîk a hemû siyasetmedarên Tamûlî yên ku karibûn bi wan re reqabet bikiraya, bi awayekî giştî LTTE'yî bi xwe bûn sedemê valahiya temsîla xwe. Partiya siyasî ya ku herkes dizane ku nêzîkî Pilingan e, Peymana neteweyî ya Tamûlî (TNA) ji hindur de teqiya û belav bû. Bi aweyekî pirr vekirî, gellek endamên wê yên sereke tenê ji bo ku nebin armanca gulleyên LTTE'yê bûbûn endam. Paşê, otonomiya xwe bi şûn de stendin û di bin etîketên cihê de di hilbijartinên giştî de bûn berendam –carinan heta bi piştgiriya Kolomboya ve bûne endam ku Kolombo bi parçekirin û cudakirina Tamûliyan gellekî kêfxweş e (3). TNA'ya ku naxwaze rewşa nû ya heyî qebûl bike, hîn jî xewnan dibîne, di yek ji xwepêşandanên xwe yên siyasî de, dibêje *"Birêvebiriyeke federal ji bo Bakur û Rojhilat"*, ku êdî ji şêrrê sîngaliyan yê serkevtî, qet rîska dayina mafekî weha nemaye. Mavay Senathiraja ku berendamê TNA'yê ye, dibêje. *" Daxwazên me maqûl in"* û dide zanîn ku *"Em ê bi Kolomboyê re rûnên bazarê bikin, û bi rêya seferberkirina diyasporayê* (4) *ve jî em ê li piştgiriya navneteweyî bigerin. Ger daxwazên me neyên qebûlkirin, em ê dest bi kampanyayeke bêîtaetiya sîvîl bikin."* û bêhêziya xwe bi awayekî sersar îtiraf dike.

Milîtanekî kevn şirove dike û dibêje *"Hêviya Tamûliyan qet nemaye"*, û lê zêde dike: *"Ger ez hîn xort bûma, ez ê biçûma sirgûnê. Sîh sal têkoşîna siyasî* [ji salên 1950'î heta destpêka salên 1980 yî] *têk çû. Sîh salên têkoşîna çekdarî jî niha têk diçe. Bazara wan bi kêrî tu tiştekî jî nehatin û ji hevdîtinan jî tiştek derneket. Divê mirov red bike li welatekî sînhalayî yê bûdîst, di bin dagîrkeriya leşkerî de bijî. Ji ber ku artêş ji bo demeke dirêj li Bakur û Rojhilatê bi cîh bû. Li Jaffnayê biniherin: ev bîst sal in ku bajar ketiye, lê hergav serbaz li kolanên wî dewriye digerin."*

Li jora bakurê Giravê, nîvegirava Jafnayê ji cerga ku di sala 1996'an de ketiye destê artêşê bûye herêmeke ewleyiya bilind (HEB). Li ber deriyê paytexta Tamûlên Srî Lankayê ya dîrokî, di navbera du kozikên ku bi mîtralyozan tên parastin de, li ser panoyeke pirr mezin bi ingilîzî weha dinivîse: "Yek welat, yek netewe". Jafnaya ku gellek caran ji alî LTTE'yê, ji alî komên Tamûlî yên rikeber, ji alî yekîneyên seferî yên hindî (1987-1990) û ji alî artêşê ve dor bi dor hatiye girtin, ji salên 1990'î û vir ve wêran e. Tu şantiyeyeke dest bi avakirina tiştekî kiribe tuneye. Karmendekî Neteweyên Yekbûyî dibêje *"Rewş baştir dibe"* û didomîne: *"Qedexeya derketina kolanê rabûye, masîgir ji nû ve dikarin derkevin ser deryayê û nêçîra xwe bikin. Kontrola nasnameyan kêmtir bûye."* Lê hîn jî tirs li nîvegravê serdest e: ji bilî kontrola leşkeran, Jafna di bin destê Partiya demokratik a gelê Elamê (EPDP) û hêzeke milîs a Tamûlî de ye -ku ji 1987'an vir ve girêdayî Kolomboyê ye. Di dema dawîn a şerrî de, di navbera salên 2006 û 2009'an de, hejmareke girîng –ku li gor parêzvanên mafên mirovî ji çend sedekî pêk tê- ji kesên herêmê hatine kuştin an jî "wenda" bûne. Jêdereke hukumetê dibêje, *"Diyar e ku EPDP ji bo ku heyfê ji LTTE'yê hilîne hatiye wezîfedarkirin"*. Gellek sedemên wê hene ku Serokê rêxistinê, wezîr Douglas Devananda, ji Pilingan nefret bike: ew ji sêzdeh suîkastan filitiye. Ji ber ku nikaribûn xwe bigihînin wî, LTTE'yiyan hevala wî kuştiye.




Tevî ku ev kuştin di dawiya sala 2008'an de kete situyê milîsên nêzîkî hukumetê jî, kes newêre bersiva pirsên me bide. Bi tenê metranê katolîk yê Tamûlî, Thomas Sandernayan –ku diyar e ku bi saya statuya xwe ya civakî tê parastin– qebûl kir ku bersiva pirsên me bide: *"Di tebaxa 2006'an de, keşe Jim Brown, li gel şifêrê xwe, li girava Kaytsê, li navenda Jafnayê wenda bû."* Berî vê ne bi tiştekî, zabitekî hukumetê ev rahibê Tamûlî bi mahneya têkiliya wî ya li gel gerillayan bi mirinê tehdît kiriye. *"Me xwast ku lêpirsînek pêk were. Lê lêpirsînerên ku ji alî Kolomboyê ve hatibûn şandin zimanê bi tamûlî nizanibûn. Û serbazan jî nexwast di vî warî de hevkariyê bikin."*

**Li ber deriyê paytexta Tamûlên Srî Lankayê ya dîrokî, di navbera du kozikên ku bi mîtralyozan tên parastin de, li ser panoyeke pirr mezin bi ingilîzî weha dinivîse: "Yek welat, yek netewe".**

Li navenda girava Kaytsê, bi hezaran tûrîstên sîngalî li ser giravoka Naynatîvuyê civiyane: dixwazin biçin heca perestgeha Nagadîpa, ku Bûda bi xwe jî dihat serdana wê. Serbazên deryavan ên çekdar alîkariya hecacan dikin ku hilkişin ser keştiyên bargiran, û yên ku ji ber germayê ketine erdê bi ser heşê xwe ve tînin. Efserek pesnê xwe dide: *"Doh, me pêşwazî li 10 500 kesan kir."* Mirovekî "rêzdar" ku ji başûr hatibû, bi xeftanê xwe yê pirteqalî kêfa xwe tîne: *"Terorîstên Tamûlî ev perestgeh wêran kiribû. Artêşê ew ji nû ve ava kiriye. Piştî ewqas salan, di encamê de bûdîzm dîsa vedigere ser vê axê."* Divê bê zanîn ku gellek bonzeyên (rahibên bûdîst) Srî Lankî ji aliyê siyasî ve xwe nêzîkî rasta tûndrew dibînin, û bawer dikin ku welat ji xeynî Sîngaliyên bûdist pê ve ne yê kesî din e. Keşeyên bûdîst ên berendamên hilbijartinên giştî, li ser afîşên xwe li gel serbazan poz didin. Ji ber vê yekê, Tamûlî, çi hîndû û çi jî xiristiyan, di nav refên van heciyên bûdîst ên ku girtine ser Naynatîvuyê de diyardeyên *"dagîrkeriyê"* hîs dikin.

Hîskirina vê dagîrkeriya ku roj bi roj zêde dibe li Rojhilatê welêt jî xuya dibe, ku li wira Sîngalî, Tamûl û kêmayetiya misilman (% 7'ê giraviyan) digihên hev –û carinan jî şerrê hev dikin. Li bajarê Amparayê, bi hezaran gundiyên misilman hew ku dîtin bi mahneya "lêkolînên arkeolojîk" dest danîne ser zeviyên wan. Li gorî Myown Mistefayê kevnewezîrê xwendina bilind, destdanîna ser axê ji bo berjewendiyên hemdînên xwe *"ji aliyê tûndrewên bûdîst yên ku li dora serokatiyê kom bûne ve, li miqamên bilind hatiye plankirin"*. Ferîd, gundiyekî kal e û xemgîniya xwe weha tîne zimên: *"Bonzeyan, li nav erdên min kêlikek çikandin, paşê jî ji min re gotin ku ew devereke dîrokî ye û êdî tu mafê min yê ku ez destê xwe bidimê tuneye."* Ji wê çaxê û vir de, zeviyên wî beyar in: Ferîd dizane ku zabita alîgirê keşeyên bûdîst in. Weke li vira, li Bakur jî, serdestiya Hiqûqê têgeheke razber e: hêzên polîs alîkariyê ji "dewriyeyên Karûna" yên xurt distînin –ku Karûna kevneserokê herêmî yê LTTE'yê ye û di 2004'an de ji wan veqetiyaye-. Beranberî vê jî, Vinayagamoorthy Muralidharan'ê ku navê wî yê din " Karûna " ye, hatiye efûkirin û, weke Devananda, bûye xwediyê karekî li wezaretê (5).

Li Kolomboyê, hêzên paramîlîter ên tamûlî tunene ku mixalifan bêdeng bikin, lê *"white vans"* hene: kamyonetên sipî û bê plaqe ne, ku nîvê şevê rikeberan direvînin û bê asteng di kontrola polîsan re derbas dibin. Karîkaturîstekî bi navê Prageeth Eknaligoda, di 24'ê çileya paşîna 2010'an de, her bi vî rengî piştî ku ji cîhê karê xwe derket "wenda" bû. Di 8'ê çileya paşîna sala berî wê de jî, Lasantha Wickrematunge, sernivîskarê *Sunday Leader,* ji ber sernivîsên xwe yên rexneyî yên tûj li nava kolanê hate kuştin. Ronakbîrekî tamûlî bi keser dibêje *"Lasantha jî roj li nîvro, li pêş çavên herkesî hate kuştin, ku pismamê kevneserokkomar Kumaratunga bû"* û lê zêde dike: *"Wê çaxê, herkes têgihîşt ku ew dikarin kî têkeve ber wan bikujin."* Parêzvanên mafên mirovî, parêzer, rojnamevan, nameyan werdigirin ku wan bi xayintiyê, bi piştgiriya Pilingan ve tawanbar dikin û bi kuştinê tehdît dikin. Thana Balasingam, birêvebirê rojnameya *Thinakkural* ("rojnameya rojane") ya tamûlî, dibêje *"Li vira, rojnamevan karê xwe bi serbestî dikin"* û tinazê xwe dike û dibêje, *"lê kujerên rojnamevanan, ew jî bi azadî karê xwe dikin."*



Ji cerga ku di 26'ê çileya paşîn de ji nû ve hatiye hilbijartin, Rajapakse destê xwe li qirika rikeberan û medyayên serbixwe şidandiye. Raqîbê wî yê hilbijartinên serokkomariyê yê têkçûyî, kevneserokerkanê giştî yê artêşê Sarath Fonseka, ji meha sibatê ve girtî ye, û derket pêşberî dîwana herbê. Hêrseke ku mirov şaşûmat dike (tevî vê jî bêyî ku bi baweriyên demokratîk ên Fonseka bixape). Parêzvanekî mafên mirovan ku bi mirinê hatiye tehdîtkirin ji me re dibêje: *"Serokkomarî Fonseka bi amadekirina darbeyeke leşkerî tawanbar dikir"* û wî sûcdar dike "*Lê wî bi xwe ev derbeya leşkerî kir"*, bi taybetî jî balê dikişîne ser ku serbaz li her derê û herweha Gotabhaya Rajapkase'yê wezîrê parastinê ku di heman demê de birayê serokkomarî ye tirs xistiye dilê herkesî.

Serokkomar di pirsa ku tu kesên berî wî tê de bi ser neketine de bi ser ket: wî LTTE'yî, yek gerîllayên cîhanê yê herî xurt ji holê rakirin. Ev serketin helbet bi saya alîkariya Çînê bû, ku dixwast bibe dosta Srî Lankayê, lewre ev welat li ser rêya çavkaniyên wê yên petrolê ye û li hember raqîba wê ya mezin Hindistanê ye. Washingtona ku ji vê peymana di navbera Pekîn û Kolomboyê de bi tirs e, ji bo hilbijartinên serokkomariyê di bin destan re piştgirî dabû general Fonseka.

Li gorî gellek çavdêran, îhmalkariya di warê mafên mirovan de yek ji kilîtên serkevtinê yên sereke ye. New Delhî di wê baweriyê de ye ku LTTE tenê ji bo ku demê qezenc bike dixwaze hevdîtinan pêk bîne, û ji bo wê jî, piştgirî da –helbet di bin re, ji ber tirsa ji nifûsa Tamûlên Hindistanê (6) ya mezin- vî şerrê kişûmat (7). Êrîşên Naksalîstan li Hindistanê gurr dibin (6'ê nîsanê, 75 polîs di kemînekê de li Chhattisgarhê hatin kuştin; 28'ê gulanê, li Bengala rojava, 148 qurbaniyên sîvîl di sabotaja li hember trênekê de hatin kuştin …), Kolombo êdî "pisporiya" xwe ya dij-serhildan pêşniyazî cîrana xwe ya mezin dike. Rejima M. Rajapakse serkevtinê heta radeya karîkaturîzekirinê tan dide. Weke nimûne, li ser aliyekî 1 000 rûpiyê nû wêneyê serokkomar û li ser aliyê din jî yê serbazên ku ala neteweyî –mîna piyadeyên deryayî yên Amerîkayê, di sala 1945 an de, li Iwo Jimayê- diçikînin heye. Ev handan jî rê li ber lihevhatinekê digire. Rewşenbîrê sîngalî Jehan Perera dibêje *"Sîngalî êdî Bakur weke erdeke fetihkirî dihesibînin"* û lê zêde dike: *"Dema şerr, ew ji Pilingan ditirsiyan. Wexta agirbestê jî, têkiliyeke wekheviyê di navbera Sîngaliyan û Tamûlan de çêbû. Lê nuha, mirov dibîne ku peywendiyeke hukumraniyê di navbera yê serketî û yê têkçûyî de ava dibe."*

Hesabê tu tawîzên siyasî nayê kirin. Tamûliyê serbixwe hilbijartî, Somasundram Pushparajah, ku ew jî bi mirinê tê tehdîtkirin bi xemgînî dibêje: *"Konseya wîlayeta rojhilat fîgurantiyê dike"* û balê dikişîne ser: "*Ger hukumet îmtiyazên rastîn bide wîlayetan, problema etnîkî dê çareser bibe."* Serokayetî di wê baweriyê de ye ku avadankirina herêmên li ser nelihevkirî dê kêmayetiyê razî bike. Lê, metranê Jafnayê rastiyê tîne zimên, *"Tamûlî dê tu carî peşketineke aborî ya navendîkirî, ku ji alî Kolomboyê ve bê birêvebirin û ew jê fêdeyê nebînin qebûl nekin"*. Bi taybetî jî ku mirovê bernameya ji nû ve avadankirinê girtiye ser xwe jî Basil Rajapakse ye ku ew jî birayekî serokkomar yê din e…

Di encamê de, Jehan Perera dibêje ku têkçûyina Pilingan *"rêyê li ber demokrasiyeke pirreng, ku rêza mafê herkesî bigire vedike. Lê em berevajî vê rêyê diçin: em bi rêya Malezyayiyan de diçin. Bi rêya rejimeke otorîter, demokrasiyeke bisînorkirî de diçin ku di nava wê de mafên mirovan girêdayî pêşketina aborî bin."*

1 Bixwîne: «Un Etat de facto pour les Tigres Tamouls» (Ji bo Pilingên Tamûlî Dewleteke fiîlî), *Le Monde diplomatique*, sibat, 2004

2 Binihere: *Thalassa*, (bernameya televizyonê) ya France 3, 2 nîsan 2010

3 Bixwîne: Eric Paul Meyer, «Ressorts du séparatisme tamoul au Srî Lanka» (Li Srî Lankayê hêza cudaxwaziya Tamûlî), *Le Monde diplomatique,* nîsan, 2007, û *Srî Lanka: entre particularisme et mondialisation (Srî Lankaya di navbera biserêxweman û cîhanîbûnê de)*, *La Documentation française*, Paris, 2001

4 Ji 1,5 milyonê bêtir Tamûlî li sirgûnê, bi taybetî jî li Ewropaya bakur û Kanadayê dijîn. Bi alîkariya xwe ya –ji dil an bi zorê- diyaspora xweseriya diravî ya LTTE'yê misoger dike

5 Bixwîne: Anuradha Herath, «The Saga of Colonel Karuna» (Çîroka Qumandar Karûna), *Huffington Post*, tîrmeh 2009

6 Bixwîne: «Lessons from the war in Srî Lanka» (Dersên ji şerrê li Srî Lankayê), *Indian Defence Review*, îlon 2009

7 «En Inde, expansion de la guérilla naxalite» (Li Hindistanê, geşbûna gerillayê Naksalîtî), *Le Monde diplomatique,* çileya pêşîn 2007

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

Foto: LMd arşîv

## MEDYAYEKE NÛ LI SER MEDYAYÊN BERÊ

# WikiLeaks û çîrokên serdema teknolojiyê

CHRISTIAN CHRISTENSEN *

Piştî daxuyaniyên xwe yên li ser şerrê Afganistanê, malpera WikiLeaksê hêza medyaya hevgirtinê nîşan dide. Digel vê jî, ev gav ne destpêka dewreke nû ye, lewre êdî sansur tuneye, medya sînorên neteweyî derbas dikin û medyayên ku bi awayê kevn kar dikin jî êdî qels dibin.

Mîta yekem: medyayên ku jê re dibêjin «civakî» -ku naveroka wan qismen ji aliyê bikarhêneran ve tê diyarkirin û tijîkirin- xwedanê hêzeke diyar û spesîfîk in. Gellek munaqeşe rabûn li dora pirsa ka meseleya WikiLeaksê li ser rola nû-medyayên kooperatîf çi nîşan dida, bi taybetî li ser rola wan a di ragihandin û pêdaçûna dubendiyên çekdarî de. Pirsiyar asayî ye û tu tiştê balkêş pê re nîne, lê belê di heman demê de sergêjiyek dinimîne ku her bêtir berbelav dibe: sergêjiya ku dike ku blog, Twitter, Facebook, YouTube an jî WikiLeaks wek manendên hev bêne dîtin. Ji ber ku heman teknolojiyê bi kar tînin, ev alavên teknolojîk di ristekê de û wek komeke homojen têne nirxandin. Lê belê, ji medyayên din ên kooperatîf cudatir, WikiLeaks, belgeyên ku ji bo belavkirinê hatine pêşkêşkirin, hemûyan, pêşî di proseseke pêdaçûyî ya kontrolkirina pêbaweriyê re derbas dike. Bes detayek e ev? Bi pêçevane: ev awayê birêveçûnê, qerekterê xeyalî yê îlûzyonên «tekno-utopîk» derdixe ronahiyê, ku li gorî wan, êdî pêkhatina wê «dunyaya vekirî» nêzîk e ku herkes dê bi hemû hêz û taqeta xwe hewl bide ya ku jê re baş û xweş e wekî heqîqetê li sertaserê cîhanê berbelav bike.

Bandora WikiLeaksê ne ji ber teknolojiyê ye, lê bêtir bi saya wê baweriyê ye ku xwendevanên wê dê bi rasteqîniya belgeyên lê têne belavkirin bînin. Li ser YouTube'ê (platformek e ku vîdyoyên ji aliyê bikarhênerên înternetê ve jê re têne şandin) hindek vîdyo hene ku li Iraq an jî li Afganistanê hatine girtin û tê de nîşan dide ku hêzên hevpeymanan dikevin nava kiryarên êrîşkar ên wisa ku tu raveyeke rewa jê re nîne, hetta gellek caran pirr bi aşkereyî deryasayî ne jî. Digel vê hindê jî, tu belgeyên din yên mîna wan belgeyên ku ji aliyê WikiLeaksê hatibin belavkirin, bi qasî wê nikarin xwedan-tesîr bin: qetlîama komeke sîvîlan –ku du jê rojnamevanên Reutersê bûn– bi destê helîkoptereke amerîkan ya şerrî li taxeke derveyî Bexdadê. Çima? Ji ber ku nûçeyek bi tenê gava rasteqîniya wê dikare were teyîdkirin bi qîmet e. Lewma, «medyayên civakî» giş wekî hev nînin di meseleya nûçe-belavkirinê de: xelet e ku bibêjin ku hemû xwedanê heman şiyan û zerengiya karîgeriyê ne.

Mîta duyem: Serdema netewe-dewletan berebere digihije dawiya xwe. Pareke mezin a gotara ku pesnê înternetê dide xwe disipêre wê fikra ku dibêje, bi berbelavbûna înternetê re êdî em dê di cîhaneke bêsînor de bijîn. Bi ya Jay Rosenê profesorê ji Zanîngeha New Yorkê, WikiLeaks dê herweha bibe *«yekemîn organa çapemeniyê ku xwe ji her cure hêzeke dewletî xelas dike»*. Lê belê, rastî bi temamî berevajî vê yekê ye. Heke bi tenê tiştek hebe ku «meseleya WikiLeaksê» li me eyan dike, ew jî ew e ku netewe-dewlet hêj pirr dûrî xwatirxwastinê ye. Diyar e ku berpirsên WikiLeaksê jî ev yek baş fam kiriye.

Binkeya WikiLeaksê li Swêdê ye. Ji ber vê hindê, malper îstifadeyê ji xerantiyeke îstisnayî dike ku rayedarên swêdî dabîn dikin ji bo «belavkerên hişyariyan» di meseleya parastina nihêniya çavkaniyan de (1). Lê belê, mesele hemû ne ev e. Herçend şirketeke swêdî jî be –PRQ– ya ku meydana înternetî daye WikiLeaksê, hemû belgeyên ji malperê re têne şandin di ber destên serverên li Belçîkayê re derbas dibin. Ji ber çi sebebê? Ji ber ku Belçîkayê jî herweha yasayên pirr tûnd hene ji bo parastina çavkaniyan. Herî dawî, avakerê WikiLeaksê Julian Assange ji bo pêşkêşkirina vîdyoya qetlîama Bexdadê (li jorê hate behskirin), Îzlandayê hêj taze hejmareke yasayan qebûl kirin (Icelandic Modern Media Initiative) û bi wan yasayan tercîha xwe bi Îzlandayê da ku diyar e ku welatê navhatî dê bibe starek ji bo belavkerên hişyariyan û rojnamevanên vekoler.

### Bipêşketin, ne rabûna ji holê

Nimûneyên tesîra dewlet û yasayên neteweyî li ser qaşo «herikbariya» cîhana teknolojîk digel hindek dewletên din zêdetir dibin, wekî biryara Emîratên Ereb yên Yekgirtî û Erebistana Suûdî ji bo qedexekirina bikaranîna kardaya peyamnêra bilez a navendên danekeriya [data processing] Blacberryê, an jî qedexekirina YouTube'ê li Turkiyeyê. Herçend rast jî be ku avahiya WikiLeaksê bi şiklekî wisa hatibû danîn ku xwe ji hindek yasayên neteweyî xelas bike (bi rêya teknolojiya dîjîtal), dibe ku WikiLeaks herweha li welatine cuda bibe binasê derxistina yasayên din. Wikileaks ne li ser û ne jî li bin yasayan e: malper di nava wan çarçoveyên hiqûqî de «diçerixe» ku jê re ji hemûyên din destxweştir in.

Mîta sêyem : rojnamevanî miriye (an jî di ber sekeratê de ye). Nivîskarê amerîkî Mark Twain carekê gotibû, *«xeberên derheqê mirina min de pirr têne mezinkirin»*. Diyar e ku em dikarin heman tiştî derheqê rojnamevaniyê de jî bêjin. Bêguman, nimûneya WikiLeaksê nîşan dide ku teknolojî me mecbûr dike ku wateya peyva «rojnamevaniyê» dîsa diyar bikin, an jî qet nebe bêtir deqîqtir bikin, lê belê di heman demê de rola navendî ya vê hunerê di belavkirina nûçe û agahiyan de piştrast dike. WikiLeaksê, çend hefte berî ku wan belgeyên xwe yên derheqê şerrê li Afganistanê de bixe ser înternetê, pêşiyê ew şandibûn sê rojnameyên mezin ên xwedanê bandoreke navneteweyî (*The Guardian*, *The New York Times* û *Der Spiegel*), lê ne ji bo weşanên «alternatîf». Diyar e ku biryareke pirr baqilane bû, lewre heke ew belge rasterast bixistana ser înternetê, organên çapemeniyê li sertaserê cîhanê dê hemle bikirana ser agahiyan û dê şêlûbêla tehlîlên belawela û aloz rabibûya. Bi pêçevane, bal û dêhn li ser wan sê rojnameyan berhev bûn ku wan jî bi rexê xwe ve îstifade ji wext û îmkanên xwe kirin ji bo tehlîlkirin û belavkirina kurte û cewherê belgeyan.

Aşkere ye ku hîpoteza mirina rojnamevaniyê û mirina netewe-dewletê heman xeletiyê dikin gava ku guherîn û mirinê têkel dikin. Şert û merc û serkeftina belavkirina Namilkeya şerrê Afganistanê nîşan da ku rojnamevaniya «adetî» tu tişt ji bandor û bikêriya xwe ji dest nedaye. Bi tenê, ev bîst sal in ku tebîetê rola ku lê tê spartin diguhere.

Mîta dawiya rojnamevaniyê –û encam û dewama wê, serkeftina medyayên civakî– xwe disipêre şaşiya ku dibêje di navbera «agahî» û «geşedana demokratîk» de peywendiyeke sebebî heye. Lê belê, qenaeta ku berdestbûna agahiya «xav» di fiîliyatê de rêya azadiyê vedike, qet nebe bi qasî wê qenaetê safane ye ku wê hêza azadker a navxweyî dide teknolojiyê. Agahî û nûçe, her wekî teknolojiyê, bi tenê gava ku bi xêra zanyarî û şiyanan îstifadeyeke girîng jê tê kirin, wê hingê kêrhatî ne. WikiLeaksê sê rojnameyên ji bo çi îdeolojiya xwe nêzîk hilnebijartin, lê belê sê organên medyayê yên ku xwedanê îmkanên rêxistinî, pîşeyî û aborî ne hilbijartin, da ku bikarin belgeyên navhatî belav bikin û bigihînin hejmareke mezin a xwendevanan.

Berevajî gotarên nerm û aştker ên ku cîhana dîjîtal weke cîhaneke «asoyî», û ji derveyî desthilata dewletan û herikbar, didin naskirin, WikiLeaks tîne bîra me ku avahiyên heyî, sînor û yasayan tu tişt ji girîngiya xwe wenda nekiriye.

* Doçent doktor di beşê Zanistên agahî û medyayê de li Zanîngeha Uppsalayê, li Swêdê.

1 Divê ev tişt jî li ver çavan were girtin ku di vî warî de çend guman hene ku Wikileaks xwe nikare li paş qanûnên Swîsreyî de veşêre.

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn



# Lênûskên karkirên Çînê yên gazindan

ISABELLE THIREAU *

*Ez di vê kargehê de, ji 5'ê hezîrana 2006'an û bi vir ve dixebitim. Meaşê min mehane li dora 1400 yenî* [158 euro] *ye, ev jî ji meaşê yên ku nû dikevin kar bi tenê bi sed yenekî zêdetir e. Li gorî we, ma ev yek heqrewa ye? Gelo ne neheqî ye ku mehaneya min di sala duwem de bi tenê 28, di sala sêyem de 29 û di ya çarem de 40 yen zêde bibe ? Ma heq heye ku % 40'ê kesên ku li vira dixebitin stajerên bin ku pirr hindik mehane distînin, û ev jî bandora xwe li mehaneya herkesî bike? Aya ji Xwedê heqrewa ye ku pênc derence hebin û her derenceyek jî ji panzdeh pêlikan pêk bê, ew jî tê wateya ku ez hertiştî weke ku ji min tê xwastin bikim jî, ji ber ku ez ê karibim salê bi tenê pêlikekê derbas bikim, ji min re şêst û pênc sal divên heta ku ez bigihêm derenceya herî bilind? Ev çawa heqî ye, ku mirov ewqas bixebite û nikaribe mehê ji xwe re du sed, sê sed yenan bide aliyekî? Pirr sozên dayî ku nehatine girtin hene, gellek newekhevî û bêdadiyeke dijwar heye. Ger em van tiştan hemûyan qebûl bikin, ma em çi ne, li ber çi ne? Ji me re rêyeke din nemaye: Ev grev, ji bo me meseleya rûmetê ye* (1)*.»* Karkirekî kargeha perçeyên jihevkirî ya hilbera otomobîlan Hondaya Japonî, li Foshana wilayeta Guangdongê ya Çînê ku di meha gulana 2010'an de lê grev çêbûbû, rewşa xwe bi hevokên li jorê rave dikir.

Hertiştî, di 17'yê mehê de, gava ku nêzîkî sed karkiran ji bo protestokirina biryareke birêvebiriyê ya neheq dev ji kar berda, dest pê kir. Di vê kargehê de, bi rastî, tezmînat weke biserhevdana gellek hêmanan tê hesibandin: ji bo karkirên xeşîm yên pêlika yekem, weke mînak, bi mehaneya asgarî (675 yen = 75 euro) li gorî vatiniyê li mehaneya wan (340 yen = 37 euro) zêde dibe, herweha tezmînatên cuda, ji bo lojmanê yan veguhestinê, ku bi saya wan mehane li ser hev digihê 1 510 yenî (168 euro) (2). Lê, di dawiya meha nîsanê de, şaredariya Foshanê diyar kir ku, ji 1'ê gulanê û pê ve, mehaneya asgarî a herêmî dê ji 770'yî derkeve 920 yenan (ji 85'an derkeve 102 euroyan). Birêvebiriya kargehê li hemberî vê yekê bêdeng nema û biryara xwe da ku vê zêdebûnê ji tezmînata asgarî kêm bike, lê di heman demê de, wê ya girêdayî vatiniyê jî kêm kir û zêdekirineke girîng a mehaneyê jî ku diviya bikira nekir. Ji bo vê jî, piştî lihevkirineke bi şanzdeh nûnerên karkiran re ku ji derveyî sendîkayên fermî hatibûn destnîşankirin, birêvebiriyê soza zêdekirina 500 yenî (55 euro) ya li hemû mehaneyan da û grev di 4'ê hezîranê de bi dawî hat.

Bi vê minasebetê, karkiran nameyeke vekirî nivîsî û tê de ji kardarê xwe xwast ku *«ji bo ku ew durustiya xwe îspat bike, divê gotûbêjên durust qebûl bike û gûh bide daxwazên wan ên maqûl».* Ev belge diyar dike ku têkoşîna wan ne bi tenê ji bo karmendên kargeha wan e, herweha ji bo hemû karkirên Çînê ye. Belge di heman demê de lîsteyeke daxwazên di derbarê derenceya mehaneyan de, nûnerayetiya karmendan, awayên nirxandina kar û pîvanên terfîkirinê de jî destnîşan dike.

Piştî ku grev bi dawî hat, bala xelkê bi rojan ma li ser xwekujiyên li *Foxconn Technologya* li Shenzhenê. Di pênc mehan de, sêzdeh karkirên ciwan ên vê fîrmaya Taywanî, ku pêkhatên elektronîk ji bo markayên biyanî çêdikirin, xwastin xwe bikujin û deh ji wan mirin. Di 20'ê tîrmehê de, li Foshanê, karkirekî fîrmayeke havalbenda *Foxconnê*, ku 18 salî bû, dawî li jiyana xwe anî (3). Piştî vê, Şîrketê diyar kir ku wê mehaneya bingehîn a karkirên çînî zêde bike û qaîdeyên ku li karkiran ferz dike jî biguhere.

Lê divê mirov herdû fîrmayan bi bayê bezê tev li hev neke. Li Foxconnê, mehaneyên kêm ên bingehîn karkiran mecbûr dikin ku ji dema ku bi qanûnê hatiye diyarkirin zêdetir bixebitin. Ev jî dibe sedema îzolebûneke mezin, him ji hevkarên xwe yên li atolye û nivînxaneyan, him jî ji cîhana derve qut dibin. Li fîrmaya Hondayê, diyar dibe ku têkilî ji aliyekî ve di navbera karmendên ji herêmekê de pêk tên û ji aliyê din ve jî di navbera stajerên ji heman dibistanê de pêk tên.

Ji aliyê din ve, ji cerga ku Foxconn, li Çînê bi cîh bûye, him wexta kar him jî wexta bêhnvedanê, disiplîneke weha bi kar tîne ku ji ya leşkeriyê jî tûndtir e. Ew pişta xwe dide hemû hêza mirovên ewlekariyê ku dikarin heta bi darê zorê jî karmendan ceza bikin. Sedema xwekuştina yekem a karkirekî ji ber wê bû ku, ji ber ku bi diziyê hatibû tawanbarkirin, lê geriyabûn û ew girtibûn û heta ku li sûcê ku wî xwe nekiribû jî mikur hatibû. Karkirên Hondayê û yên Foxconnê, li hemberî bûyerên weha ku di mijar û radeyên cihê de pêk dihatin û ji bo wan nedihatin qebûlkirin, bêdeng neman. Bûyereke din bû sedem ku karkirên Hondayê rasterast bi sendîkayên fermî re bikevin pêsîra hev: 31'ê gulanê, nûnerên wan yên ku ji unîformayên xwe dihatin nas kirin, li hemû kargehê belav bûn, bi zorê êrîşî gellek karkiran kirin û bi awayekî fermî ji wan xwastin ku ew dest bi karê xwe bikin. Grevîst dibêjin ku heta nuha kesekî ji wan nexwastiye ku ew wan weke nûnerên xwe hilbijêrin û ew ji pêkanîna rola ku dema grevê ji wan dihate hêvîkirin bi dûr in.

Ev herdû bûyer, bi awayekî qismî jî be, diyar dikin ku ev zêdebûna mehaneya asgarî ya pirr ku heta nuha nedîtî bû, li gellek bajar an şaredariyan bi awayên cuda pêk hatiye (960 yen li Pekînê, 1 120 yen li Şangayê). Bê şik, anketa ku di hezîrana 2010'an de, ji aliyê karbidestên Shenzhenê ve li gel pênc hezar koçberên ku temenê wan di navbera 18 û 35 salan de bû hatibû kirin jî, divê ji wan re ne xerîb be: em dibînin ku ev koçber mehê li dora 1800 yenî qezenc dikin, ji pêncan yekê vî pereyî dişînin ji malbatên xwe re, û nîvê wan gellek saetên zêde yên neqanûnî jî dixebitin (4). Wan herweha birêvebirekî çînî, Zhou Yongkang di 15'ê tîrmeha 2010'an de şand birêvebiriya name û seredanan ji bo ku ji wan re bibêje ku divê hertiştî bikin, da ku pirsgirêkên civakî çareser bikin û bersiva giliyên di derbarê cîhê kar de bidin (5). Zhou dizane ku tevî kêmbûna hejmara giliyan (bi taybetî jî yên bi komelî), tansiyonên civakî yên girêdayî giştîkirina zeviyan, hilweşandina neguhêzbaran û îstîhdama bihêzmaye ye; ew *«ji desthilatên mistewayên cihê dixwaze ji bo bêtir han bidin ku pirsgirêkên kar çareser bikin û daxwazên karmendan ên maqûl jî bigirin ber çavan».*

Serîhildanên weha bi taybetî ne bi tenê bi herêma endustriyel ya deşta rûbarê Perlesê ve sînorkirî ne. Hîn ji destpêka gulana 2010'an ve, bi rastî jî grevên girîng wîlayetên weke Shandong, Jiangsu û Yunnanê, herweha bajarên Nankin, Pekîn, Chongqing û Lanzhouyê hejandin. Grûba Toyotayê jî, di navbera 1 û 15'ê gulanê de, bû qada nêzîkî deh grevan ji wan. Li Changchunê, 1'ê tîrmehê, hivdeh hezar ajovanên teqsiyan ên bajêr, ji bo protestokirina baceke nû dev ji kar berda. Ev bûyer beşek ji tevgereke hîn mezintir a gurbûna grevan e, ku serê du salan e weke li fîrmayên biyanî li yên Çînî jî hatiye dîtin; bi dirêjiya vê pêvajoya ku ji nîveka salên 1990'î de dest pê kiriye, ev geremola civakî geş dibe: rawestandina karî, nameyên hevbeş ên ji birêvebirên herêmî û Parlamentoya neteweyî ya gelerî re rêkirî, seredanên organên birêvebiriyê, giliyên bi rêka înternetê belavkirî û hwd.

Bi gotineke din, karkirên çînî yên koçber hergîz sernerm nebûne. Ger komeke yekbûyî pêk bînin jî, mirovan bi ceribandinê û bi projeyên gellekî ji hev cihê li hev dicivînin û ew ji "herêmîtiyê" bêtir rewşa nelibar a kesên saziyekê tercîh dikin. Wan tucarî dev ji dijayetiya newekheviyên girêdayî sîstema belgeya îkametê (yan hukou), protestokirina bêdesthilatkirin û stuxwarkirina bi zorê ku li fîrmayan duçar dibin bernedaye. Ji aliyê din ve, mirov dikare têkiliyeke rastarast di navbera kiryarên ku ew pêk tînin û pêşketinên di warê hiqûqa karî de, deyne ku weke mînak derketina qanûneke li ser peymanên karî ku di sala 2008'an de hatiye nîgarkirin.

Rewşa koçberan bi xwe jî vê têkoşînê teşwîq dike. Ber bi başiyê ve çûyina hatiniya gundiyan, bi rastî jimara berendamên çûyinê ango koçberiyê kêm kir. Koçber dixwazin formasyonan wergirin ku pê derfeta mercên baş ên îstihdamê û jiyaneke li gorî ya yên pêşiyên xwe bêtir mirov karibe qebûl bike bi dest bixin. Ji xeynî vê, hatina bazara kar a zarokên koçberan ku tim li bajaran jiyane, lê bi awayekî fermî weke «biyanî» tên hesêb û bi yên ku bi hev re mezin bûne re heman reftarê nabînin, dibe sedema hin hestên din ên bêdadiyê. Ji ber ku wan heta nuha jî grevê bêtir, derdê xwe bi wasîteya birêvebiriyeke nihênî, xwedêgiravî «bi name û bi seredanan» îfade dikir, kesî guh nedida daxwazên wan. Ji herêmê heta pîleya herî bilind a Dewletê, ev sîstem, di 1951'ê de li ser bingeha buroyên bi pêşwazîkirin û pêşkêşkirina pêşniyazan, daxwazên alîkariyê, bangên ji bo ji nû ve darizandina tawanên siyasî û îdarî yên ku neheq hatine dîtin, rexne û tawanbarkirinê hatine wezîfedarkirin hatiye avakirin. Ev serê şêst salan e ku ew qadeke axavtinê meşrû dike ku ew jî bêrawestan ji alî van gundî, bajarî, serbaz an jî xwediyên malên neguhêzbar ku ew bi destxistine ve diguhere. Di navbera 1993 û 2005'an de, gilî salê % 10 zêde bûne û seredan –bi taybetî jî seredanên komkî, ku carinan bi hezaran mirovan bi serê rêyan dixin- ji nameyan zûtir digihên armanca xwe. Ya herî girîng, herweha kesên ku tim bala hukumetê dikişînin ser pirsgirêkan, gazindan dikin ku pirsên herêmî êdî sînorên herêman derbas dikin, digel ku ev pirsgirêk diviya di cihê xwe de bihatana çareserkirin.

Herçend hiqûq, dîn, rêxistina kiryarên komkî, karibin hîsên neheqiyê îfade bikin jî, birêvebiriya name û seredanan bûye cîhekî tecrubeyên yê weha ku Çînî li wira ji demeke dirêj ve ye ku kapasîteya xwe a girtina însiyatîfê, stendina biryaran, ravekirina serpêhatiyên xwe ya ku weke bi xwe re dipeyivin, lê di heman demê de, derdê rastiyê» bibîne. Lê ew herweha jî mehareta nû ya protestokiran derdixe holê, ku çawa bi her awayî dixebitin ji bo desthilata navendî bixin bin destê xwe. Grevkerên ku ji bo şîrketên biyanî dixebitin, li argumantên neteweyî yên resmî vedigerin –ji bo wan daxwazên civakî hêza çînê kêm dikin û divê ji bo rojên pêş bên hiştin- ku bergeha xwe ya manevrayê firehtir bikin: meşrûiyeta hêza ku Çîniyên keda wan ji alî patronên biyanî vê tê xwarin bipelixîne dê çi be gelo? Li Changchunê, şifêrên teqsiyan bêtir prensîbên ku ji bo jiyana wan bingehîn in derxistin pêş. Wan herweha greveke serketî ya bihara 2010'an a li bajarekî wîlayeta Sichuanê ji xwe re kir model (danûstendina tecrubeyan her ku diçe hîn bêtir dibe) da ku greveke sê rojî, -maweyê pêdivî ji bo bala karbidestên navendî bikişînin ser pirsgirêkê ku ew jî mudaxele bikin- îlan bikin. Di encamê de, tevgera xwe li bin banê sê sloganan civandin: em rêberên naskirî naxwazin, em rêxistinên fermî naxwazin, em şîddetê naxwazin.

Ev tevgerên ku ji piştgiriya hukumeta çînî bêpar in (grev ji bo handana zêdekirina mehaneyê û berfirehkirina berxwarina hindurî rêyeke pirr xeternak e), bi rastî jî karbidestên navendî dixin tengasiyê. Ev pêvajoyeke weha ye ku nayê zeftê lê hingî bi rik e, têkiliyên desthilatê yên di navbera birêvebiran û yên tên birêvebirin de diguhere.

SERHAD BAPIR



wan dibe derdê xelkê jî û weke ku li ser navê kesine din jî ku heman rewş jiyane, dipeyivin. Ew cîhekî weha ye ku lêpirsîna nûnerên Partiya komunîst û Dewletê, têkiliyên desthilat û qanûnên rewa, bi şahidiya kesên sêyem lê pêk tên. Ji derveyî hemû çarçoveya wê ya demokratîk, mirov lê bi xîret wekheviya mercan dixwaze û bi zor cudahiyên hiyerarşîk ku weke tiştekî xwezayî tên hesêb red dike.

Ji hêla aborî, bi temamî, tiştê ku bi rastî jî karmendên Honda û Foxconnê dixwazin ev in. Ji ber vê jî, bi rastî jî diyar e ku ew mîratxwirên van koçberan in, ku di sala 1996'an de, weha nivîsîne (6): *«Serê perçe heqê me didin me, lê, ji ber ku ev serê çar mehan e ku em hîn nizanin buhayê perçeyekî çi ye, em ê çawa zanibin ka mehaneya me temam yan netemam e? Me weke gamêşan, koleyan, weke robotan dihesibînin… Ma ji Xwedê heq rewa ye ku piçek azadiya me jî tunebe? Gelo gunehê me çi ye, ku bi qasî serê derziyê jî ewlehiya me tunebe? Ev çawa adalet e ku mirov belaş bixebite? Em êdî nema karin stuyê xwe li ber vê bêdadiya malqambax xwar bikin.»*

Mirov bi tenê bi çavekî aborî, an jî pirr demkî li van tevgeran binihere dê bibe şaşiyeke mezin. Berevajiya vê, divê mirov wê weke beşekî ji pêvajoya dûrûdirêj a fêrbûnê, li gorî ravekirina Claude Lefort, «avakirina

* Birêvebira lêkolînan li Navenda neteweyî ya lêkolînên Zanyarî (CNRS) ya Fransayê, birêvebira xebatê li Dibistana Lêkolînên bilind ên di Warê Zanyariyên Civakî de (EHESS). Berhema wê ya dawîn a çapbûyî : *Les ruses de la démocratie. Protester en Chine contemporaine (Hileyên demokrasiyê. Protesto li Çîna hemdem)* (bi Hua Linshan re), Seuil, Paris, 2010.

1 Hevpeyvîn ji alî He Meichuan, lêkolînerê li Unîversîteya Zhongshanê (wîlayet) ve hatiye kirin, Foshan, 29'ê gulana 2010'an. Em spasî wî dikin ji bo ku ev belge pêşkêşî me kiriye

2 Gellek karkiran mesrefên xwe bi texmînî diyar kirin: sîgortaya xanenişîniyê (132 yen), sîgortaya tendurustiyê (41 yen), lojman (126 yen), beşdariya sendîkayê ya mecbûrî (5 yen). Herweha, hatiniya wan a mehane ya net bi tenê 207 yen e. Mesrefên jiyana rojane mehane kêm zêde digihên 500 yenî. Heger karmend li kargehê nemîne ango ji xwe re li derve xaniyekî bigire bi kêmanî divê 250 yenên din bixe ser. Li gor texmîna Banqeya Cîhanî divê hatiniya mehane ya karmendekî çînî yê ku zarokên wî hebin bi kêmanî 1684 yen be ku bikare aboriya xwe bi awayekî normal bike

3 Bixwîne: "South China Morning Postê", Hongkong, 22'yê tîrmeha 2010'an

4 Bixwîne: "South China Morning Posê", 16'ê tîrmeha 2010'an

5 Xinhua News Agency, Pekîn, 16'ê tîrmeha 2010'an

6 "Les ruses de la démocratie. Protester en Chine", r. 267

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

# KULTUR-POLÎTÎK

KEJO BAJAR

## Adetên Kurdan bi zimanê Mela Mehmûdê Bazîdî

*Eger ew mirî mêr e û xweyî hesp û çek û taxim be, hespê wî dixemlînin û çek û sîlahêd li ser hespan girê didin, ewan hespan li berayîka cenazeyê dikêşin û ew jin keç û da û xwehêd wî delo û lawij dibêjin.* Mirov ji vê pirtûkê ne haydar be, dê bibêje qey ev metagraf ji pirtûkekê hatiye wergirtin ku li ser merasîmên miriyên Çermsoran hatiye nivîsandin. Lê ne weha ye, ev metagraf ji pirtûka Mela Mahmûdê Bazîdî ya bi navê *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* hatiye wergirtin. Ev pirtûk nexşeya tevîneka civaka wê demê heya bi movikên adetan derdixîne ku bi xêra vê derxistinê mirov fahm dike bê di bingeha xwe de civatên qedîm çiqasî nêzîkî hev in.

Çi jinên ku di civata zilaman de rûdinên û qelûnên xwe dikişînin, çi jinên ku leçeka serê xwe di nava şerran diavêjin erdê, çi jinên ku sosretekê bi xwe de tînin û tên kuştin, çi ekradên ku pezekî xwe ji bo xwe serjê nakin lê ji bo mêvanan serjê dikin, çi xwediyê xwîniyên ku bi pêy dijminê xwe dikevin û heke keysê bi wan nexînin jî, zirarê digihînin malên wan û êgir berdidinê, çi feqehên ku ji aliyê gundiyan ve tên xwedîkirin, çi mêvanên ku li camiyan radizên, çi şêniyên ku êvara çarşeman serê xwe naşon û hwd. Ev pirtûka ku weneyên arketîpa adetên civaka Kurdan nîşan dide, herweha bi me dide zanîn ku hê jî ji gellekê wan adetan di nava civaka îroyîn ya kurd de jîndar in. *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* wê derfetê dide Kurdan ku di nava civaka modern ya îroyîn de derhişîn û binhişîna livbaziyên xwe bi dê û bav bikin.


Ev pirtûka Mela Mehmûdê Bazîdî di sala 1857-1858'an de hatiye nivîsandin. Dîroka ku tê de hatiye nivîsandin ji bo tarîxa kurmanciya nivîskî jî qonaxeke girîng e. Digel ku Mela Mehmûdê Bazîdî, bi erebî, farisî û turkî jî zanîbû, wî ji bo nivîsandinê zimanê kurdî hilbijartiye- ku wê hingê zimanê împeretoriyê yê nivîsê osmanî û farisî bû.- Ev kurdiya ku pirtûk pê hatiye nivîsandin ewqasî zelal e ku ji aliyê nifşên nû ve jî dikare bi hêsanî bê fahmkirin û ew zelalbûn dê bersiveke xweş bide zimanzanên serdest ku dibêjin ku şêniyên du gundên Kurdan ên cîran ji zimanê hev fahm nakin.

Dîsîplînên weke sosyolojî, psîkolojî, etnografya û wêje dikarin zêde sûdê ji vêhibra nivîskêr bigirin lê oryantalîzm jî tê de. Ji ber ku di xwendina pirtûkê de xwendevan ji çend rûpelan carekê li rastî hevokên weha tên. *"Û Ekrad tebî'et cahil in, hîn bi fal û munnecîm se'd û hindekan şûm dizanin û nûsxeyan bawerî diken."* Ev deq dike ku em lensên xwe biguherînin û şikebariyên xwe yên derheqê oryantalîzma Aleksandar Jaba de ku ew metodolojî daye ber Mela Mehmûdê Bazîdî li jêra rûpelên pirtûkê binivîsînin.

Lê mezin hertim mezin in…

*Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye,*
Amadekar: Ziya Avci, kurdî (latînî – erebî) & rûsî, Weşanxaneya Lîsê: Diyarbekir, 202 rûpel, çapa yekem: tîrmeh 2010

*Adat û Rusûmatnameê Ekradiye,*
Amadekar: Jan Dost, Weşanxaneya Nûbiharê: Stenbol, 394 rûpel, 2010




## Barbar tên

Nivîskarê Afrîkaya Başûr, xwediyê xelata Nobelê, J. M. Coetzee di berhema xwe ya bi navê *Waiting for the Barbarians* (Li bende Barbaran) de, ji devê dadgerekî silhê ku di biniya fermendariya Şahînşahiyekê de karmendiyê dike, barbarî û hovitiya Şahînşahiyê ya ku wê bi xwe li ser "barbaran" pêk aniye dike.


Dadgerê silhê ku beriya ku şerr dest pê bike jiyaneke aram dijiya û tenê li kêfxweşiya xwe mitale dikir, piştî ku li ser gotegotên ku êl û qebîleyên başûr û rojavayê Şahînşahiyê li dijî Şahînşahiyê ketine tevgera pêkanîna yekitiyekê û ew ê êrîşê bibin ser Şahînşahiyê û Şahînşahiyê jî dest bi bergirtiyên hovane kiriye, jiyana dadgerê silhê bi tevahî diguhere.

Bi destpêkirina şerr re, dadger dil dide ser keçeke dîl û li ser şopên birînên ku bi îşkenceyê di bedena keçikê de hatine pêkanîn, li ser nêzîkatiya xwe ya şîlo ya li hemberî keçika dîl ku bi îşkenceyê çavê wê hatiye korkirin, dadger têgînên barbarî û şarezayiyê li ser kevaleke şerr li ber me datîne, me ji wateyên van têgînên ku bi destê desthilatdaran wate li wan hatiye danîn dixe gumanê û dike ku em bi hişekî nû careke din li ser wateya barbarî û şarezatiyê biramin.

Di *Waiting for the Barbarians* de em tim li bende "barbar"ên ku wê êrîşî Şahînşahiyê bikin dimînin. Lê tiştekî weha pêk nayê. Tu caran "barbar" êrîşî devereke Şahînşahiyê nakin. Kesî ji wan nakujin, kesekî îşkence nakin. Lewma rastiyeke ku wê "barbar" êrîşê bînin ser Şahînşehiyê bikin jî, ji binî ve nîne. Lê di tevahiya pirtûkê de em rastî hovitî û barbariya Şahînşahiyê tên ku li ser kesên ku wekî "barbar" têne nasandin tê kirin. Gundên wan têne kavilkirin, dîl têne girtin, îşkence li wan tê kirin. Bi vî awayî, di *Waiting for the Barbarians* de Coetzee, di bendewariya barbaran de barbariya ku ji ber çavan wenda dibe radixe ber çavan.

*"Zemanê dîrokê Şahînşahiyê afirand. Şahînşahiya ku hebûna wê ne di dewrên asê yên kişwerên ku vedijin de lê di berjor û berjorbûnê de, di destpêkirin û bidawîbûnê de, di bobelatên zemanên bi diran de dibîne. Şahînşahî xwe mehkûmî jiyana di dîrokê de û li dijî dîrokê di pêkanîna komployan de dibîne. Tenê ramanek hişê Şahînşahiyê yê veşartî mijûl dike: wê çawa dawî lê neyê, çawa nemir bibe, dewra xwe wê çawa dirêj bike. Bi roj berra dû dijminan dide. Kûçikên nêçîrê yên kone û dirinde li bêvilên wan hessas in, dişîne her deverê. Şevan, xwe bi dîmenên bobelatan têr dike: bi bajarên talankirî, gelên ku tecawiz li wan hatiye kirin, bi pîramîtên ji hestiyan, bi kavilên ku bi kilometreyan dirêj dibin."*

Dadgerê silhê digel ku ji keçika dîl hatiye girtin, ya ku di îşkence de çavên wê hatiye korkirin, hez nake jî wê vedihewîne cem xwe, wê dişo, laşê wê mist dide. Dadger tim dixwaze hîn bibe ka gelo çima digel ku jê hez nake jî, alikariyê bi keçikê dike. Çima dilê wî pê dişewite? Çima dixwaze nêzî wê be? Çima digel ku dizanî ku dê were girtin û îşkence li wî bê kirin, keçikê radestî malbata wê dike? Heger em guh bidin dadger, em ê bikarin bersiva pirsên wî bibînin: *"Hezkirina me şopê li dû xwe nahêle. Ew keçika dî ya kor wê kê bi bîr bîne: wê min yê ku bi bincilkên min î hevrîşimî, di odeya min ya kêmronî de, yê parfûm bi xwe de kirî, ketiyê rûn, yê ku li dû azweriyên neşad e bi bîr bîne, yan jî wê zilamê dî yê sar î çav bi rûpoş, yê fermandar ku dengê wî yê êşa mahremê di hişê xwe de wezinandiye? Di vê dunyayê de rûyê herî dawî yê ku bi awayekî herî zelal dîtî ma ne ew rû bû ku li pişta wî hesinê ron dîtibû? Nuha li vira ji fedîkirinê bipirsim jî, dema xwe bi xwe min xwe pal dida ser pêyên wê, dema ku min pêyên wê yên şikestî maçî dikirin bi axînekê ji ber ku min şopeke wilo lê nehişt divê ji xwe bipirsim ka gelo ez li ber vê yekê dikevim yan na."*




Di *Waiting for the Barbarians* de kirinên Şahînşahiya barbar wê bi me Kurdan gellekî nas xuya bibe. Gund, çiya û deviyên şewitî, "zimanê ku nayê nasîn" yên êl û qebileyên ku di îşkence, kuştin û talanan re derbas dibin wê bi Kurdan gelkekî nas xuya bibin.

Di *Waiting for the Barbarians* de em ê pevşibîna çarenûsa gelên bindest û pevşibîna barbariya serdestan bibînin. Navê xweser:

***Waiting for the Barbarians***
**Nivîskar: J. M. Coetzee**


## Kulliyata Kurmanciyê

Li cem Papuayiyan ziman zêde xizan e. Her qebîle xwedî zimanekî ye û her diçe peyvên wî zimanî kêm dibin. Ji ber ku wexta ji wê qebîleyê yek dimire ji bo şînê çend peyv ji zimanî tên paqijkirin û êdî ew peyv nema tên bi kar anîn."

Ji salên 70 yî û vir ve li bakurê Kurdistanê, rêxistinên kurd ji bo ku nexşeya welatekî çarparçe bi şîrêzê bigihînin hev, di warê teorîk de û di serhildanên pratîk de zêde têkoşiyane û hê jî têdikoşin. Serhildan ji malê bû lê mejî ji derve bû. Wî mejiyê ku dersînor em li şoreşan sor kirin. Lê her ku çû em bi dûrî zimanê xwe ketin, her ku em dibûn çepgir me ji hêla hundirê xwe yê çep ser çend peyvên xwe xêz dikir. Çûyina ber bi bajaran ve serê ferhengên me yên devkî jî dixwar.

Di havîna 1987'an de Ensîtuya Kurdî ya Parîsê dest bi weşana kovara *Kurmancî* dike. Ev kovar ji her serê demsalekê bi vê peyva Ehmedê Xanî ya ku weke nivîştekê li ser hejamarê heye derdikeve: *"Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan, belkî ji bo biçûkêd Kurmancan"*. Kovara *Kurmancî* rahiştiye şîrêza xwe û tîpên kurmancî, peyvên *kurmancî*, ew peyv bi hevokên Kurmancî û ew hevok jî bi jêrzemîna deqên kurmancî ve zeliqandine. Kovarê her xwastiye devokên zaravayê kurmancî yê bişkuvî bi kêlavêtinikê nêzîkî hev bike. Nivîskar û zimanzanên ku di kovarê de cih girtine - ku her yek ji derekê ne - rahiştine kulingê xwe û kolane, her ku rastî peyvekê hatine axa dora wê paqij kirine, pif kirine toza ser wê, bi paçikan ew biriqandine û derbasî ser pelên kovarê kirine. Bi nava zimanên zimanên cîran ketine û peyvên bi deyn dane li xwediyan vegerandine, yê ku bi deyn stendine li xwediyan vegerandine û di ferhengê de li hember nivîsandine da ku mêzina peyvê pêk bînin. Bi nava deqên Cegerxwîn, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî ketine û bêjeyên ku di tariyê de mane bêtir ber bi ronahiyê ve anîne. Ji bo rastnivîsa kurmanciyê cama berçavkên xwe qalindtir kirine.

Her ku jiyana bajarvaniyê bi pêş ve dikeve çahlên ku di nexşeya kurmancî jî bêtir vedibin û heke ew çahl bê pişt û bê dewlet be, dagirtina wê jî dijwartir dibe. Kovarê ne bi tenê lêkolînên xwe yê li ser gotinên pêşiyan û îdiyoman, ên li ser kûzan û lewnên wê, ên li ser alavên cot û çanda pezxwedîkirinê ew çahl dagirtiye, herweha bi xebatên xwe yên li termên zanistî,matematîk, kompîtur , futbol, trafîk, rojnemavanî, flora û kozmetîkê û hwd. jî ew hewl daye ku wê çahlê bi murekkeba sekuler ve dagire.




Heke îro hinek rabin û bixwazin ferhnegekê amade bikin- çi warî dibe bila bibe- ne hewce ye ku li ji bo asas li peyvên ewil bigerin. Kovara Kurmancî li dîasporayekê ku peyvên Celadet Bedirxan di *Hawarê* de li pişta xwe kiribû, bar dike û li dîasporayeke din piştiyên xwe girantir dike. Em bi kurt û kurmancî bibêjin, kovara Kurmancî çend mirî û çend peyvên me ji mezel rakirine.

Ev 23 sal in ku her ji şeş mehan bi carekê bi dehan zanayên kurd li diyasporayê û bi dû re jî parçeyê Kurdistanê yê azad civiyane û her carê hefteyekê behsa zimanê kurdî kirine. Encamên van civînên wan jî her carê di kovara *Kurmancî* de hatine çapkirin. Îsal 40 hejmarên vê kovarê bi cildekî xweşik ji aliyê weşanxaneya Avestayê ve hate çapkirin.

Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku Grûba Kurmancî ya ku xebatên wê yên 23 salan kulliyata kurmancî ava kir û bi xebatên li ser termînolojiyê ve rê destnîşan kir, da ku nifşên nû bikarin bi serbilindî siberoja wê ava bikin.

Belê, kurmanciyê peyvên mirî ji mezelan rakiriye.

# Çavkaniyên “milîtantîzma Avatarê”

HENRY JENKINS *

Ji eşîra hindî ya Dongria Kondh ku li dijî şîrketeke kanê şerrê manê dike, heta bi Filistîniyên li ser axa vegirtî, gellek milîtanan nasnameya Naviyan li xwe bar kiriye. Navî lehengên fîlma Avatarê ne berhemek hollywoodî ye. Ev fenomen nîşan dide bê çawa referansên çanda girseyî roj bi roj zêdetir bi armancên siyasî tên bikaranîn.




Sibata bihurî pênc milîtanên filistînî, îsraîlî û navneteweyî di gundê dagirkirî Bilînê re meşiyan, laşên wan şîn rengkirîbû, mîna dîmenên *Naviyan* – wî xelkê xwecih yê *Avatarê,* fîlmê James Cameron yê tevn-zanistî. Artêşa Îsraîlê bombeyên gazê û dengî li dijî van xwepêşandêrên çerm-şîn bi kar anîn; milîtanan çefî û poşî li xwe pêçabûn û dûv û guhên tûjik bi xwe ve kiribûn. Wêneyên bûyerê li wêneyên ku ji filmê Hollywoodê tên, hatine zêdekirin. Paşê jî ev weke dîmen li ser *YouTube*’ê hatin belavkirin. Dengê kesan tê ku dibêjin: “*Em ê nişanî gelê ezmanan bidin ku ew nikarin her tiştê dixwazin bi dest bixin û dagir bikin! Ev der, ev der xaka me ye!*”

Fîksiyona James Cameron, bû sedem ku li ser xelkekî were nivîsîn û gotin. Rexneyeke sînemayê ya Vatîkanê digot ku di fîlm de pîrozkirina “*kulta xwezayê* (1)” heye. Milîtanên hawîrdorparêz ev bûyer weha bi nav kir: “*Destana herî mezin ya der barê serketina hawîrdorê de ku li ser şerîda fîlmî hatiye qeydkirin* (2)”. Di bereya çepgiran de gellek milîtan henekên xwe bi nakokiyên fîlm dikin, ku hem kolonyalîzmê rûreş dike û hem jî xewn û xeyalên pêşverûyên Spî yên gunehkariyê ji nû ve diafirîne: wan navê “dansa bi *Şînokan* re”** li fîlmî kir. Ji bo Daniel Heath Justice ku milîtanekî civaka *Cherokee* ye, film balê dikişîne ser çarenûsa xelkên xwecih; tevî ku Cameron bi afirandina temsîleke kompleksa eskerî-pîşesazî xirabiyên kolonyalîzmê gellekî zêde hêsan nîşan dide û ev yek jî dike ku mirov pirr ji wan nefretê bike lê kêm tiştan dide fahmkirin (3). Di vê navberê de ev rexne, herweha bi şêwaza xwe ve, xwe ji vîzyona der barê çandeke girseyî ya kelevajî, negirîng û bala mirovan ji pirsgirêkên rastî yên dunyayê dide alî, qut dikin.

Xwepêşandêrên Bilînê têkiliya hewldanên xwe yên ji bo bidestxistina erda xwa bi têkoşîna Naviyan a ji bo erda xwe ya buhişt re datîne (vîdeoya ku li ser YouTube’ê hatiye weşandin li ser kontrasta di navbera daristanên têr û gurr ên Pandorayê û erdên hişk, tevde ax û yên dagirkirî de radiweste). Nîşana wêneyî ya herî mezin ku xwezaya *Avatarê* diyarî wan kir temsîla şerrê wan bi xwe ye. Bi xêra hêza mekîneya Hollywoodê ya reklamê, ev wêne û dîmen ji niha û pê ve li tevahiya dunyayê tên naskirin. Dema em çav bi dehbeyekî ecêb ê çerm-şîn bikevin ku ji ber êş û azarê xwe diguvêşe û di nava axê de xwe vedigevêze û ji ber bombeyên gazê bêhna wî diçike, ev yek peyamên ku em tercîh dikin nebînin ji nû ve tîne bîra me.

Milîtanan *Avatar* kir ya xwe, bi vê jî hin dijayetiyên ku hê nû li dijî fîlmî hatibûn kirin jî bêtesîr kirin. Qunciknivîsên muhafizekar ew gunehbar dikir ku hestên dij-amerîkî gurr dike; lê belê bi qasî ku li seranserê dunyayê komên protestovan xwe li şêla Naviyan kirin xwedî, ewqasî jî efsaneyên li ser pêkhatinên herêmî yên kompleksên eskerî-pîşesaziyê, hûr kola. Li Bilînê, vê efsaneyê, Filistînî û Artêşa Îsraîlê li dijî hev nîşan dan, li Çînê xwecih û hukumeta Pekînê û li Brezîlyayê jî çermsorên Amazonan û şîrketên ku daristanan dibirrin.

Bêyî ku ewqasî pêde biçin û xwe şîn boyax bikin, entellektuelên mîna romannûsa Hindistanî Arundhati Roy û fîlozofê slowen Slavoj Zizek xêr û bera nîqaşên li ser *Avatarê* ji xwe re kirin par, da ku rewşa eşîrên xwecih ên Hindistanî, yên Dongria Kondh, bi bîra mirovan bixin. Ev eşîr hewl didin ku ketina nav erdên xwe yên pîroz asteng bikin. Ev erd jî bi kanên xwe yên boksîtê (mînerala ku çavkaniya bafûnê/alumînyûmê ye) bala şîrketan dikişîne ser xwe. Ango Amerîka li ser rûyê gerstêrka dunyayê ne yekane “împeretoriya xirabiyê” ye. Rexneyên ji bereya çepgir jî, tirsa wan ew e ku girîngiya vî fîlmî bi lehengên sereke yên mirovên spî dayî, ji bilî derfeta ku temaşevan xwe bi hêsanî bixin şûna wan, tiştekî din nede wan. Lê belê, protestovan dixwazin kostumên şîn li xwe bikin.

Ya rastî, “milîtanên Avatarê” bi tenê zimanekî gellekî kevin yê protestoyên civakî bi kar anî. Di ceribandina xwe ya ku veguherî klasîkekê de ya bi navê *Woman on Top* (4), Dîrokzana çandê Natalie Zemon Davis bi bîr dixe ku di berbanga serdema Ewropaya modern de protestovanan nasnameya xwe bi maskeyan ango li pişt perdeya lîstikên rolan veşartin; cil û bergên gelên bi rastî heyî (yên weke Morosan) an jî yên xeyalî (yên mîna Amazonan) li xwe dikirin, ku ev gel ji bo şaristaniyê weke xetere dihatin dîtin. Li cîhana nû (parzemîna Amerîkayê) de welatiyên baş ên Bostonê ev rêûresm dewam kirin: wan xwe şiband çermsorên Amerîkayê da ku tevahiya barê çayê birijînin bendera bajêr. Li New Orleansê jî reşikên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê eşîreke xwe ya ‘çermsoran’ a bi navê Mardi-Gras çêkirin, pê dîmenê “Wild West Show” yê Buffalo Bill bi kar anîn, da ku lêgerîna xwe ya li rêzgirtin û rûmetê bînin zimên – di rêzefîlmê xwe yê bi navê *Treme* de ku li ser HBO hat weşandin, David Simon hê nû ev adet derxistiye holê.

Di pirtûka xwe ya bi navê *Dream* de çalakvan Stephen Duncombe îddîa dike ku çepgirên amerîkî zimanekî mentiqî, sar û elîtîst bi kar tînin ku ji dil bêhtir xîtabî mejiyê mirov dike (5). Eger peyvên gellekî zanistî ji nava nîqaş û guftûgoyên siyasî bikin der, hingê çepgirên amerîkî dikarin hêza xwe ya hîssî ji gotaran peyda bikin; ji xwe girseyeke mirovan bi van gotaran tahmijiye.

Beriya demeke kurt, komeke lêkolînerên Dibistana Annenberg ya ragihandin û rojnamevaniyê ya Zanîngeha Kalîforniyaya Başûr lîsteyeke wan koman çêkiriye ku ji nû ve çanda popê bi kar tînin da ku adaleta civakî biparêzin. Vê koma lêkolîneran bi taybetî jî dêhn û bala xwe daye “çanda beşdariyê”: medyaya dîjîtal ne weke ya girseyî ye; wê destûr da hejmareke mezin a bikarhêneran ku navgînên ragihandinê bikin ên xwe û ev çand ji bo armancên xwe bi kar anîn. Gotarên parvekirî hîmê tevnên civakî yên xurt pêk tînin û dikin ku qad peyda bibin ku li ser fikran guftûgo bikarin werin kirin, hevnasîn çêbibin û çandeke nû bê afirandin. Di vê pêvajoyê de *hezkirên wê* dibin xwediyê hêz û jêhatîbûnan û binesaziyeke herêmî çêdikin da ku niherîn û fikrên xwe li ser dunyayê par ve bikin. Weke ku di civakên nêçîrvanan de ciwan kêfa xwe bi tîr û kevanên xwe tînin, di civaka agahdariyê de jî xwe bi vê tiştê behskirî re mijûl dikin da ku bi pêş ve kevin.

Damezrênerê *Alliance Harry Potter,* Andrew Slack, vê fenomenê weke “akupûnktura çandî” dinirxîne û destnîşan dike ku rêxistina wî “xaleke zextê” ya girîng û hevpar ya civakî dîtiye ku ew dixwazin wê bi mijûlahiyên civakî yên berfirehtir ve girê bidin. *Alliance Harry Potter* ji nuha ve xwe gihandiye bêhtirî 100.000 ciwanan û ew li hember şerrên li Afrîkayê, mafên karkiran û zewaca homoseksuelan hestiyar kirine, wê ji bo Haîtiyê alîkarî kom kiriye û heta li dijî li navendeke grûba çapemeniyê jî kampanyayekê dimeşîne. Andrew Slack dibêje ku Harry Potterê ciwan berepêş fahm kir ku hukumet û çapemenî derewan li raya giştî dikin da ku xirabiya di nava xwe de veşêrin û ji ber vê jî, wî bi hevalên xwe re bi armanca guherîna dunyayê *Artêşa Dumbledore* saz kiriye. Wî ji ber vê sedemê ji şagirtên xwe pirsiye ka divê ew şerrê Kîjan Xirabiyên vê dunyayê bikin. Weke mînak, li Mainê (eyaleteke Amerîkayê ye), *Alliance Harry Potterê* pêşbirkek organîze kir di navbera dibistanên Poulard de – dibistanên sêhrbaziyê ku bêhtir sêhrbazên ciwan alaqeyê nîşanî wan didin. Di vê pêşbirkê de armanc ew bû ku ji bo referandûmeke li ser wekheviya mafên di zewacê de, beşdar hejmara herî mezin a hilbijêran bînin cem hev. Ev nêzîkatiya lîstikwarî ya mîlîtantîzmê wekî din destûrê dide seferberkirina ciwanên ku xwe li pêvajoya siyasî tecrîdkirî his dikin.

Însiyatîf û hewldanên bi vî rengî dibe ku kone (ji bo seferberiya girseyan, devjêberdana serweriya mentiqî) an jî safik (ji rastiyê bêhtir bawerîanîna bi efsaneyan) xuya bikin. Lê timî kêliyek heye ku mirov ji haşbûnên xeyalî şiyar dibe û bi zehmetiyên rewşê yên li cihê cih re rûbirû dibe.

Ev “mîlîtantîzm” illeh ferz nake ku mirov rengê xwe şîn bike; ew dixwaze ku mirov li hemberî wêne û dîmenên ku çapemenî diweşîne, afirîneriya xwe îspat bike. Bereya rastgir jî berê xwe dide karûbarên bi vî rengî. Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kartonfîlmê *Dora The Explorer* (Doraya kaşif), behsa serpêhatiyên xeyalî yên keçeke piçûk a latîn-amerîkî û meymûna wê dike. Ji bo ku encamên qanûna nû ya li ser penaberiyê ku li Arîzonayê hat erê kirin, nîşan bidin, herdu bereyên siyasî jî ev kartonfîlmêbi kar anî. Ultra muhafizekar “Tea Parties” karîkatureke serokê Amerîkayê Barack Obama di şerrê xwe yê li dijî reforma Obama ya sektora tendurustiyê de bi kar anî. Di vê karîkaturê de Obama dişibe *Joker*, lehengê xirab yê fîlmê *The Dark Knight Returns* (Şovalyeyê Tarî Vedigere) yê rêzefîlmê *Batman*.

Bi şibandinên bi vî rengî mirov ji aqlê zîrek yê van guftûgoyên siyasî agahdar nabe, bi heman şêwazê em ê nikaribin cudahiyên di navbera Partiya Komarxwaz û Partiya Demokrat de ewqasî kêm bikin, weke yên ku fîlan û keran ji hev cihê dikin – fîl û ker amblemên aliyan e ku ji romanên xêzikan ên serdemeke bihurî mane. *Avatar* nikare bi awayekî adilane şerrê kevin yê li ser erdên dagirkirî bi dawî bike û vîdeoya li ser YouTube’ê jî nikare cîhê nîqaşeke têr agahdarî a li ser mijarê, bigire. Lê belê, aliyên wê yên spektakuler û beşdariyê, enerjiya hîssî ku ji bo berdewamiya têkoşînan hewce ye dide hin kesên ku nû dikevin nav cîhana siyasî. Û wan ber bi şêwazên nû yên çalakiyan ve dibe.

* Li Massachusetts Institute of Technology (MIT) kevneberpirsê lêkolînên kemperî yên medyayê, li Zanîngeha Kalîforniyayê berpirsê beşê ragihandin, rojnamevanî û hunerên sînemayê. Nivîskarê pirtûka bi navê *Fans, Bloggers and Gamers: Exploring Participatory Culture* (Fan, Blogvan û Lîstikvan: kişfkirina çanda beşdariyê), New York University Press, 2006.

1 Federico Lombardi, *L’Osservatore Romano*, 10’ê çileya paşîna 2010’an

2 Harold Linde, Mother Nature Network (Tevna Xwezaya Dayik), Mnn.com, 4’ê çileya paşîna 2010’an

3 “Guest Blogger: Daniel Heath Justice on Avatar”, First Peoples (Blogvanê mêvan: Daniel Heath Justice li ser Avatarê), 20’ê çileya pêşîna 2010’an

4 Natalie Zemon Davis, “Women on Top: Symbolic sexual inversion and political disorder in early modern Europe” (Jin li herî jor: di destpêka serdema Ewropoya modern de serûbinîhevbûna cinsî ya sembolîk û tevliheviya siyasî), in Barbara Babcock, *The reversible world: Symbolic inversion in art and society* (Dunyaya ku dikare were berevajîkirin: serûbinîhevbûna sembolîk di huner û civakê de), Cornell University Press, Ithaca, 1978

5 Stephen Duncombe, *Dream: Re-imagining Progressive Politics in an Age of Fantasy* (Xewn: Di serdema fanteziyan de ji nû ve hizirîna li siyasetên pêşverû), The New Press, New York, 2006. Li beşê di “Culture: mauvais genres (Çand: Şêwazên xirab)”, *Manière de voir*, hejmar 111, Hezîran-Tîrmeh 2010

** Nota wergêr: Lehengên kartonfîlma bi navê Şirinler an jî Schtroumpfs (fr), smurfs (ing)

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# *Jiyan bi kurdî xweş e*




# NAVEROK

## ÎLON 2010

Biryara Kosovayê û daxwazên Kurdan
**A. Celîl Kaya**
▶ R. 1

Ziman û kontrola ramanê
**Prof. Dr. Îlhan Kizilhan**
▶ R. 1

Ji Çapemeniyê
▶ R. 2

Wêneyên nezaniyê
**Serge Halimi**
▶ R. 2

Hêz û sergêjiya dîplomasiya sirbî
**Jean-Arnault Dérens**
▶ R. 6

Bîlançoya civakî ya serdema “Lula”
**Geisa Maria Rocha**
▶ R. 7

Londra têkiliyên xwe yên bi Washingtonê re diguhere
**Jean-Claude Sergeant**
▶ R. 8

Berdêla lihevkirina Fransa-Ruwanda
**Benoît Francès**
▶ R. 10

Pirsgirêka kurdî Bextreşiya milletekî bê dewlet
**Jean-Pierre Viennot**
▶ R. 12

Serkevtineke qaşo a “şampiyona îxracatê”
**Till van Treeck**
▶ R. 14

Pirsgirêkên civakî û derdê ewlekariyê
**Laurent Bonelli**
▶ R. 15

Li gorî elîtan şerrê çînan
**Noëlle Burgi**
▶ R. 16

Pereyên Talîbanan ji ku tên?
**Louis Imbert**
▶ R. 17

Piştî têkçûna Pilingan li Tamûlê tevlihevî
**Cédric Gouverneur**
▶ R. 18

WikiLeaks û çîrokên serdema teknolojiyê
**Christian Christensen**
▶ R. 20

Lênûskên karkirên Çînê yên gazindan
**Isabelle Thireau**
▶ R. 21

Kultur - Polîtîk
**Kejo Bajar**
▶ R. 22

Çavkaniyên “mîlîtantîzma Avatarê”
**Henry Jenkins**
▶ R. 23

## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €)
☐ Derveyî Almanyayê (60 €)
☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Post Bank - Hesab/Account/Konto: 371 219 609 - BLZ: 500 100 60
IBAN: DE84 5001 0060 0371 2196 09 - BIC: PBNKDEFF